



## Kendal Nezan: Ziman bingeha nasnameya Kurdî ye

**Serokê** Enstîtûya Kurdî ya Parîsê Kendal Nezan ji Heftenameya Basê re qala xebat û naveroka ferhenga Kurdî-Fransî kir. Nezan dibêje: “Cudahiya ferhenga me ya sereke ew e ku ji bo cara yekem peyvên hemû zarava û devokan dihewîne”

RÛPEL 09



## Heqanê Heywanan Ser o

**Kam** zano naye ra çend se hezar serrî raver, baw û kalanê merdiman daran ra ameyî war û linganê xo ser o vindertî. Dewranê zaf verênan de cuya (heyatê) bawûkalanê ma û yê heywanan de zaf cîyayîye çin bîya. Înan eynî xoza de pîya ciwîyayêne.

RÛPEL 10



## Cotkar rêyên nû diceribînin

**Pêşketina** derfetên teknolojiyê, şiyarbûna cotkaran bi normên cîhanê, cotkariyê jî bi xwe re diguherîne. Li Bakurê welêt jî cotkarên Kurd, dest bi çandina kînoa, reşreşk, gilgil(Garis) û cûreyên din ên çandiniyê kirine. Welatê Kurdan di warê çandiniyê de gelekî dewlemend û berhemdar e.

RÛPEL 13


# bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ Û ŞIROVEYÎ

HEJMAR: 29

31 TÎRMEH - 05 TEBAX 2017

www.basnews.com





SERXWEBÛNA KURDISTANÊ DI ROJEVA WASHINGTONÊ DE YE S2

# JI DYAyê PIŞTGIRIYA SERXWEBÛNÊ

### > MESRÛR BARZANÎ GOTAREKE DÎROKÎ PÊŞKEŞ KIR

Şêwirmendê Encûmena Asayişa Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî beşdarî konferansa “Hevpeymana stratejîk a DYAyê: Kurdistan” bû û gotareke dîrokî pêşkeş kir. Barzanî di vê gotara xwe ya dîrokî de ji cîhanê re eşkere kir: “Em mafê serxwebûnê ku ji bo hemû miletan hatiye dayîn, ji bo xwe jî dixwazin.”

### > JI DYAyê PIŞTGIRIYEKE XURT JI BO REFERANDÛMÊ

Berpirs û rayedarên leşkerî yên DYAyê jî di Kongreyê de, di derbarê referandûma serxwebûna Kurdistanê de nêrînên xwe anîn ziman û helwesta DYAyê eşkere kirin. Siyasetmedar û Generalên Amerîkî ragihandin ku divê DYA ji ber şerê li dijî terorê û aramî û ewlehiya herêmê piştgiriyê bide serxwebûna Kurdistanê.

S3 HÎWA SEÎD SELÎM:




## Dema dewletbûna Kurdan hatiye

Endamê Polîtbûroya Partiya Zehmetkêşên Kurdistanê Hîwa Seîd Selîm, li ser referandûma serxwebûnê, rageşiyên siyasî yên li Herêma Kurdistanê, ragihandina serxwebûnê û çareserkirina kêşeyên bi Bexdayê re, bersiva pirsên me da. Selîm dibêje: “Ji serxwebûn û referandûmê paş ve gav nayê avêtin.”

S4 PDK- BAKUR



## “Kurdistan wê bibe sitargeha demokrasiyê”

Endamê Lijneya Rêveberiya Navendî ya PDK-Bakur Bora Balin derbarê referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê de ji Heftenameya Basê re axivî û got “Dewleta Kurdistanê dê li herêmê bibe parêzvana ewlehî, demokrasî û îstîqrarê”

S08 MESCÎDÎ AKSA




## Girêka sedsalî di navbera Îsraîl-Filîstînê de

Kêşeya di navbera Îsraîl û Filîstînê de kêşeyeke ku ev sed sal e didome ye. Tevî gelek hewldanên çareseriyê jî ev mesele bûye kêşeyeke herêmî û nehatiye çareserkirin. Di van heyamên dawîn de jî aloziyên li herêmê zede bûne.



EKREM ÖNEN >02

Referandûm û Medya II



JAN DOST >06

Ez û Mijabad



FIRAT CEWERÎ >12

Tu bi ciwanî çûyî, bi ciwanî di bîra me de mayî

Serxwebûna Kurdistanê di rojeva Washingtonê de ye:

# Ji DYAyê piştgiriya serxwebûnê





"Peymana Sykes-Picot ku axa Kurdistanê parçe kirîbû û stratejiya parastina yekgirtina axa Iraqê pûç bûye û divê DYA dev ji vê stratejiyê berde." Garner bal kişand ser wê yekê ku Kurd ji 1991an û vir ve di nava tecrûbeya xwerêvebirinê de ne û destnîşankir ku divê piştgiriya serxwebûna Kurdistanê bê kirin.



MURAT ÖZDEMİR

Herêma Kurdistanê ber bi referandûma serxwbûna Kurdistanê ve diçe û dîplomasiya ji bo referandûmê jî her ku diçe zêde dibe. Meha derbasbûyî Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî li Parlamentoya Ewropayê ya li Belçîkayê hevdîtin pêkanîbûn û gotarek pêşkeş kiribû. Serok Barzanî di wê gotara xwe ya dîrokî de mafê diyarkirina çarenivîsa xwe ya miletê Kurd, sedemên vê yekê û bandora dewleta Kurdî li ser herêmê vegotibû. Piştî vê serdana Serok Barzanî ku weke serokdewletekî hat pêşwazîkirin, vê carê jî Şêwirmendê Encûmena Asayişa Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî serdan û axaftineke girîng pêk anî. Mesrûr Barzanî ku hefteya derbasbûyî serdana DYAyê kiribû û hevdîtinên girîng pêkanîbûn, li Washingtona paytexta DYAyê beşdarî konferansa "Kurdistan Havpeymana Stratejîk a DYAyê" bû. Barzanî di vê axaftina xwe ya dîrokî de ji cîhanê re eşkere kir: "Em mafê serxwebûnê ku ji bo hemû miletan hatiye dayîn, ji bo xwe jî dixwazin."

**"Kurdistan ne beşeke Iraqê ye"**

Şêwirmendê Encûmena Asayişa Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî di axaftina xwe ya dîrokî a li Kongreya DYAyê destnîşan kir ku Şerê bi DAIŞê re ev nîşanî me da; "Kurdistan ne beşeke Iraqê ye û wiha got: "Vê yekê ne me, Iraqê bi xwe nîşanî me da. Em mafê serxwebûnê ku ji hemû miletan re hatiye dayîn ji bo xwe jî dixwazin."

**"Niha dema serxwebûnê ye"**

Mesrûr Barzanî jenosîda Enfalê bibîr xist û axaftina xwe wiha domand: "Ji avabûna wê heta 1991an rejîma Iraqê li hemberî Kurdan bi êrişên kimyewî û Enfalan komkujî pêkanîn. Piştî serhildana 1991an Kurdistanê heta radeyekê azadiya xwe bi dest xist. Em êdî naxwazin li aliyekî li benda komkujiyan bimînin. Em dixwazin pêşeroja xwe diyar bikin û ewlekariya xwe pêk bînin. Dema ku DAIŞê êrişî Kurdistanê kir, hat gotin ku dem ne 'guncaw e', niha DAIŞ ber bi tunebûnê ve ye û dîsa jî dibêjin 'dem ne guncaw e'. Gelo dem wê kengî guncaw be? Li gorî me dem dema serxwebûnê ye."

Balyozê Berê yê DYAyê Xirwatîstanê Peter Galbrait jî di axaftina xwe ya di konferansê de got "Baweriya Wezareta Derve ya DYAyê êdî bi yekgirtina axa Iraqê nemaye. Kurdistan dê teqez serbixwe bibe."

**"DAIŞ di dema yekgirtina axa Iraqê de derket"**

Şêwirmendê Encûmena Asayişa Herêma Kurdistanê Barzanî di dirêjiya axaftina xwe de diyar kir ku Iraqê di şerê li dijî DAIŞê de peywîra xwe bi cih neanî û wiha got: "Eger Bexdayê peywîra xwe ya di hemû waran de pêk bianiya DAIŞ dernediket. DAIŞ di heyama yekgirtina axa Iraqê de derket. Nexwe em rêveberiyeke Kurdistanê biceribînin û bibinîn. Dema ku DAIŞê êriş kir, Artêşa Iraqê cihên xwe terikandin û ji DAIŞê re hiştin. Lê belê Pêşmerge DAIŞ rawestand. Tecrubeya sedsalî nîşan dide ku Iraqa 'yekgirtî' ji kêşeyan re nebûye çareserî."

Mesrûr Barzanî di dewama gotara xwe de ragihand ku ew dixwazin rewşa heyî bi awayekî aşitiyane biguherînin û eşkere kir: "Me Kurdan hemû rêveberiyên Bexdayê tecrubekirin, rêveberiya heyî jî ne ji yên din cihêtir e. Bexdayê li hemberî xelkê Kurdistanê kiryarên xerab pêkanîn. Bexdayê benda 140an pêk neanî ji ber ku eger ev pêk bihata, dihat zanîn ku wê ew dever bi Kurdistanê ve bihatana girêdan. ÎIraqê xwest kêşeyên heyî bi rêyên leşkerî çareser bike. Hevgirtina me ya bi Iraqê re dibe sedema kêşeyên nû û em dixwazin êdî dawî li vê rewşê bînin. Potansiyela me heye ku em xwe birêve bibin. Ji 1991an û vir ve tu leşkerên DYAyê li Kurdistanê canê xwe ji dest nedaye."

**"Têkliyên me yên bi Tirkiyeyê re baş in"**

Mesrûr Barzanî li ser pêwendiyên bi Tirkiyê re jî sekinî û got, "Têkiliyên me yên bi Tirkiyê re baş in. Di dahatûyê de em dixwazin bi Iraqê û welatên din re jî di nava pêwendiyên baş de bin."

**"Divê li Rojava herkes xwedî mafê gotinê be"**

Şêwirmendê Encûmena Asayişa Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî di derbarê rewşa Rojavayê Kurdistanê de jî wiha axivî: "Em ne li dijî wê yekê ne ku Kurd li Sûriyê bigihijin mafên xwe. Di vê mijarê de bi PYDê re pirsgirêkeke me nîn e. Em tenê dixwazin li Rojava aliyên din jî xwedî mafê gotinê bin û hemû bi hev re di nava têkiliyên baş de bin."

**"Em dixwazin bibin du cîranên baş"**

Barzanî di dewama axaftina xwe de diyar kir ku li Iraqê ne tenê di navbera Bexda û Kurdan de kêşe hene û wiha axivî: "Di navbera rêveberî û Sunneyan de jî kêşeyên mezin hene. Eger Kurd di derbarê pêşeroja xwe de ne xwedî fikarên mezin bûna, veqetîna ji Iraqê nedianîn rojevê. Lê belê rastiyek li pêşiya me ye û ne pêkan e ku pêşerojeke aram û ewle bi Iraqê re pêk were. Ji ber wê yekê çareseriya rasteqîn veqetîna Kurdistanê ji Iraqê ye û herdu bibin du cîranên baş. Ev di berjewendiya Kurdistan û Iraqê de ye. Dibe ku Kurdistan û Iraq di warên petrol, av û gelek warên din de di hevkariyê de bin û bibin du hevalbend. Niha li Kurdistanê milyonek û 800 koçber hene. Weke ku çawa me Xirîstiyanên li Nînowayê û hemû pêkhateyên etnîkî û olî yên li Kurdistanê parastin, em mexdûrên şer jî diparêzin û pêdiviyên wan dabîn dikin. Armanca me ne ew u em asayîşa herêmê têk bibin, armanca me ew e ku em Kurdistanê bikin welatekî ji bo hemû pêkhateyan ku tê de bi aramî û di nav biratiyê de bijîn. Ji ber vê yekê em daxwaza piştgiriya hemû cîhanê û nemaze jî daxwaza piştgiriya DYAyê dikin.

**"Kerkûk ji referandûmê re amade ye"**

25ê Îlonê wê li herêmên Kurdistanê yên derveyî Îdareya Kurdistanê jî sindoqên referandûmê bên danîn û deverek ji van jî bajarê dîrokî yê Kurdistanê Kerkûk e. Parêzgerê Kerkûkê Necmettîn Kerîm ku beriya niha biryara rakirina Ala Kurdistanê li Kerkûkê pesend kir û pêkanî jî beşdarî konferansê bû û axaftinek pêşkêş kir. Kerîm eşkere kir ku referandûm ji bo serxwebûnê pêk tê û diyar kir: "Li Kurdistanê hemû pêkhateyên etnîkî, sîyasî, olî û mezhebî derbarê referandûmê de yek deng in. Her ku diçe piştgiriya ji bo referandûmê jî zêdetir dibe." Necmettîn Kerîm her wiha ragihand ku Kerkûk ji bo referandûmê amade ye û wiha axivî: "Serxwebûn xeyaleke sedsalî ya Kurdan e. Kurd êdî dixwazin vê xeyala xwe pêk bînin. Bexdayê benda 140an pêk neanî. Referandûm dê li derveyî Kurdistanê jî pêk were û Kerkûk ji bo referandûmê amade ye."

**"Cîranê herî baş ji bo Tirkiyeyê Kurdistan e"**

Genaralê Amerîkî Ernie Audino di axaftina xwe ya di konferansê de got ku divê Tirkiye li dijî daxwaza Kurdistanê ya serxwebûnê dernekeve. Audino her wiha eşkere kir ku Kurdistan ji bo Tirkiyeyê di warê aborî û têkiliyên bazirganî de ji cîranên herî berhemdar û ewle ye û ragihand: "Ji bo şerê li dijî DAIŞê û rêxistinên terorîst yên din, divê piştgiriya serxwebûna Kurdistanê bê kirin.

**"Dema serxwebûna Kurdistanê hatiye"**

Generalê Amerîkî Ronald Griffith jî destnîşan kir ku dema serxwebûna Kurdistanê hatiye û wiha axivî:" Divê DYA dev ji polîtîkaya xwe ya 'yekgirtina axa Iraqê' berde. Iraq ne havelbenda DYAyê û li gor berjewendiyên Îranê tev digere."

**"Sykes-Picota ku Kurdistan parçe kiribû têk çû"**

Generalê DYA'yî Jay Garner ku demên curbicur di bin fermandariya Amerikayê de li Kurdistanê hatiye wezifedarkirin jî di konferansê de axifî. Jay Garner di axaftina xwe de wiha got; "Peymana Sykes-Picot ku axa Kurdistanê parçe kirîbû û stratejiya parastina yekgirtina axa Iraqê pûç bûye û divê DYA dev ji vê stratejiyê berde." Garner bal kişand ser wê yekê ku Kurd ji 1991an û vir ve di nava tecrûbeya xwerêvebirinê de ne û destnîşankir ku divê serxwebûna Kurdan bê destek kirin. Garner wiha domand; "Kurdan di dema êrişên DAIŞê de nîşan da ku gelekî çendî berxwedêr e. Wek çawa ku Kurd hemû aliyên olî û nijadî yên li Kurdistanê diparêze her wiha Erabên Sunne jî diparêze."

**"Kurdistan dê teqez serbixwe bibe"**

Balyozê Berê yê DYAyê Xirwatîstanê Peter Galbrait jî di axaftina xwe ya di konferansê de got "Baweriya Wezareta Derve ya DYAyê êdî bi yekgirtina axa Iraqê nemaye. Kurdistan dê teqez serbixwe bibe."

## "Tenê Kurdan Tirkmen parastin"

Serokê Komelaya Çandê yaTirkmenan Cevdet Najar di konferansê de axaftinek kir û got tenê Kurdan Tirkmen parastin û axaftina xwe wiha domand: "Em wek Tirkmen, Kurdistanê mîna welatê xwe dibînin û piştgiriyê didin serxwebûna Kurdistanê. Kiryarên rêveberiya Bexdayê dike ku Tirkmen, Iraqê wek welatê xwe nebînin." Najar bal kişand ser komkujiya li dijî Tirkmenan a 1958an û destnîşan kir ku wê demê tenê Kurdan alikarî daye Tirkmenan û ew parastine. Najar bi bîr xist Tirkmen ji 1961an û vir ve piştgiriyê didin serhildanên Kurdan û wiha domand; "Çimkî yên ku Tirkmen parastin her Kurd bûn. Birêz Mistafa Barzanî Tirkmen weke pêkhateyeke bingehîn ên Kudistanê dît. Digel ku li Iraqê Tirkmen weke kêmare tên hesibandin bi saya serokê Kurdistanê Mesud Barzanî Tirkmen li Kurdistanê weke pêkhateya bingehîn a Kurdistanê tên hesibandin. Wek pêkhateyeke bingehîn a Kurdistanê daxwaziya me ji DYA ew e ku piştgiriyê bide serxwebûna Kurdistanê.

## Kî beşdarî konferansê bû?

Kes û dezgeyên ku beşdarî konferansê bûn ev in; Serokê Şêwirmendê Encûmena Asayişa Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî, Endamê Politburoya YNKê û Parêzgerê Kerkûkê Necmeddin Kerim, Nûnerê Başûrê Karolinayê yê kongreya DYA Joe Wilson, Senotorê Arizonayê yê ji Partiya Komarparêz Trent Franks. Li hêla din beriya konferansê rojnameya Washington Times ku rojnameyeke bi bandor e, hejmareke taybet ku ji nivîsarên li ser piştgirîkirina serxwebûna Kurdistanê pêk dihat belav kir.

## Ji DYAyê ji bo referandûmê şandeke çavdêriyê tê Kurdistanê

Li hêla din amadekariyên pêkanîna referandûma serxwebûnê berdewam dikin û serdana şandeyên navdewletî bo Kurdistanê jî dest pê kir. Serokê Komîsyona Hilbijartinan a Herêma Kurdistanê Hendrên Mihemed, eşkere kir ku şandeyeke Amerîkî hefteya derbasbûyî ji bo çavdêrîkirina referandûma serxwebûna Kurdistanê hatiye Hewlêrê.



EKREM ÖNEN


### Referandûm û Medya II

Înformasyon – Desînformasyon, Propaganda - Kontrpropaganda, Manîpulasyon û Şerê Psîkolojîk

Înformasyon- Heta niha jî têgihiştinek zanîstî homojen ji bo înformasyonê nehatiye dîtin. weke tê zanîn di gelek beşan de înformasyon weke termîn bikar tê, wek mînak di Massmedyayê de her weha di ilmê matematîkê de (Informatîka ) û her weha di gelek beşê din de jî tê bikaranîn. Bi tevayî em dikarin ji bo înformasyonê weha bêjin. Di derheqê tiştekî an bûyerekê de bi kurtî dana zanînê ye. Di Massmedyayê de înformasyon ragihandina bûyerên ji bo civatê ye. Ev ragihandin ne bê qaîde û bê hudûd e. Li hemû welatên cîhanê ji bo ragihandina înformasyonê, di yasaya bingehîn a welêt de qanûn û qaîde hatine danîn. Di bin nav û şeklên cihê de mekanîzmayên kontrola li ser ragihandinê hene. Ev kontrol ji bo ewlekariya netewî, civakî, pirsên moral û etîka rojnamegeriyê û hwd. Ev formê kontrolê li gor welatan tê guhertin. Li hinek welatan bi yasayî, li hinek welatan bi qerarname û li hinek welatan bi formê autokontrol dibe. Wek mînak ev kontrol li DYA, Rûsya, Fransa, Almanya, Brîtantya, Swêd û gelek welatên din heye. Li tu welatan medya bê kontrol nîne. Ji ber medya ji bo ewlekariya netewî û civakî gelek girîng e. Ev tişta ku weke unîversal qaîdeyek li tevaya dinyayê, pir heyf ku Kurdistan îstisnaye. Her çiqas yasayek li ser Massmedya Kurdistanê hebe jî lê wek li ser kaxezê mabe. Ne dezgehên hikûmî bi wezîfa xwe radibin ne Massmedya autokontrol dike. Sebebên esasî ew e ku desthilatdar ji ber kompleksa ji wan re nebêjin "Dîktator" mudaxele nakin, dezgehên medya jî ji ber amatorin, ji "Azadiya Massmedya" wek ku her tişt mubahe fam dikin. Divê Hikûmeta Herêma Kurdistanê xwe ji kompleksa wê jê re bêjin "Dîktator" rizgar bike û medya jî divê baş fam bike azadiya rojnamegerî ne "Kaose" divê fam bike lazime mekanîzmayek kontrolê hebe. Ji bo wê divê bi yasayên pir zelal heq û hiqûqê her du aliyan ji ku heta ku ye eşkere bibe.

Çi di demên berê de çi niha me dît gelek ji Massmedya Kurdistanê gelek caran bi înformsayon û desînformasyonên xwe ewlekariya millî û civakî xistin/dixin xeterê, civata kurd bê hêvî kirin/dikin, berê wan ji armanca sereke didin cihekî din, gelek caran bi zanetî an nezantî dibin perçeyek ji medya xêrnewazê kurda, ev ji ber gelek sebebane lê yek ji sebebên esasî rojnamevan amatorin ne profesyonalin. Divê fehma niha hakim li Kurdistanê derbarê Journalîst bête guhertin, her yek ku kamerayek di dest de be an çenteyek li ser mila be nabe rojnamevan, her şovmen ne rojnamevane, her kesê nivîseke siyasî an civakî binivîsîne ne rojnamevane publîstîste her publîstîst ne rojnamevane yekî fîzîk an kîmyager jî dikare nivîsekê li ser kîmya an jî fîzîkê binîvîse ew jî publîstîste ne rojnamevane. Divê bê zanîn Journalîstîk ilmekî bi serê xwe ye û lazime bê xwendin heger ne weha ba li temamî cîhanê wê li hemû zanîngeh, zankoya Journalîstîka ne bûya. Kurd ji amatoriyê westiyan

Desînformasyon- Nûçeyên derew ku ji aliyê dijmin an oponentê ve têne weşandin, ji bo ku bikaribe berê civatê ji rastiyê biguhere. Ew terefên ku desînformsyonê diweşînin, an înformasyona heye bi temamî nadin an jî ji bin de înformasyona heye berovajî didin. Armanc jê ew e ku dijberê xwe bêtaqet û bêhêvî bikin û raya giştî weke ew dixwazin saz bikin ji bo civatê wek ew dixwazin birêve bibin. Medya kurdî di pirsa desînformasyonê de îmtîhanek serkeftî nedaye. Wek em di medya xêrnexwazên kurda bi desînformasyonê dixwazê kurda bêhêvî bike, berê kurda ji armancên wan rast bi alîkî din ve bibe, her weha dijberiya nav civata kurd xurt bike ku kurd nikaribe wek milet tevbigere îro civata kurd perçe bûye û gunehê mezin yê medya kurdî ye ku nikarin kurda li dor fikrên netewî bicivînin û mobîlîze bikin. Medya kurdî gelek caran ew jî bi zanetî an bi nezanî dikevin ber vî bayî. Îro rojeva kurda û sazkirina raya giştî kurda medya xêrnexwazê kurda çêdike medya kurda li hember vê ya bêçare ye. Medya kurdî nikare bibejê de rê înformasyonê ji bo medya cîhanî. Bileks ew nûçêyên Kurdistanê ji medyayên biyanî digire. Wek mînak serokê Herêma Kurdistanê birêz Barzanî li Hewlêrê ji medyayê re beyaneke girîng dide, medya kurdî vê beyanê ji medya biyanî wek jêder rê dide û nûçê dide. Di rastiya xwe de lazime medya biyanî ji medya kurdî wê nûçeyê bigre, ji ber birêz Barzanî li Hewlêre ye medya kurdî navenda wan Hewlêre, nûçe li ser kurda ye û medya kurdî hesantir dikare bigihêje serkirdayetiya kurd. Ma ev ne paradokse? Hikumeta Herêma Kurdistanê divê zû çareyekê ji medyayê re bibîne an na kurd wê deskeftiyên dîrokiyî mezin wenda bikin. Xêrnexwazê kurda li hember kurda şerekî medya yê profesyonal dikin, ji kurda re bombeyek ku tesîra xwe hêdî hêdî rê dide amadekirine, heger kurd niha rê li ber negirin paşê wê dereng be.




Karîkator - - - - - - - - - - Dijwar Ibrahim

Endamê Polîtbûroya Partiya Zehmetkêşên Kurdistanê:

# Dema dewletbûna Kurdan hatiye



“Em serxwebûnê jî weke mafên miletan dibînin. Miletê Kurd tekane milet e ku 40 milyon gelheya wan heye û bêdewlet in. Ji bo miletekî ku mafên wan ji dest hatibin girtin, daxwaza mafan tu caran ne zû ye. Ewên ku dibêjin ‘zû’ ye, di wê fikrê de ne ku Herêma Kurdistanê amadekariyên xwe nekirine.”



NÛRÎ BÊXALÎ

**Hûn roja destnîşankirina referandûmê ku hûn jî di nav de bûn, çawa dinirxînin?**

Ya rastî ev biyareke derengmayî bû. Beriya niha gelek fersendên baştir hebûn, lêbelê mixabin ev biryar nehat girtin. Rûxandina rejîma Sedam Husên ji bo me Kurdan derfeteke zêrîn bû. Rejîma Baas hilweşiya û hêza wê nemabû ku êrişî me bike. Rewşa siyasî ya navxweyî jî ji niha baştir bû. Ji ber wê yekê diviyabû ev biryar beriya niha bihata girtin. Berpirsên Kurd li şûna avakirina Iraqê, bila serxwebûna Kurdistanê ava bikirana. Piştî çareserkirina kêşeyan dibe ku rewş guncavtir bibe. Ji bo pergala serweriya herêmê û ji bo pêşerojeke baş bo jiyana xelkê, dibe ku baweriyek bê dayîn.

**Tişta ku vê rojê dike ‘dîrokî’ çi ye?**

Referandûm, pêngaveke girîng e ji bo parastina pergalên siyasî bi rêya wergirtina ray û îradeya xelkê. Nemaze jî me Kurdan beriya niha derfeteke wiha bidest nexist. Ji ber vê yekê roja referandûmê ku xeyala Kurdan ya sedsalî ye û ji bo vê xeyalê biqasî deryayê xwîn rijandine û gelek bedel dane, rojeke dîrokî ye. Ji bo miletê Kurdistanê jî ez bawer nakim kes hebe ku ragihandina serxwebûna Kurdistanê pîroz nebîne.

**Ev ji bo guherîneke bingehîn nîşaneyek e?**

Diyarkirina pêşeroja xwe ya bi rêya referandûmê ku mafekî gerdûnî yê însanan e, bêgûman guherîneke dîrokî ye. Berê ev tişt weke xeyal dihat dîtin. Dijminên Kurdan jî li hember daxwazên Kurdan yên bi vî rengî dîn dibûn. Lê êdî her tişt guherî. Tiştên ku me nedikarî biaxivin, niha bi zelalî em dixwazin. Ev guherîneke girîng e. Tu kes ji me jibîr nake ku me di ber maf û xweseriya xwe de çiqas xwîn rijandiye. Niha rewş di berjewendiya Kurdan de ye. Divê em ders ji dîrokê bigirin û ji vê fersendê îstîfade bikin.

**Hinek kes û alî di wê fikrê de ne ku niha ji bo vê biryarê dem ne guncav e. Hûn çawa difikirin li ser van îdîayan?**

Ez dîsa dibêjim, ji bo miletekî ku mafên wî ji dest hatibin girtin, daxwaza mafan tu caran ne zû ye. Ewên ku dibêjin ‘zû’ ye, di wê fikrê de ne ku Herêma Kurdistanê amadekariyên xwe nekirine. Belê bi qismî rast e. Heke hikûmet û siyasetmedar ji bo vê pêngavê baştir bişixuliyana dibû ku amadekariyên me baştûr bûna.

**Yanê rewşa niha ne guncaw e?**

Rewşa heyî li ser mijarên din jî bandoreke neyînî kirin. Şerê Kurdistanê yê bi DAIŞê re û serdana gelek berpirsên dewletan di vê heyamê de ji bo dewletbûnê karekî baş kir. Lêbelê rewşa siyasî ya Kurdistanê û ji karketina parlamentoyê ji bo hin dewletan bû hincet ku piştgiriyê nedin referandûmê.

**Hin alî referandûmê weke ‘kozekî û muzayedeyeke partîwerî’ dibînin. Gelo ev partiyên ku biryara pêkanîna referandûmê dan, hemû ‘muzayede’ dikin?**

Referandûm mafek e ji bo gelan ku pêşeroja xwe ya siyasî diyar bikin. Piştî ewqas bedel û têkoşînê, ev cara yekem e ku ji bo diyarkirina pêşeroja siyasî ya Kurdistanê, ev fersend tê bidest xistin. Partiyên siyasî jî ji bo armancên miletan navgîn in. Eger petiyên siyasî li ser vê rêbazê bixebitin, wê miletan bigihêjînin armancên wan. Mijareke netewî ya mîna referandûmê nabe ku bibe qurbaniya rageşiyên siyasî.

**‘Muzayede’ ji bo çi, li dijî kê û di oxira çi de tê kirin?**

Eger ev muzayedeyek be û ev muzayede rijdbûnek be ji bo bidestxistina mafên miletê Kurdistanê em ê vê bi hêsanî bibînin. Bila partiyên Kurdî werin ji bo xizmet û deskeftiyên zêdetir bikevin pêşbaziyê û em bibînin.

**Tiştekî din jî heye, dibêjin ‘ew partiyên ku beşdarî civîna 7ê Hezîranê bûn û roja referandûmê diyar kirin, di bin siya PDKê de man.’ Hûn weke partiyeke ku li çiya û baniyan û her derê gelek têkoşîn daye û wek kesekî ku bawerî bi Kurdistana serbixwe tîne, li ser van sûcdarkirinan çi dibêjin?**

Rageşiya siyasî ya li Kurdistanê hatiye wê radeyê ku gel û partiyan ji hev dûr dixe. Di vê rageşiyê de rexne na, tenê sûcdarkirin hene. Em weke partiya zehmetkêşên Kurdistanê bi salan e ji bo serxwebûna Kurdistanê têdikoşin. Niha jî em bawer dikin ku emê tenê bi serxwebûnê bigihêjin mafên xwe. Eger niha referandûm were piştgirîkirin em dikirin bibêjin ku hatine ser fikra me.

**Hinek alî îddîa dikin ku referandûm biryara Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî ye. Li gor we jî ev referandûm tenê ji bo kesekî tê kirin?**

Me weke Partiya Zehmetkêşên Kurdistanê di daxuyaniya xwe ya dawîn de jî eşkere kir ku em referandûmê weke meseleyeke netewî dibînin û divê bi ajandaya partiyekê lê nenêrin. Ji ber wê yekê beriya referandûmê divê di navbera partiyên siyasî de ji bo amadekariyên referandûmê kombûnek çêbibe û bernameyek bê amadekirin û îmzekirin. Rêkeftineke netewî; Rûyê dewleta Kurdistanê, peywîr û karên partiyên siyasî, mijarên çawanî û dema ragihandina serxwebûnê li xwe digire. Eger em van bikin, referandûm wê bibe meseleyeke netewî.

## Hûn tim alîgirê serxwebûnê bûn...

Em weke partiyeke siyasî dibêjin ku Kurdistan hatiye parçekirin û dagirkirin. Tekane çareseriya miletekî ku welatê wî hatibe parçekirin û dagirkirin jî serxwebûn û azadî ye. Bi salan e Kurd ji bo otonomî û demokratîkkirina dewletên dagirker, gelek xebitîn. Me nikarî demokrasiyê nîşanî Bexda, Enqere û Tehranê bidin. Ev, tenê wext windakirin bû û ne peywîra me jî bû. Ev tecrubeya me ye ku me ji 2004an, ji hilweşandina rejîma Sedam û vir ve girtiye. Me dewlet bi hev re dîsa ava kir, me bi hev re Destûr nivîsî, lê encam bû çi? Me karî hindik jî be miletê serwer bigûherînin, bêgûman na. Kurdistana Tirkiyê jî ji bo vê mînak e; HDP ku hêzeke yasayî ye di parlamentoyê de partiya sêyem e, lêbelê dikare li Enqerê di bin siya dewletê de tiştekî bike? Ji ber wê yekê ev hemû mînakên min rêz kirî, dirûşma Partiya Zehmetkêşên Kurdistanê îspat dikin. Me ji destpêka têkoşîna xwe û heta îro baweriya xwe bi serxwebûnê aniye.

## Dewlet ji bo Barzanî tê avakirin?

Dewletbûn, meseleyeke netewî ye û kes navgîn in, ne armanc. Divê desthilat jî bi awayekî cidî nêzî vê pirsa we bibe. Nabe di perspektîfa kesekî re li meseleya referandûmê bê nêrîn. Devlet divê dezgeheke wisa ava bike ku mafên her kesî biparêze. Ji kes û partiyan kî ji bo dewletbûnê bixebite, ew dê navê xwe li dîrokê binivise.

**Hûn vê psîkolojiya siyasî çawa dinirxînin?**

Em serxwebûnê weke mafê miletan dibînin. Bi salan e me gelek bedel di ber vê xeyalê de dane. Kurd bi zêdetirî 40 milyon serjimara xwe tekane milet e ku nebûne xwedî dewlet. Cîranên me yên Ereb jî mîrekî bûn, lê niha 23 dewletên wan hene. Ji aliyê dirokî û çandî ve tu kêmasiya me ji wan nîn e. Divê siyasetmedarên Kurd xwe biçûk nebînin. Dema dewletbûna me jî hatiye. Ne tenê li Herêma Kurdistanê, li Rojavayê Kurdistanê jî ji bo dewletbûnê bingehek ava bûye.

**Baş e, gelo kêşe û rageşiyên li Herêma Kurdistanê wê çawa bidawî bibin?**

Niha guftûgo tên avakirin ji bo çareserkirina kêşeyan. Ji bo bikaranîna vê fersendê û avakirina yekitiyeke netewî divê her alî di çarçoveya berjewendiyên netewî de lê binêre. Divê her partî berpirsyariya xwe bizane û mil bide vî barî. Di avakirina yekitiya netewî de barê giran dikeve ser milên desthilatan. Ev kêşe ne tenê siyasî ne. Divê li ser kêşeyên hizmetgûzariyê, başkirina mûçeyên karmendan, kêşeyên netewî û gendeliyê jî bê sekinîn.

**Ji bo Kurdan serweriya netewî girîng e an ew hincetên ku ji bo astengkirina referandûm û serxwebûnê davêjin holê?**

Di raboriyê de li Herêma Kurdistanê berjewendiyên netewî, bi bin yên partiyan ketine. Heta carinan berjewendiyên kesayetî jî ketine pêşiya yên netewî û partiyê. Di vê heyama ku em referandûm û serxwebûnê diaxivin de, divê tiştek neyê jibîrkirin; eger berjewendiyên şexsî û partîtiyê şûna berjewendiyên netewî bigirin em ê vê fersendê jî mîna yên berê ji dest bidin.

**Hinek ji ber sedemên perçebûna axa Iraqê li dijî serxwebûnê derdikevin. Gelo divê alternatîfa berbirsên Kurdistanê li hemberî vê yekê çi be?**

Li gorî me Iraqeke yekgirtî nemaye. Mixabin ev hêzên mezin an vê yekê nabînin an jî berjewendiyên wan tê de hene. Eger ji vê yekê bawer bikin jî divê dijayetiya serxwebûnê nekin. Ji ber ku dê li dijî prensîbên xwe bi xwe derkevin. Em aciziya dewletên herêmê fêm dikin. Alternatîfa vê rewşê jî sererastkirin û başkirina rewşa navxweyî ye. Ev dijayetiyên ji bo paşxistina referandûmê wê li hemberî mihwerê me yê bihêz kêm bibin. Divê parlamento bê çalakkirin û hilbijaritinên serokatî û parlamentoyê bên kirin. Divê partiyên Kurdistanê peymaneke netewî îmze bikin. Divê ji bo jiyana rojane çaksazî pêk bên. Divê di navbera desthilat û xelkê de pireke baweriyê were avakirin.

**Nêrîna hevpar ya xelkê wê çi bandorê li ser siyaseta Kurdistanê bike?**

Li hemberî hewldan û zextên ji bo paşxistina referandûmê, divê Kurd tenê pişta xwe bidin miletê xwe. Eger siyasetmedar ji piştgiriya xelkê piştrast be, guh nade zextên ji derve. Lêbelê niha him ji derve zext hene û him jî nêrîna navmalê hemû nebûye yek. Divê ewilî nêrîneke hevpar bê avakirin.

**Gelo di helwesta Bexdayê de wê guherînek çêbibe?**

Di van sedsalên borî de ji destpêka damezirandina dewleta Iraqê heta niha li Iraqê kî desthilat be; opozîsyon be, Şîe be, Sunne be tu hêzan bawerî bi mafên Kurdan neaniye. Lê dîsa jî divê siyasetmedarên Kurd ji diyaloga li gel wan venegerin. Nemaze jî ji bo diyaloga li gel Bexdayê li ser Kurdan ji derve zext hene. Li gorî me divê Kurd bi amadebûna aliyekî sêyem li gel Bexdayê rûnin. Divê ji referandûm û serxwebûnê paş ve gav neyê avêtin.

**Piştî Baas li Iraqê û bi destûra wê, tecrubeyeke biêş hat jiyîn. Tevî vê jî Kurd dikarin kêşeyên xwe yên ligel Bexdayê çareser bikin?**

Di warê siyasî û destûrî de di destê Kurdan de gelek koz hene; ji mafên gerdûnî bigire heta mafê diyarkirina çarenivîsa xwe yasayên navdewletî gelek mafan nas û qebûl dikin. Destûra Iraqê jî dibêje ku ‘yekperçebûna axa Iraqê girêdayî birêvebirina destûrê ye.’

**Kurdistana serbixwe were ragihandin, têkiliyên Kurdistan–Tirkiyê wê çawa bin?**

Tirkiye jî mîna welatên din li dijî referandûmê sekinî. Em niha nizanin ka ev siyaset bû an bo razîkirina miletê xwe bû. Ji ber têkiliyên aborî yên bi Herêma Kurdistanê re, divê Tirkiye dijayetiya referandûmê neke. Jixwe dema ku em bûn dewleteke serbixwe jî ev pêwendî wê bihêz bibin.

“Bi salan e Kurd ji bo xweserî û demokratîzekirina dewletên dagirker gelek xebitîn. Lêbelê me nikarî demokrasiyê nîşanî Bexda, Enqere û Tehranê bidin. Ev tenê wext windakirin bû û jixwe ev ne peywîra me jî bû.”




## SEÎD SELÎM

Endamê Polîtbûroya Partiya Zehmetkêşên Kurdistanê Hîwa Seîd Selîm, li ser referandûma serxwebûnê, rageşiyên siyasî yên li Herêma Kurdistanê, ragihandina serxwebûnê û çareserkirina kêşeyên bi Bexdayê re, ji Heftenameya Basê re axivî. Selîm ligel dîyalogên çareserkirina kêşeyên bi Bexdayê re ye û dibêje, “Lêbelê me ji bo vê xeyala xwe ya tekane gelek bedel dane. Kurd bi 40 milyon serjimara xwe tekane milet e ku nebûye dewlet. Ji ber vê yekê ji serxwebûn û referandûmê paş ve gav nayê avêtin.”

HOŞENG OSÊ



## Demsala Konferansên Dogmatîk

Her sal, weke van çaxan, ji heyva tîrmehê heta dawiya heyva tebaxê, rê û rêwanî li ser herêma Qendîlê namînin, hingî konger û konferansên PKK, PYD, PJAK, PÇDKê...û hwd. tên lidarxistin. Konferansa ragihandin û medya, konferansa rewşenbîran, konferansa hunermendan, konferansa bijîşkan, konferansa şofêran, konferansa “tirşikçiyan”... konferansa çi were ser bîra we, di van deman de, tê li darxistin. Ango, di vê demê de, her kesek ji alîgirên PKK -PYDê, heger we dît li rûpela xwe a facebookê nivîsand: “Bibûrin hevalno, dê mehekê dûrî we bikivim”, baş nas bikin ku ev camêr, yan jî ev xanim, dê biçe beşdarî konferansekê ji van konferansan bibe.

Ji ber çi ez wisa dibêjim? Ji ber ku ez jî, dema Apocî bûm, di vê rewşê re derbas bûme û di tîrmeh û tebaxa 2007an de li Çiyayê Qendîlê bûm. Ji min xwestin ez tevlî konferansa ragihandin û medyayê bibim, lê min qebûl nekir. Ez çûbûm rewşa li wira bi çavan bibînim û ji nêzîk ve bişopînim û hin hevpeyvîn bi berpirsên PKKê re ji bo rojnameya El-Hayatê çêbikim û min çêkirin û El-Hayatê belav kirin. Ne tenê wisa jî, min got: Ez nehatime beşdarî konferans monferansan bibim. Em ji konferansan têr bûne û hingî me konferans dîtin, em bûne konferans.

Ev agahî, ne tiştekî veşartiye û ne razeke (sireke) leşkerî ye ez eşkere dikim û niha li Qendîlê demsala konferansan e . Ji ber ku dewleta tirk, hemû tiştî bi rêya seteleytan dişopîne. Ne tenê wisa jî, ji hemû deverên Tirkiye, Kurdistanê, Europa, Rojava, Başûr û Rojhilatê welêt, kes û kesayetî tên beşdarî van konferansan dibin.

Di van konferansan de, qaşo PKK dost û endamên xwe, ji nûve perwerde dike û ji aliyê îdolojîk ve wan resen û sererast dike û wan bi nirx, rê û rêbaz bi “xeta partiyê” ve girêdide.

Di “urf û adetên” PKKê de, kî diçe perwedeyên îdolojîk? Tenê kesên endam, yan jî alîgir ku problemên wan yên rêxistinî hene. Yan qels bûne, yan guman li ser wan hene ku ji rêxistinê veqetin, yan hin pirsgirêk û kêş çêkirine... bi giştî, kesên saxlem û girêdayî rêxistinê û ji aliyê îdolojîk bi korahî û weke “mirîdan” tevdigere û kar dike, ev kes ne bi hewceyî perwerdê ne.

Birastî, dema mirov dikeve “hucereya” perwerdeya PKKê, wisa bi serê mirov tê ku êdî hemû kesî li ber çavên xwe reş bibîne, ji bilî partiyê û serokatiya wê, heta qûnaxa ku mirov xwe jî reş û kêm dibîne. Ango ji aliyê rih û mêjî ve, bi îdolojiya PKKê mirov tê şûştin.

Di nava PKKê de perwerde tiştekî pîroz û stratejîke ji bo ava kirina kadroyên “mirîd-mirûd”. Lewma hemû kongere û konferansên PKKê, di eslê xwe de, perwerde ne, ne konferans in. Ev konferans, ritmeke wan î taybet, klasîk û berdewam a PKKê heye. Ev ritm ji van xalan pêk tê: 1- Xwendina nameya Öcalan (Çi rast be, çi ne rast be ev name). 2- Nirxandina rewşa siyasî û leşkerî a partiyê. 3- Xwerexne kirin. 4- Plansaziya paşerojê. 5- Hilbijartinên komîteyan. Her wiha, hemû konferans bi soza serkeftinê “ku pir nêzîk bûye” û çepik û tilîlî û “bijî serok Apo” bi dawî dibin. Ev konferans, kopyayên hev in û tiştekî nû û cuda di navbera wan de nîne. Ango hemû konferans weke hev in û “Ew tas û ew hemam in”.

Baş e, li gorî vê rewşê, guherîn û guherîna ku PKKê behsa wê dike, çawa mirov dikare bawer bike? Ji ber ku heger mirov li gorî ragihandin, medya û şêweyên axafitina PKKê a siyasî, ramyarî û bîrdozî biçe, dê bibêje: Wey bavo, PKKê qûş li demokrasiyê, nûjeniyê, wekheviyê, modernîzmê qetandiye! Gelek kes jî dibe ku bi vê propagandaye bawer bikin û werin xapandin. Lê yê ku dixwaze rastiya vê rêxistinê nas bike, divê tevlî wê bibe û du-sê salan di nav de bimîne û ji rêxistinê veqete û hinek rexneyên fedyok û piçûk li PKKê bike û li helwest û “reaction” rêxistinê binêre, dê çaxê delavê demokrasiya PKK qam bike bê çiqas “kûr û firehe e”!

Her sal, li bakurê Kurdistanê, bi dehan kongere û konferansê PKKê û derûdorên vê partiyê li dardikevin, her wisa li rojava, başûr û Europa jî û ji bilî dogmatîzmê ka çi ji biryar û soz û diruşmeyên van konferansan pêkhatine?

Bi kurtî, mixabin, raste PKK xwe êdî di ser bîr û boçûnên netewî re dibîne, lê hema xweziya ji “mala Xwedê” re PKK ji %10 ji vê demokrasiya pê bang dike pêkbîne. Ev demagojiya PKKê a ku qesr, qûnax û bihuşta demokrasiyê ji qûm û berfê ava dike, dê heya kengî berdewam bike?

Endamê Lijneya Rêvebir a PDK- Bakur Bora Balin:

# Kurdistan wê bibe sitargeha demokrasiyê



NÛJÎN ONEN



Partiya Demokrat a Kurdistana Bakur (PDK- Bakur) , Partiya Demokrat a Kurdistana Tirkiye (PDK-T) û Partiya Welatperwer û Demokratên Kurdistanê biryar dan ku bibin yek. Li ser vê biryarê KDPê serî li Wezareta Navxweyî ya Tirkiyeyê dabû, lê daxwaznameya wan nehatibû qebul kirin. Endamê Lijneya Rêveberiya Navendî ya KDP-Bakur Bora Balin derbarê referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê de ji Heftenameya Basê re axivî û got “Dewleta Kurdistanê dê li herêmê bibe parêzvana ewlehî, demokrasî û îstîqrarê”

Bora Balin dibêje Herêma Kurdistanê ji bo Iraq bibe xwediyê destûreke demokratîk û ji bo pêkvejiyanê, kedeke mezin da û axaftina xwe wiha domand: “Serokkomarê Iraqê yê berê (Nuri Maliki) piştî ku bûdceya Kurdistanê qut kir herwiha polîtîkayên Hikûmeta Bexdayê yên neyênî jî bûn sebeb ku Kurd bi xwe li çareseriya xwe bigerin û bibînin. Ji ber van sedeman biryara Hikûmeta Kurdistanê ya pêkanîna referandûma serxwebûna Kurdistanê, demokratîk, rewa û xwezayî ye. Em wek partî jî piştgiriya biryara referandûmê dikin, ji bo wê em ê her karî jî birêve bibin.” Balin di derbarê piştgiriyê de jî wiha axivî; “Piştî biryara Herêma Kurdistanê em wek partiyên Kurdistanê, saziyên sîvîl û şexsên bêalî me hin civînên ji bo ‘em piştgiriyeke çawa dikarin bidin’, pêk anîn. Di daxuyaniya me ya hevpar de jî me nîşan dabû, ji bo em referandûma Herêma Kurdistanê bi awayekî zelal ji raya giştî re vebêjin em ê konferans, civînên bi gel û festîvalan pêk li dar bixin.

Balin di berdewamiya axaftina xwe de diyar dike ku dewleta Kurdistanê wê bibe parêzvanê îstîqrar, ewlekarî û demokrasiya herêmê û wiha pê de diçe: “Guhertinên ku Bihara Ereb anîn, bi awayekî eşkere nîşan da ku li Rojhilata Navîn kêşeyên herêmî yên sîstemê çiqas navdewletî bûne û bandorê jî li hev dikin. Tiştên ku li herêmê rû dane, nîşanî me didin ku hin tifaqên herêmî hatine xera kirin, li ser hevsengên hatine guhertin jî li herêmê pergaleke nû tê ava kirin. Li gel her tiştî, di nav tevliheviya herêmê de cîhê ku li ser piya maye, xwe parastiye û roj bi roj pêş ve diçe Herêma Kurdistanê ye. Herêma Kurdistanê li gor pratîka rêveberiya heta niha nîşan dide ku dewleta Kurdistanê dê li herêmê bibe parêzvanê, ewlehî, demokrasî û îstîqrarê. Herêma Kurdistanê heta niha zêdetirî 25 hevdîtinên navneteweyî yên girîng pêk anine. Di encama van hevdîtinan de em dibînin ku helwesta civata navneteweyî ya li hember îlankirina dewleta Kurdistanê erênî ye. Ji ber wê ez di wê baweriyê de me ku hebûna dewleta Kurdistanê, li Rojhilata Navîn ji bo cîranên wan ên ku bi kêşeyên mezin rû bir rû ne dê bibe model.



**“Naxwazin Kurd xwe birêve bibin”**

Bora Balin gotinên ‘niha ne dema referandûmê ye’ rexne dike û dibêje, “Piştî ku terora DAIŞê li Rojhilata Navîn derket holê, Hikûmeta Iraqê ewlehiya gelek herêman nikarîbû kontrol bikira. Ji van herêman gelek jê hîn jî nestendine. Em dibînin ku ti kontrola Hikûmeta Bexdayê li ser Ramadi, Felluce, Mûsûl û Herêma Kurdistanê nemaye. Ji ber wê perçebûneke fîîlî heye. Di vê heyama ku rewşa herêmê li holê ye û Kurdistanê îstîqrar û demokrasiya xwe parastiye û her roj ev demokrasî bihêztir dibe de pêkanîna referandûmeke ku wê di çarçoveyeke demokratîk de pêk were, gelo li derveyî vê heyamê wê di demeke çawa de hebe! Kesên ku dibêjin ev biryareke zû ye, ew kes in ku naxwazin Kurd xwe birêve bibin û naxwazin Kurd di warê pêşeroja xwe de xwedî gotin bin. “

Balin rexne li helwesta Tirkiye ya li hember referandûma Herêma Kurdistanê digire û diyar dike: “Têkiliyên Kurdistanê yên bi Îran û Tirkiyeyê re xwedî raboriyeke geh li berjêr geh li berjor e. Gelek mijar hene ku Kurdan him nêzî van dewletan dike him jî jê dûr dixe. Di daxuyaniyên dawîn de tê dîtin ku helwesta Îran û Tirkiye ji ber dewleta Kurdan bûye yek. Du sedemên van helwestên neyênî hene. A yekemîn pêşbêrka rolmodeliyê di nizama nû ya Rojhilata Navîn de û ya duyemîn jî bi îlankirina dewleta Kurdî jî çêkirina teoriyên komployan e ji ber gelheya zêde ya Kurdan.

> “Di nav tevliheviya herêmê de cîhê ku li ser piya maye, xwe parastiye û roj bi roj pêş ve diçe Herêma Kurdistanê ye. Dewleta Kurdistanê, li Rojhilata Navîn ji bo cîranên wan ên ku bi kêşeyên mezin rû bir rû ne dê bibe model.

## “Dewleteke serbixwe dê bibe garantorê hemû Kurdan”

Balin, di derbarê karîgeriya Kurdistana serbixwe li ser herêmê jî radigihîne ku cîhan bûye şahid ku hebûna dewleta Kurdan li herêmê him ewlehiyê, him baweriyê, him jî îstîqrarê pêk tîne û herwiha alikariyeke çawa li Kurdên Tirkiye û yê Sûriyeyê dike û axaftina xwe wiha didomîne: “Daxuyanî û bertekên Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî û Serokwezîr Nêçîrvan Barzanî yên li hember girtina siyasetmedarên Kurd û herwiha daxuyanî û hewldanên wan ên ji bo miletê Kurd nîşan didin ku dewleta Kurdistanê wê ne tenê ji bo Kurdên Başûr, ji bo hemû Kurdan be. Eger Tirkiye vê rewşê baş şîrove bike û pozîsyona Kurdan a sedsala 21an têbigihije û li gor wê tevbigere, dê bibîne ku li Rojhilata Navîn ji Kurdan baştir ji bo Tirkiye partner tuneye. Ji ber ku Kurdistan ne tenê berjewendiyên xwe, berjewendiyên cîran û cîhanê jî difikire.”

Sıtkı Zilan:

# Referandûm wê destê Kurdistanê xurt bike

MÎRA JÎN



Piştî diyarbûna roja pêkanîna referandûma serxwebûna Kurdistanê di qada navdewletî û herêmî de ji gelek aliyan ve piştgiriyeke xurt hat nîşan dan. Yek ji wan yên ku piştgiriya xwe ji bo referandûma serxwebûnê eşkere kiriye Hereketa Azadî ye. Berpirsê Karên Siyasî û Civakî Endamê Lijneya Rêvebirinê yê Hereketa Azadî Sıtkı Zilan derbarê referandûma serxwebûna Herêma Kurdistanê ji Heftenameya Basê re axivî.

**‘’Bi fedakariyeke yekalî ev naçe serî”**

Sıtkı Zilan, helwesta Hereketa Azadiyê wiha vedibêje: ‘’Em wek Hereketa Azadî bi muxalefeta Kurdan re me lijneya piştgiriyê bo referandûmê ava kir. Ji salekê zêdetir e xebatên me didomin. Bi guftugoyên ku me kirine him referandûm him jî dema piştî wê serxwebûn bê îlan kirin divê bê şert û merc piştgiriya wê bê kirin,Herekata Azadî ji vê yekê re dibêje erê. Li gor fikra me em di wê baweriyê de ne ku gelê me jî dê ji referandûmê re bibêje ‘Erê’. Ji bo li ser vê mijarê manîpulasyon neyê kirin divê ev pêk were. Ji ber ku referandûm dê li cîhanê û Neteweyên Yekbûyî destê Hikûmeta Herêma Kurdistanê xurt bike. Kurdistan dê roja diduyan li hember kesî şer îlan bike? Na. Wê li ser vê mijarê bi Bexdayê re hevdîtinan pêk bînin. Dê bibêjin gel di referandûmê de nîşan da ku serxwebûnê dixwaze kerem bikin em biaxivin. Ji xwe destûra Iraqê heye û divê ev referandûm li gor destûrê ji zû ve bihata kirin, lê nekirin. Ya din bûdceya ku ji bo Kurdistanê hatibû veqetandin divê bi rêkûpêk bihata dayîn ev jî nekirin. Bi fedakariyeke yekalî ev naçe serî divê rûnin,biaxivin û formulekê bibînin lê ti carî vegera ji vî karî jî tuneye.”

**‘’Îran ji Tirkiyeyê zêdetir dikare bandorê bike”**

Zilan, di dirêjiya axaftina xwe dedibêje, “Îran ji Tirkiye bêhtir midaxale dike” û axaftina xwe wiha didomîne: “Heta Îran li Bakûrê Kurdistanê jî bi bandor e,him li civata îslamî,him di meseleya PKK, Sûriye û Esad. Tiştekî ecêb heye ku him bi îslamî him bi hin partiyên Kurdan PKK,Goran him jî bi hin kemalîstan re têkiliyên wan hene. Helbet dewlet dikarin ji bo karê saloxgeriyê têkiliya deyne ji xwe ez behsa vê yekê nakim. Ez nabêjim hereket û partiyên Kurdistanî û yên li Kurdistanê sedî sed di bin bandora wan de ne, lê têkiliyên wan hene. Îran ji Tirkiyêzêdetir dikare bandorê li ser Başûr û Bakûrê Kurdistanê bike.”

**“Dewletbûn dewlemendbûn e”**

Sıtkı Zilan di dirêjiya axaftina xwe de destnîşan dike ku dema neteweperwerî li Fransayê tunebû Ehmedê Xanî di “Mem û Zîn”ê de behsa netewperweriyê dike. Netewperweriyeke çawa? dibêje: ‘’Bila tacek me hebe û qralekî me hebe. Bi awayekî eşkere dibêje ku bila dewleteke me hebe. Ji ber ku dewletbûn di heman demê de dewlemend bûne jî. Ev tişta ku ew dibêje ne tiştekî îdeolojîk e,Ehmedê Xanî bingeha teoriya netewperweriyê di pirtûka xwe de nivîsandiye. ‘’

Zilan di dawiya axaftina xwe de li ser bandora Kurdistana serbixwe li ser perçeyên din yên Kurdistanê diyar dike ku Tirkiye xwedîtî û piştgirî li Kibris û Tirkmenan dike, Ereb piştgiriyê didin Filîstîniyan ûev helwestên wan di qada navdewletî de mafdar tên dîtin û wiha pê de diçe “Herêma Kurdistanê jî dê bibe piştgirê Kurdistaniyan. Li Neteweyên Yekbûyî gelek peyman hene li ser vê mijarê. Mîsal li Başûr dewletek heye hûn jî li Bakûr dijîn û hûn dixwazin serdana xizmên xwe bikin,wê demê hûn dikarin tenê bi nasnameya xwe jî serdana wir bikin.”

**“Lijneya me wê bi berpirsên hikûmetê re jî bicive”**

Sıtkı Zilan li ser helwesta Tirkiyeyê jî wiha dibêje: ‘’Mixabin helwesteke Tirkiyeyê ya dewletê heye berê înkarkirina Kurdan bû, hebûna wan ziman û çanda wan bi ti awayî neditîtin û qebûl nedikirin. Ev înkarkirin ne di asta mevzûatê de bû lê bi awayekî fîîlî ev înkar sist kirin. Beşên Kurdolojiyê vekirin, bi navê Kurdistan partiyên siyasî hatin avakirin. Ev ne qenciyeke an minetek e, ev mafê me yê gerdûnî û xwezayî ye lê mixabin Tirkiye van nas nake. Ew lijneya ku min behsa wê kiribû partiyên siyasî, pêkhate û kesayet li Tirkiyeyê dê xebatên lobiyê birêve bibin, bi berpirsên hikûmetê re jî hevdîtinan pêk bînin. Em bi hêvîne ku hevdîtina me ya bi Serokkomarê Tirkiyeyê re pêk bê. Herwiha divê Kurd ji gotinên ku zirarê didin Herêma Kurdistanê dûr bikevin. Divê bi Herêma Kurdistanê re têkiliyên xwe baş bikin. Ev referandûm Herêma Kurdistanê eleqadar dike. Em ê lijneyan ava bikin ji bo ku serdana partiyên siyasî û medyayê bikin. Ji CHPê bigirin heta partiya Saadetê.’”

**“Alema îslamî jî dê sûdeke gelekî mezin jê bibîne”**

Sıtkı Zilan, derbarê guhertinên piştî referandûmê jî wiha diaxive: “Li dewleteke serbixwe bi awayekî azad dê bikaribin bazirganiyê bikin. Herwiha dê artêşa wan pêş bikeve û bêhtir biçek bibe. Mijara referandûmê jî dê destê Hikûmeta Kurdistanê xurt bike bi vî awayî dê rewa be. Dê li Neteweyên Yekbûyî erka çavdêriyê bidest bixe. Ji xwe nîv-dewletbûn, vê yekê Destûra Iraqê jî qebûl dike. Hin kes dibêjin eger ku serxwebûnê îlan nekin ti wateya referandûmê tuneye, bêwate ye, lê ne wiha ye tu bi vî awayî rewa dibî. Di demeke nêz de wê Herêma Kurdistanê bigihêje statuyeke mayînde. Statuya niha jî ji ya berê gelekî çêtir e. Alema îslamî jî dê fedeyeke gelekî mezin jê bibîne.”

# Ji partiyên Kurd komxebata ‘Referandûma Serxwebûnê’



CESİM İLHAN



Şeş partiyên Kurd, ji bo piştgiriya referandûma serxwebûnê ya Herêma Kurdistanê dest bi komxebatekê kirin. Gelek rewşenbîr, sîyasetmedar, akademîsyen û welatî beşdarî komxebata hevpar a ku ji hêla Tevgera Azadî, PAK, KDP-B, PSK, ÖSP, KDP-T ve hat li dar xistin bûn. Di komxebatê de bi erêkirina beşdaran, encamnameyek û lijneyeke ji 13 kesan pêk tê hat avakirin ku xebatan bimeşîne û organize bike. Ev lijne, ji bo referandûmê wê xebatên dîplomasî û lobiyê bike; lijne wê bike ku li ser vê meseleyê tifaqekê di nava Kurdan de ava bike û yên ku li dijî vê meseleyê ne jî qanih bike. Wê bi partiyên sîyasî, saziyên sîvîl ên civakî, çapemenî û bi gel re rasterast têkîliyê deynin. Her wisa kesên ku di komxebatê de cî digirin wê bi Serokwezîr Recep Tayyip Erdoğan, Nûnertiya Tirkiye ya Yekitiya Ewropayê û Balyozxaneya DYAê re daxwaza hevdîtinan bikin. Rewşenbîr û nivîskarên Kurd ên ku di derbarê komxebatê diaxivin di wê baweriyê de ne ku; ‘tevî kêmasî hebûn divê xebatên bo referandûmê berdewam bikin.’

**“Xebata Kurdan a bi hev re erênî ye”**

Nivîskar Fuad Önen ku beşdarî civîna yekem a komxebatê bûbû, xebata bi hev re ya bo biryara referandûma ku wê li Hêrêma Kurdistanê pêk were, tevlîbûna dezgeh û şexsên Kurd ên ji hev cuda erênî dibîne û wiha pê de diçe, “ji komxebatekê zêdetir, atmosfera sohbeteke ku di navbera rêxistinên mazûvan û şexsiyetên serbixwe de hebû. Çi encamname çi komiteya ku hatibû avakirin û çi jî axaftinên beriya civînê yên rêxistinên mazûvan, her tişt wek edetê bû û wek hawê xwe bû. Di hemû şert û mercan de tevgerîna partî û keseyatên Kurd ên ji hev cuda erênî ye.

Bi van fikir û ramanan tevlî komxebatê bûm, bi giştî li ser serxwebûnê û bi taybetî li ser referandûma Başûr axivîm.” Önen dibêje ‘di komxebatê de tunebûna yekitiyeke berfireh î netewî pirsgirêkeke mezin bû’ û wiha didomîne “Ne pêkan e ku meriv bibêje kiryarên Başûr ên di derbarê referandûmê de têrê dikin. Hê li pêşiya me wext gelek e, hemû kes, sazî û rêxistinên Kurdîstanî divê referandûmê wek gaveke ber bi serxwebûnê ve bibînin û li gora wê tevbigerin. Ji bo Başûr piştgiriya herî baş li Bakur birêxistinbûn û xurtbûn e.”

**“Divê HDP jî di vê komxebatê de cî bigire”**

Nivîskar Kadir Amaç jî wiha diaxive, “Em ji mêj ve ji bo biratî, aştî û demokrasiya di nava Kurdan de û ji bo konferanseke Kurd î netewî israr dikin.” Amaç diyar dike ku divê HDP jî di vê komxebatê de cî bigire. Amaçê ku girîngiyê dide komxebata referandûma serxwebûnê ya ku partiyên Kurdistanî lidarxistî, axaftina xwe wiha didomîne, “Divê tu partiyên Kurd, tu sazî û serokên Kurdan li dijî referandûmê helwesteke neyînî nîşan nedin. Ez hewldanên partiyên Kurdistana Bakur yên bo referandûma serxwebûna Kurdistana Başûr bi qîmet û hêja dibînim. Kêmasiyeke pir mezin e ku her du partiyên sereke yên Bakûr PKK û HDP tevlî vê komxebatê nebûne û pêşengiya wê nekirine. Gotinên berdevkê HDP Osman Baydemir ku di civîna partiya xwe ya hefteya çûyî de gotibû, ‘Em wek HDP îradeya gelê Kurdistana Başûr li ser seran û ser çavan qebûl dikin. Bê şert û merc piştgirî didin’ jî bi qîmet û hêja ne. Ez di wê baweriyê de me ku wê HDP û PKK piştgiriyê bidin referandûma ku wê di 25ê Îlonê de bê kirin.”

**“Komxebat nikare piştgiriyê bide referandûmê”**

Nivîskarê Kurd Ersin Tek jî komxebatê rexne dike û wiha diaxive, “Tevgerên Kurdistanî berê jî ji bo pirsgirêkên rojane û netewî daxuyanî û çalakiyên cuda dabûn. Lêbelê mixabin ev hemû tişt ji xeberdan û daxuyaniyan wêdetir naçin û wisa xuya dike ku wê neçe jî. Li vir pirsgirêka sereke ev e ku terzên sîyasî yên van partî û tevgeran şaş in û bê bandor in. Çimkî ji bilî weşandina belavokên klîşe yên bîranîn û pîrozkirinan ku tenê rêvebir beşdar dibin û pê ve tu çalakiyên wan tune ne. Ne rasteqîn e ku meriv bibêje bi komxebatên vî rengî piştgirî bo referandûma serxwebûnê tê dayîn û dîsa ne rasteqîn e ku meriv li hêviya piştgiriya van komxebatan jî bimîne. Çimkî girseyeke wan a ku xwe bigihênînê û vê girseyê qanih bikin yên van partî û saziyên Kurdistanî tune ye.”

## “Komxebat berpirsyariyeke dîrokî ye”

Sekreterê Giştî yê Tevgera Azadî û Mirovan Mehmet Kamaç, “Hemû xebatên ku ji bo referanduma Kurdistanê tên kirin û yên ku wê bên kirin ên partiyên sîyasî û saziyên weke cemeat û tevgeran ên Bakurê Kurdistanê divê bên teqdîrkirin. Meseleya referandûma serxwebûnê ne bi tenê Kurdên Herêma Kurdistanê, hemû Kurdên cîhanê eleqadar dike. Gava ku bandora referandûmê ya li ser îroj û pêşeroja Kurdan li ber çavan bê girtin, hemû xebat û hewldanên di qada netewî û navnetewî de, yên sazî û dezgeyên Kurdistanî ku bi vê hişmendiyê tevdigerin, berspirsyariyeke dîrokî ye.

Xweziya me ew e ku hemû aktorên sîyasî yên Kurd, ji yên mezin bigire heta yên piçûk, bîr û baweriya wan her çi dibe bile be, bila bên cem hev. Dil dixwest ku beriya komxebatê amadekariyek bihata kirin û hemû dînamîkên Kurdistanê tevlî vê xebatê bihatana kirin û ew bikirana yek ji perçeyê vê xebatê. Çi gavên mezin çi yên biçûk hemû xebatên ku ji bo referandûmê bên kirin biqîmet in. Piştgiriya bo vê referandûmê deynê hemû Kurdan e.”

> Di komxebatê de bi erêkirina beşdaran, encamnameyek û lijneyeke ji 13 kesan pêk tê hat avakirin ku xebatan bimeşîne û organize bike. Ev lijne, ji bo referandûmê wê xebatên dîplomasî û lobiyê bike.



# Ala Kurdistanê cara yekem kê çêkiriye?

Ala Kurdistanê ji bo hemû hêz û saziyên Kurd û Kurdistaniyan nîşana yekîtiya wan e. Heke hêz û partiyek Kurd an jî mirovên welatperwer yekîtiyeke rasteqîn bixwazin, pêwist e ku ew di bin siya Ala Kurdistanê de bicivin.

ABUZER BALI HAN

**Nivîsa me ya li ser dîrok û girîngiya Ala Kurdistanê bi beşa duyem berdewam dike.**

Ala Kurdistanê ji destpêkê heta roja îro çawa hatiye vê qonaxê? Çend gotinan dixwazim li ser vê mijarê bêjim. Şêx Mehmud Berzencî dema dibe qralê Kurdistanê li ser Ala Kurdistanê jî hin xebatan pêk tîne û dixwaze Ala Kurdistanê bide amadekirin. Li ser bingeha Ala Kurdistanê ew çawa hate amadekirin û cara yekem kê ew çêkir û ji destê kê hate der, dixwazim lêkolîneke kurt pêşkêşî we bikim. Wezîrê Şêx Mehmud ê Poste Şakîr Mecrum di sala 1951an de, di derheqê "Ala Kurdistanê" de ji Mamoste Dr. Cemal Nebez re diaxive. Di dema Komara Kurd a Mahabadê de, di Ala Kurdistanê de hinek guhartin hatine çêkirin. Zinar Sîlopî di serboriyên xwe de li ser ala Komara Mahabadê wisa dinivise: "Hikumeta Cumhurîyeta Mahabadê Ala Kurdîstanê ya ku di 1919 an de ji aliyê -Teşkîlatî Îctîmaîye Cemîyetî- ve hatibû tesbîtkirin girtin, lê li kêleka roja wê, rismê du simbilên genim û li pişt wê jî çiyayek û dareke çamê lê zêde kirin û bi guloverî jî li ser wê -Dewletî Cumhurîyetî Kurdistan- nivîsîn û ew wek ala Cumhurîyeta Mahabadê qebûl kirin." Komara Mahabadê, dema 31ê Adara 1947an Qazî Muhamed hate dardekirin û şûn de dawî lê hat. Heya komar hate rûxandin ew al bû Ala Kurdistanê. Dema Barzaniyê nemir bi hêzên xwe yên çekdar ve vegeriya Kurdistana Başur, jina Qazî Muhamed ew ala ji Stenbolê ya orîjînal di dest de heyî, ew dabû Barzaniyê gorbehişt. Lê di dema Xoybûn û Serhildana Agirî de ew al îro li Başûrê welat ji bo Dewleta Federal a Kurdistanê bi awayekî fermî hatî pejirandin, ew ala li ser bingeha alaya Ahmed Muxtar Caf çêkiriye. Îro hemû Kurd û dostên Kurdan li wê Ala Kurdistanê xwedî derdikevin. Di muzeya alayên cîhanê yên li Stockholmê bi navê Ala Kurdistanê ew modelê îro Kurd bi kar tînin cihê xwe digire. Min bi xwe jî ew al li Stockholmê dîtiye. Lê tîrojên rojê ne wek tîrojên ala îro ne. Serê tîrojan ne tûj in, ew hinek pan in!..

Ala Kurdistanê ji bo hemû hêz û saziyên Kurd û Kurdistaniyan nîşana yekîtiya wan e. Heke hêz û partiyek Kurd an jî mirovên welatperwer yekîtiyeke rasteqîn bixwazin, pêwist e ku ew di bin siya Ala Kurdistanê de bicivin. Ji bo vê jî ala neteweya Kurd ji Kurd û ji Kurdistaniyan re gelek girîng e! Pêwist e ku her Kurd û Kurdistanî ji alaya Kurd îro re giramî û rêz bigire. Rastî, li her dera dinê rastî ye; nezanîn jî li serê mirovên nezan bela ye!.. Ji nezanînê nebe, ma Kurdek neyartiya ala xwe dike?

Bi vê gotarê û çend gotarên li pêş min derheqê Ala Kurdistanê de hatin nivisîn jî baş didin xûyakirin ku di şiklê Ala Kurdistanê de guhartin çênebûne. Di destpêkê de al çawa ye, îro jî ew al wisa ye. Di gotînên berê de navê alçêkerê Kurd yê yekemîn Ahmed Muxtar Caf derbas nabe.

**Çend mînak û dîtinên dîrokî di derbarê Ala Kurdistanê de:**

Di derbarê Ala Kurdistanê de birêz Mahmûd Lewendî jî lêkolînek kiriye. Ew jî wek li jor al çawa çêbûye û şiklê wê ji kîjan reng û fîguran pêk hatiye, li ser radiweste. Bes di niteya "Ala cara yekem kê çêkirye?" de ne wekhevî heye. Di vê derbarê de Lewendî dibêje, "Mistefa Paşa Yamûlkî yek ji muessisên



"Teşkîlatî Îctîmaîye Cemîyetî" ye ku şiklê ala Kurdî tesbît kirîye û di hukmata Şêx Mehmûd de jî bûye wezîr û berpisiyarê rojnameya nîvresmî ya vê hikumatê "Bangî Kurdistan" ne dûr e ku ala Kurdî ya Şêx Mehmûd ku di 10.10.1922an de hatiye tesbîtkirin jî bi pêşniyaza wî hatibe qebûlkirin. Wek her miletî, Kurd jî xwediyê alekê ne. Ala Kurdan ya ku îro tê bikaranîn sor, spî, kesk e û di navîna wê de jî rojeke zer heye. Ev al di 1920 an de ji aliyê Teşkîlatî Îctîmaîye Cemîyetî ya Kurdan ve hatiye tesbîtkirin."

Di derbarê Ala Kurdan a berê de Lokman Polat jî wiha dinivîse: "Wek tê zanîn Med bapîrên Kurdan in. Medan di dîrokê de împaratoriyeke mezin damezirandine. Wekî her mîletî ew jî di dema xwe de xwediyê ala xwe bûne. Ala wan sembola împaratoriya wan bûye. Ala Medan wiha bû: Li aliyê jor şerîteke sor heye. Di nav vê şerîta sor de taç heye. Tac zer e. Li navê şerîteke spî heye. Di nav vê şerîta spî de wêneyê şêr heye û li pey şêr jî tîrêjên rojê derketine. Roj bi rengê zer e û şêr jî bi rengê gewher e. Li aliyê jêr şerîteke kesk heye. Di nav vê şerîta kesk de ti wêneyek nîn e... Ala Medan ku di dema dîroka qedîm de bikaranîne û ala Kurdan a niha ku wek sembola netewî diparêzin ne wek hev bin jî, rengên wan wek hev in. Kesk û sor û zer di her du alan de jî cih girtine. Di ala Kurdan a niha de taç û şêr jê derketine. Di ala Medan de roj nîv roj e, di ala niha de roj bi temamî heye." û Ala Medan û ala Kurdan ya îro raberî hevûdu dike û nêzîkatiya rengên wan nîşan dide.

Dîsa Karîm Zand ê Silêmanî di derheqê ala Medan û Kurdan de wiha dinivise: "Kurd ji Medan vir ve (B.M. 700) heya roja îro aleke tenê bikar tînin. Li Kurdistanê rengê sor, spî û rengê kesk û li navçê roja ji 21 şuayan (tîrêj) pêk hatî her diparêzin." Ew gotinên xwe yên li ser Medan wisa berdewam dike: "Medan ew ala xwe ji bo siruştê sîmge bikin hilbijartine. Ji bo ku her dem Kurdan ji siruştê hez kirine. Ew rengên ala Kurdan îşaretî wan nixteyan dike. Rengê sor, temsîlê qurbanên ku Kurdan dane, rojhilatina rojê ronahî ye, rengê spî sadetî û aştî ye, rengê kesk jî rengê siruştê ye. Şuayên li dora rojê jî 21ê Adarê, Newrozê sîmge dikin." Karîm Zand zaneyekî Kurdan e ku li ser nexşa Kurdistanê xebitiye. Di sala 1946an de dema Komara Kurd a Mahabadê hat damezirandin wî li wir mamostetî kiriye.

**Weneyê Ala Kurdistanê (1916-1946)**

Di dema şerê cîhanê yê yekemin de ji bilî Kurdistana Rojhilat hemû erda Kurdistanê di nav sînorên Împaratoriya Osmanî de dima. Ronakbîr û siyasetmedarên Kurdan piraniya wan li Stenbolê niştecîh bûn. Danûstandina Kurdan ji her perçeyî wê demê re gelek baş bûye. Ji bo vê sedemê jî welatekî azad di nav wan de dihate guftûgokirin. Di bingeha avakirina Ala Kurdistanê de herçiqas pêşniyaz û kar li ser erda Kurdistanê bûyê jî, komelên siyasî li Stenbolê bûne. Biryarên wan girtî li ser hemû dîtinan muteber bûne. Di salên 1920an û şûn de, dema Komara Iraqê û Suriyê çêbûn û şûn de xwendekar û ronakbîrên Kurdan piraniya wan vegerîne Iraq û Suriyê. Bi wan kesên ku Ala Kurd çêkirinê re mijul dibûn û yên baweriya xwe bi hebûna Ala Kurdistanê heyî ji Stenbolê vegeriyan nav welat û şûn de, Ala Kurdistanê jî di nav tevgera azadiya Kurdistanê de ciyê xwe digire. Di avakirina Dewleta Şêx Mehmud Berzencî û di destpêka saziya Xoybûnê pê de di nav komele, sazî û partiyên Kurd de Ala Kurdistanê dibe nîşana Kurdan.

Mamoste Dr. Cemal Nebez dibêje: "Gava em çûn dîtina wî (Şêx Mahmud), ji me re li ser Noel sala 1956 an wisa got: "Ew mirovekî baş û alîkariya Kurdan dikir!" Dîsa Wezîrê Şêx Mehmud yê Poste Şakîr Mecrum di sala 1951an de di derheqê "Ala Kurdistanê" de bi Mamoste Nebez re axiviye û reng û şiklê ala Kurd a îro wisa şayesandiye (tewsîr kiriye) û wiha berdewamî daye gotinên xwe: "Xor (roj) ji çi hatiye? Ev li dijî heyfê Osmaniyan bû ku ew li cem wan sembolek bû. Kurdan roj bi xwe re mîna sembol bikaranîne." Ji ber ku bîrûbaweriya Ahmed Muxtar Caf wisa bû ku Kurd rêzî tiştek digirin ku bikare bibexşe. Xor, germ e, ronahî dibexşe. Lê heyv jî ew ronahî digire. Ew bi xwe sar û tarî ye!." Şakîr Mecrum digot: "Rengên Ala Kurdistanê ji rengên siruşta Kurdistan hatine girtin. Kurdistan kesk û sor û spî ye!

Mamoste Jemal Nebez dibêje: "Dozê Xor (ro, roj) tiştekî pir kevn e, di mîtolojiya Kurd û Mezopotamyayê de. Di salên 1920an de Reşîd Şewqî, Saleh Zekî Sahîbqiran li Bexdayê kovara "Diyarî Kurdistan" derdixistin. Kekê Reşîd mirovekî niştîmanperwer bû, di xortaniya xwe de ew efserê Osmaniyan bû li navçeya Hewreman. Gelek zanîna kevn û çavkaniyên girîng li cem wî hebûn. Wî ji min re got: Ew Ala Kurdan a heyî ji serdema cenga cîhanê ya yekemîn û vir ve heye." Ew jî rastiya gotinên Şakîr Mecrum teyîd dike...

**Ubeydulah Eyûbîyan (1929 -2013 )**
**"Min di avakirina Komara Mahabadê de ala Kurd bilind kir!.."**

Di rojnameya heftane ya siyasî û çandî "Dema Nû" de li Hewlêrê bi mamoste Prof. Dr. Ubeydulah Eyûbîyan re hevpeyvînek gelek balkêş 21ê Tîrmeha 2005 an de hatibû çêkirin. Dema ew gotar hate bilêv kirin mamoste hîn li dinyayê bû. Ji bo vê jî ew çavkaniya ku di nav me de dijiya wê li ser Ala Kurdistanê herkesî ronahî bike. Ez bawer im ji vê û pê de li ser dîroka Ala Kurdistanê ji bilî neyaran tukes nikare gengeşiyê jî bike!..

Bi çend gotinan ez dixwazim Ubeydulah Eyûbiyan bidim nasandin. Di sala 1928 an de li Rojhilatê Kurdistanê li bajarê Mahabadê hatiye dinyayê. Wî xwendina xwe ya seretayî û navîn ciyê lê hatî dinyayê, ya bilind jî li Zanîngeha Tebrîzê qedandiye.

Ew di 17-18 saliya xwe de beşdarî şoreşa avakirina Komara Kurdistana Mahabadê dibe. Bi gotina xwe dibêje: "Di nav refên şoreşgerên Komara Kurdistana Mahabadê de ala Kurdî min bi destê xwe bilind kir!.."Ew yek ji wan kesên hîmdarên Komeleya Jêkev (J.K.) ya Rojhilatê Kurdistanê ye.



> "Kurd ji Medan vir ve (B.M. 700) heya roja îro aleke tenê bi kar tînin. Li Kurdistanê rengê sor, spî û rengê kesk û li navçê roja ji 21 şuayan (tîrêj) pêk hatî her diparêzin."

Ev komele di şiyarkirin û serkeftina tevgera rojhilatê Kurdistanê de roleke girîng lîstiye. Wî hevalbendî û hevkariya Serhildana Agirî ku pêşengê wê Îhsan Nurî Paşa bû jî kirye. Ew bi helbestvan û ronakbîrên Kurd ên nemir wek Qedrî Can, Cegerxwîn, Celaded Bedirxan û Osman Sebrî re jî bûye heval. Ew profesorekî Kurd bi dehan berhemên xwe yên zanistî jî tê nasîn. Ew bi emrê xwe yî dirêj îro li Kurdistana azad dijî.

Prof. Dr. Ubeydulah Eyûbiyan bersiva kovarê wiha dide: "Min him avakirin, him jî rûxandina Komara Kurdistana Mahabadê bi çavên xwe dît!.."

Seydayê Eyubiyan, hûn bûne şahidê dîrokeke dûr û dirêj. We avakirin û rûxandina Komara Kurdistana Mahabadê bi çavên xwe dîtiye. Hûn dikarin behsa wê dîrokê ji me re bikin?

Prof. Dr. Eyûbiyan: "Ev tevgera sala 1946 an, yanî Komara Kurdistana Mahabadê, ji aliyê Komeleya J.K. ve hat lidarxistin. Ji perçeyên din jî ji Başûrê Kurdistanê Komeleya Hêwa, ji bakurê Kurdistanê Komeleya Hêvî ji bo hişyarkirina gelê Kurdistanê di nav tevgerekê de bûn. Yanî ev komele her çendî yekser bi hev ve girêdayî nebin jî, pêwendiyên wan yên netewî li gel hev hebûn. Komeleya J.K. di avakirin û di hişyarkirina bizava Kurdên Îranê de çalakiyên baş kirin. Paşê jî Rûs hatin ew çalakiyên wan dan rawestandin, nehiştin ku xebatên netewî (milî) bikin. Paşê jî wê navê xwe guhart, di ciyê wê de Hîzbî Demokratî Îran (PDK-Î) ava bû. Hemû endam û alîkarên wê komeleyê bûn ên ku Komar ava kirin. Ez bi xwe jî endamê wê komeleyê bûm. Min bi xwe di avakirina Komara Kurdistan ya Mahabadê de ala Kurdî bilind kiriye. Ez wê demê hê 17-18 salî bûm. Qazî Mihemed û Mela Mistafa Barzanî li ser banê Îdareya Adliyeyê dipeyivîn. Serokê Komeleya J.K. Husein Fayîk jî li wê derê bû. Ev ala Komarê ya ku min bi destê xwe bilind kir, her ew al bû, ya ku Îhsan Nurî Paşa di Serhildana Araratê de bilind kir; her ew al bû ku Şêx Mehmûd Berzencî jî li Silêmanîyê bilind kir; her ew al bû ku nuha kek Mesud li Başûrê Kurdistanê bilind kiriye. Li her sê ciyan jî her eynî al bû. Lê li ser arma Komara Mahabadê xencer û guliyê zeytûnê hebûn. Paşê ji ser Ala Kurdistanê ew xencer û zeytûn rakirin." dibêje. Prof. Dr. Ubeydulah Eyûbîyan Ji bo Ala Kurdistanê mînakeke dîrokî û zindî ye. Jixwe tu welatparêz û netewperwer li dijî şikl û rengên Ala Kurdistanê nîn in. Di nav pir alan de dema mirov lê dinêre bêhtir ew bala mirovan dikişîne ser xwe. Ala Kurd hem xweşik û hem jî rengîn e, ew bi hebûna netewa Kurd gelek zengîn e! Dijmin li wê dinêrin, dipeqin û dimirin! Kurd û dostên Kurdan jî pê wê şa dibin. Ey Ala Kurd! Tu her bijî, heta hetayê!..

Mamoste Jemal Nebez dibêje: "Dozê Xor (ro, roj) tiştekî pir kevn e, di mîtolojiya Kurd û Mezopotamyayê de. Di salên 1920 an de Reşîd Şewqî, Saleh Zekî Sahîbqiran li Bexdayê kovarî 'Diyarî Kurdistan' derdixistin. Kekê Reşîd mirovekî niştîmanperwer bû. Di serdema xortaniyê de ew efsarê Osmaniyan bû, li navçeya Hewreman. Gelek zanîna kevn û çavkaniyên girîng li cem wî hebûn. Wî ji min re got: "Ew ala Kurdan a heyî ji serdema şerê cîhanê yê yekemîn û vir de heye." Ew jî rastiya gotinên Şakîr Mecrum teyîd dike...

----

Wê bidome...

## Kovara Hawar û Ala Kurdî, 1932

Di dîroka me Kurdan de Kovara Hawar wek dibistaneke nûjen e. Hejmara wê ya yekemîn 15 Gulanê 1932an de hatiye weşandin. 57 hejmar derketin û 15ê Tebaxê sala 1943an dawî lê hatiye. Ew kovar, dîroka Kurdan a sedsala 20an ji aliyê zimanê Kurdî, çand û mejûyê Kurdî ve ronahiyê dixe ser gelek aliyên tarî. Di aliyê civaknasîn û netewî de jî li ser rêçeke nûjên, gavên girîng hatine avêtin. Di aliyê netewbûnê de mînakên gotarên rêzanî ji welatên Rojava hatine girtin û cara yekem di vê kovarê de hatine belavkirin û weşandin. Di gotara ku ji aliyê Celaded Bedirxan ve, di Kovara Hawar hejmara 9an, 30yê Îlonê sala 1932an de hatî nivîsîn de, li ser Ala Kurdistanê agahî dide û wisa dibêje: "Her milet xwediyê alakê ye. Ala nîşana milet û welat e. Tevayiya heyîna miletan di ala wan de civiyaye. Al namûs, rûmet û bextê miletan e. Zaroyên her miletî ji bona bilindî û bi qedrbûna ala xwe, bêperwa xwe didin kuştin. Ala her miletî jê re beha ye... Ala Kurdan ji jor ber bi jêr ve, ser hev sor, spî û kesk e, di nava wê de roj diçirise." Di hejmara 11an de jî kovar bi rengên Ala Kurdistanê hatiye weşandin. Roja di navenda alê de ji 18 niçikan (tîrêj) pêk hatiye. Di destpêkê de ala ku bi destan hatiye çêkirin de hesabê niçikan baş nehatiye hesabkirin. Lê bi teknika îro Ala Kurdistanê wek Celaded Bedirxan nîşan daye. Lê niçikên ala rasteqîn 21 in. Hejmara 21an hem roja 21 ê Adarê Newrozê, hem jî serê sala salnameya Kurdî nîşan dide. Wateya 21ê Adarê ya din jî, di aliyê navnetewî de ew roj, roja têkoşîna gelên cîhanê ya li dijî nijadperestiyê ye...



Di Kovara Hawar, hejmara 5an, 20ê Tîrmehê sala 1932an de bi mexlasê "Herekol Ezîzan" Celadet Bedirxan li ser Ala Kurdistanê helbestek jî nivîsiye. Ji bo şiklê Ala Kurdistanê baştirîn bê dîyarkirin ew helbesta wek bingeha xwe çawa hatiyê nivîsîn li jêr xûyaye.

**Ala Kurdan**
Ala Kurdan di nav rok
Çi bedew û bi heybet
Bi çar reng î, rengên te
Çi delal û çi xweşkok
Xêzek kesk û xêzek sor
Nav sipî û nîvek zer
Keskesor e, bi roj e
Ev li jêr û ew li jor.
Semyana keç û lawan,
Rûmeta jin û mêran,
Neyarên te pir jî bin,
Tu dê bidî bera wan.
Ko çirisî roja te ,
Dê belav bin mij û dû.
Rabe ser xwe ser bilind,
Nêzîk bûye roja te.

Nûvakirin û weşandina duwemîn ya Kowara Hawar di sala 1975 an di rûpelê pêşî û paşî de bi rengîn ala Kurd ciyê xwe digire.

Wê bidome...

# Di berbanga sexwebûnê de temsîleke hevbeş a siyasî pêwîst û lezgin e - I



ZINAR SORAN

Ez dê di vê nîvîsa xwe de, bi kurtayî li ser sê mijaran rawestim: Yek, nîzam û peymanên navdewletî; dudu, rewşa pêvajoya serxwebûn û referandûmê li Herêma Kurdistanê û ya sisiyan jî pêwîstiya temsîl û nûnertiyeke hevbeş ya Bakurê Kurdistanê.

I) Dewletên mezin li pey dabeşkirin û avakirina nîzameke nû de ne

Di cîhana îro de, nîzam û hevpeymaneke navnetewî nemaye. Dewletên emperyalîst û mezin ji bo dabeşkirineke nû û avakirina nîzam û hevpeymaneke navdewletî di nava hewldan, xebat, berberî û şerekî wesayetî yê berfireh de ne.

Di sedsala dawîn de, li Cîhanê du nîzam û hevpeymanên navdewletî hatin avakirin. Bi kurtayî be jî wê feyde tê de hebe ku em li ser wan rawestin, da ku keys û firsendên miletê Kurd yên wê gavê ji dest revandine, careke din raxînin ber çavan û ji wan, dersên pêwîst derxînin.

1- Peymana Sykes-Picot: Nîzam û hevpeymana navdewletî ya pêşî peymana Sykes-Picot e. Di dema Şerê Cîhanê yê Yekem, di 16ê gulana 1916an de, di nav dewleta Îngilîstan û Fransayê de hate îmza kirin. Ev peymana bidizî, di cotmeha 1916an de jî ji alîyê dewleta Rûsyayê ve hate qebûlkirin. Peyman, lihevhatinek li ser dabeşkirina erdên Rojhilata Navîn a di dewleta Osmanî de bû.(1)

Li gor vê peymanê:

1.1 Wê Trabzon, Erzirom, Wan û beşeke Bakurê Kurdistanê ji Rûsyayê re bima.

1.2 Herêma rojhilatê Behra Spî, Edene, Entab, Riha, Mêrdîn, Diyarbekir, Mûsil û peravên Sûryeyê wê ji Fransayê re bima.

1.3 Benderên Hayfa û Akkayî, Bexdad, Basra, û Başûrê Mezopotamyayê ji Îngilîstanê re wê bima.

1.4 Li ser wan navçeyên ku wê ji Îngilîstan û Fransayê re bima, wê dewletên ereban yan jî konfederasyoneke dewletên ereban bihata ava kirin; yan jî di bin desthilatdariya Îngilîstan û Fransayê de wê dewleteke erebî bihata ava kirin.

1.5 Îskenderûn wê biba bendereke serbest.

1.6 Ji ber devereke pîroz bû, wê li Filîstînê birevebiriyeke navneteweyî bihata ava kirin.

Di sala 1917an de, piştî Şoreşa Oktobirê, Rûsyayê xwe ji vê peymanê vekişand. Troçkî kopîyayeke vê peymanê bidizî, di rojnameya Îzvestiyayê de weşand û ji raya cîhanê re eşkere kir. Ev nîzam û peymana navdewletî, di destpêka Şerê Cîhanê yê Duyem de ji holê rabû. Di vê nîzama yekem de, miletê Kurd mafên xwe yên neteweyî bi dest nexist. Tevî ku gelek milet û xelkên din bûn dewlet an jî dewletên emperyalîst li gor nîzama nû ew kirin dewlet, Kurdîstan di encama siyasetên dewletên emperyalîst û kolonyalîst de, di 24ê Tîrmeha 1923an de, bi Peymana Lozanê bi awayekî "resmî" di nav çar dewletên dagirker û kolonyalîst de hate parvekirin.

2- Konferansa Yaltayê: Nîzam û peymana navdewletî ya duyem, Peymana Yaltayê ye ku di sala 1945an de hate îmze kirin. Konferansa Yaltayê, di dema şerê Cîhanê yê Duyem de, di navbeyna 4ê Sibata 1945 û 11ê Sibata 1945an de, li Qesra Livadiayê ya nêzîkî Yaltayê ku cihekî semester û behnvedanê ya Sovyetê bû hate civandin. Di Konferansa Yaltayê de, serekwezîrê Îngilîstanê Churchill, serokê Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê Roosevelt û Sekreterê Giştî yê Komînîst Partiya Sovyetê Stalîn beşdar bûbûn. Di Konferansa Yaltayê de, li ser eksena nîzama nû ya Ewropayê û ji nû ve parvekirina erdên Ewropayê hatibû rawestandin. Mafê vetoyê yê di Yekitiya Netewan (YN) de jî, di vê konferansê de hate qebûl kirin.

**Deklerasyona Yekitiya Neteweyan û "hiquqa navnetewî"**

Di 14ê kanûna 1960î de, Yekitiya Netewan biryarek li ser mafê serxwebûna welatên ku di bin nîrê îdareya kolonî de ne derxist û di vî warî de beyan û deklerasyonek belav kir.

Li gor vê deklerasyonê:

1. Serdestî û kedxwarîya biyanî ya li ser miletan, înkara mafên bingehîn e. Ev li dijî Şertên Yekitiya Neteweyan e û ji bo hevkarî û aştiya cîhanê jî asteng e.

2. Mafê hemû miletan heye ku qedera xwe bi destê xwe tayin bikin; li gor wî mafî, bi awayekî azad statuya xwe ya siyasî destnîşan dikin û bi awayekî azad pêşketina aborî, civakî û çandî dişopînin.

3. Têrnekirina aborî, civakî ya jî perwerdeyî, bi tu awayî nabe sedema derengxistina serxwebûnê.

4. Ji bo miletên bindest bikaribin mafên xwe yên serxwebûnê bi awayekî azad û bi aştî bikar bînin; wê hemû tundrewî, tevgerên çekdarî û hemû awayên sîtemkariya li dijî wan, bi dawî bên û wê rêz li yekparetiya welatên netewî bê girtin.

5. Welatên bindest û ne desthilatdar ya jî hemû welatên ku serxwebûna xwe bi dest nexistine, ji bo ku bikaribin mafên xwe yên serxwebûneke rastî û azadiyê bikar bînin, li gor daxwaz û îradeya wan a azad, bêyî ku di warê adet, bawerî ya jî rengê wan de cihêtîyekê bixe

> Di heman demê de, li wan welat û navçeyan xebat û têkoşîna tevgerên rizgarîxwaz û civakî jî berdewam dikin. Heta van welatên kolonî û bindest ku di nav wan de Kurdîstan jî heye rizgar nebe berberî, plan û şerên cihêrengî jî wê ji nû ve geş bibin.

nav wan, hemû desthilatdarî bê qeyd û şert radestî gelên wan welatan bibin, wê tevdîrên lezgîn bêne girtin.

6. Hewldaneke ku yekitiya neteweyî û nisbî jî be, heke xerakirina yekparetiya welatekî armanc bigire; li dijî prensîb û armancên Şertên Yekitiyiya Netewan e.

7. Hemû dewlet, wê Mercên Yekitiya Netewan, Danezîna Mafên Mirovî yên Gerdûnî û biryarên vê danezînê, wekheviya hemû dewletan, destlênewerdana karên navxweyî, mafên hikumraniya gelan û rêzgirtina yekparetiya welatan re, bi sedaqet û herfbiherf bipejirînin. (2)

Ev beyan û deklerasyon weke "hiqûqa navnetewî" jî tê qebûl kirin. Lê di rastîyê de, ew biryar û "hiquqa navnetewî" ji bo Kurdistanê û gelek welatên din yên kolonî û bindest nehate tatbîq kirin. Îro jî, eger em defaktoya Başûrê Kurdistanê bidin alîyekî, Kurdîstan û gelek welatên din di bin nîrê kolonyalîzm û bindestiyê de; li ser axa bav û bapîrên xwe, bê dewlet û statûyeke resmî jiyana xwe didomînin.

Mixabin di nîzama duyem a navdewletî de jî miletê Kurd mafê "qedera xwe bi destê xwe tayin bike" bi dest nexist û weke miletekî bindest, perçebûyî û bêyî statuyeke siyasî jiyana xwe di bin zilm, zordarî û hovîtiya dewletên kolonyalîst de domand.

Nîzama duyem ya cîhanê jî di sala 1991an de, bi hilweşandina Sowyetê dawî lê hat û niha dewletên mezin ji bo dabeşkirin, dîzayn û nîzameke nû di nav hewldan, xebat, plan û şerên cihêreng de ne.

Tevî gelek guherînên li dinyayê, hilweşandina "sîstema sosyalîst" û damezrandina gelek dewletên serbixwe, hinek welat hê jî di bin nîre dagirkerî û bindestiyê de dijîn. Di dema Şerê Yekem û Duyem yên Cîhanê de, dewletên emperyalîst û kolonyalîst li ser dabeşkirina hinek welat û herêman bi awayekî "misoger" li hev nekirin û hinek dewletên biçûk û an jî dewletên bi xwe ve girêdayî




ava kirin. Gelek sînorên xwezayî û dîrokî bi cetwel û rastkêşan ji nû ve hatin tespît kirin. Li dijî îradeya xelkên wan deran nexşeyên nû hatin neqşkirin. Gelek dewlet û navçeyên ku dewletên emperyalîst û mezin li ser dabeşkirina wan bi awayekî "misogerî" li hev nekirine, îro qada şerên ji nû ve dîzaynkirina nexşeyan in û li benda parvekirineke nû ne.

Di heman demê de, li wan welat û navçeyan xebat û têkoşîna tevgerên rizgarîxwaz û civakî jî berdewam dikin. Heta van welatên kolonî û bindest ku di nav wan de Kurdîstan jî heye rizgar nebe, ew neheqiyên dîrokî neyên sererastkirin, wê li van deran şer û pevçûnên di nav van xelkên bindest û dewletên kolonyalîst û hevalbendên wan de berdewam bikin û herwiha wê berberî, plan û şerên cihêrengî di nav dewletên mezin û kolonyalîstan bi xwe de jî ji nû ve geş bibin.

Lê divê em ji bîr nekin ku gava berjewendiyên dewletên emperyalîst, kolonyalîst û paşverû li hemberî xebat û têkoşîna miletên bindest têkeve tengasî û metirsîyê, wê gavê tevî nakokiyên di nav wan de jî, ew dewlet wê bi hêsanî bikaribin dîsa têkevin nav tifaq û peymanên "pîroz"!

Qadeke navendî ku ev berberî, plan û şerên wesayetî yên cihêreng bi awayekî dijwar lê tê domandin jî bê guman Rojhilata Navîn û Kurdistan e. Ger tevgera rizgarîxwaziya neteweyî ya Kurdistanê li gor vê rewşa nû tevnegere, hevahengiyeke neteweyî pêkneyîne û di gelek waran de xwe ji bo vê rewşa nû amade neke û heta radeyekê be jî mafên xwe yên neteweyî û însanî bi dest nexîne; tirseke mezin heye ku em dîsa "100" salî li benda nîzameke nû ya cîhanê; keys û firsendeke nû bimînin!

Têbinî:

(1) https://sv.wikipedia.org/wiki/Sykes-Picot-avtalet

(2) http://www.uhdigm.adalet.gov.tr/sozlesmeler/coktaraflisoz/bm/bm_38.pdf

## Sedemê Kuştina Şeref Xanî

MURAD CIWAN



'Ferman e, ferman e, fermana mîrên kurdan e!'

M. Dehqan û V. Genc ên ku bi xurdekarîyeka rêkûpêk li ser tarîx û awayê mirina (kuştina) Şeref Xanî rawestiyane, li ser sedemên kuştina wî, belge neanîne, bi esehî nizanin ku Şeref Xan çima hatiye kuştin.

Lê balkêş e, li ser sedemê kuştina wî, gelek texmîn û spekulasyon anîne pêş ku dikare rê li ber xwendevanan wenda bike û bibe sedemê hin qenaet û tohmetên şaş yên tarîxî.

Li gel hin teoriyan, hê rasttir spekulasyonan, ew zêdetir girîngiyê didin ku Şeref Xan muhtemelen bûbû dilsozê safewiyan û hevkarê, heta serokê Celaliyên Anadoluyê yên ku wê demê li gelek deran serî hildabûn. Lêkoler, Ahmed Paşa jî wek dijminê Celaliyan nîşan didin. Ev spekulasyona wan, digihê wê dereceyê ku bêyî tu îşaret hebin, ew Xelef Begê birayê Şeref Xan, ji bo kuştina birayê xwe bi hevkariya li gel osmaniyan gumanbar dikin.

Bi a wan, yek ji delîlên hevkariya Şeref Xan a li gel Celaliyan dikare ew be ku du nusxe destxetên Şerefnameya wî li ba Husên Canpolatê mîrê Kilîsê hebûne. Ew, Husên Paşa dikin hevkarê Qereyaziciyê Celalî û Şerefnameyê dikin delîlê hevkariya bi Celaliyan re.

A rast, Husên Paşayê ku bi Qereyazicî re hevkarî kiriye ne Husên Canpolat, lê Husên Paşayê beglerbegiyê Qeremanê ye, Qereyazicî li Urfayê ji bo xwe xelas bike, vî Husên Paşayî teslîmê osmaniyan dike, ew wî dibin li Stenbolê bi awayekî sosret îdam dikin.

Rastiya din, Mîr Husên Canpolat ,wekî mîrên din ên kurd tevî eskerên xwe berê hatibû alî Serhedê ji bo sefera Osmaniyan a ser Îranê. Wî cara pêşîn Caxala Sînan Paşa jî di sefereka wiha de naskir, ew bûn dost û di paşerojê de qedera wan di buyerên balkêş de giha hev, ta ku Sînan Paşa bû qatilê Husên Canpolat. Şeref Xan jî tevî van seferan dibû. Mîrên kurdan li wê derê digihîştin hev, hevdu baştir nasdikirin. Nasîna Şeref Xan û Husên Paşa ew qas nêzîktir e.

'Celalî' ne têgehek e ku navê tevgerên pêkvebestî yên bi armancên mişterek û di bin hiyerarşiyekê de ava bûbin. Li ba osmaniyan 'celalî' bi maneya 'îsyankar', ji tevgerên gelek cuda, yên dewrên cuda, herêmên cuda, armancên cuda re dihat gotin. Husên Canpolat bi xwe serî hilnedaye, heta ew bi fermana paytextê li hember celaliyan derketiye seferê jî. Yê serî hildaye piştî kuştina Husên Canpolat Paşa li Wanê, biraziyê wî û wekîlê wî yê mîrekiya Kilîsê û mîrêmîranê Helebê Alî Beg e. Lêkolerên biyanî vê serîhildanê wek ya Celaliyan qebûl nakin. Ew serîhildaneka mîrê kurdan e ku heta armancên cudabûna ji dewleta osmanî, avakirina dewleteka serbixwe çuye.

Wek di nivîsa destpêka vê zincîreyê de diyarkirî, ne mîrê kurdan bûne celalî an serokên celaliyan, ne jî serîhildanên wan di nav axa mîrekiyên kurdan de rû dane. Esas, celalî û mîrên kurdan ne lihev bûn. Heta Şah Abbas, xweş pêşwazî li wan 13 hezar celaliyên ku di dewra Kuyucu Murat Paşa de têk çûn, reviyan û pena birin Îranê kir û dawiyê ew şandin Kurdistana nav Îranê da li hemberî kurdan şer bikin.

Ahmed Paşa ne merivê xas ê Padîşah, siyasetmeşînê paytextê û dijminê Celaliyan bû, bi eks, ew hem li Wanê, hem jî pişt re li Sêwasê bi yekîneyên xwe yên eskerî (mîrîmîran birlikleri) diçû talanên xelkên nav eyaletên ku ew lê bû, yan jî merivên xwe yên eşqiya bi behaneya bac û xeracê dişandin ser wan, xelk dikuştin, zindan dikirin, dişelandin.

Êrîş, kuştin û talanên ser mîrê Bedlîsê îhtîmaleka mezin ne dewama siyaseta Sultan bû. Gava Ahmed Paşa tê naskirin, fehm dibe ku Xelef Xan çima siyaseta dostaniyê li gel sultan û ya neyartiyê li gel Ahmed Paşa meşand, zilma wî, ezabekî miweqet ê ser Bedlîsiyan dît, nameyeka hawar û gilîyan verêkir paytext, xwest Sultan xelkê Bedlîsê ji zilma wî xelas bike.

Nevê wî, Alacaatlu Ahmed Paşa ye. Bi taybetî di dema begêbegantiya Sêwasê de li derûdora Gerger-Adiyamanê û Arapgîra Meletiyê (ku ev der jî li ser Sêwasê bûn) kuştin, girtin û talanên nedîtî kirine. Di vê bareyê de gilînameyên Taret Efendîyê qadiyê Arapgîrê ku ji Sultan re şandine naskirî ne. Wî ji padîşah dixwest da ew xelkê ji bin zilma Alacaatlu rizgar bike. Ahmed Paşa li Sêwasê hevkarî jî bi Qereyazicî re kiriye.

Îskender Begê Munşî di Alemarayê Abbasî de, karên xerab ên Ahmed Paşa yên dema Wanê tîne ser zimên, dinivîse ku wî eşqiyayên xwe şandine pêşiya karwanekî bazirganên Şah Abbas, ew kuştine û talan kirine. Ji xwe gilînameya Xelef Xan a ji bo Sultan bi gelek awayî zilm û talangeriya Alacaatlu radixe ber çavan.

Nameya Xelef Xan û fermanên Sultan ên tehqîqatê, şandina nunerekî xwe yê pilebilind, wê qenaetê xurttir dikin ku kuştina Şeref Xan ji fermana paytaxtê, bi taybetî ji ya Sultan bêtir, bi eşqiyatiya Alacaatlu encam daye. Ev, nayê wê maneyê ku li Anadoluyê û li paytextê hevkarên wî tunebûn. Paşayên wiha serîhilder wê demê ne kêm bûn. Mustafa paşayê xelefê Alacaatlu jî hin îşaretên ber bi vir de dane.

Kuştina Şeref Xan yek ji wan buyerên gelek dijwar ên nîşana hevrikiyên navbera paşayên osmanî ên ji paytextê tayînkirî û mîrên Kurdistanê ên xwedan mîrekiyên irsî ye.

Rûdan nehatiye zelalkirin, gelek aliyên wê yên tarî hene. Lazim e xebateka cidî di arşîvên osmanî de bê kirin û buyer bê zelalkirin. Di arşîvan de, li ser buyerê gelek belgeyên ronahînedîtî hene.

# Lêkolîn û Guman



AHMED KANI*

Bi sed salan e lêkolîner û zanyarên Kurdan hewl didin ku wêjeya Kurdî jî wek wêjeya Faris, Ereb û Tirkan ên cîranê xwe, bibe wêjeyeke ku li bazarê pere bike. Ehmedê Xanî ji vê rewşê gazindan dike û wiha dinivîse, sê sed û bîst û du sal berê:"Çibkim ku qewî kesad e bazar/Nîn in ji qumaşî ra xerîdar" (Xanî. 2010:141) Mebesta min bi vê destpêkê ew e ku ez balê bikişînim ser xebat û lêkolînên giranbiha yên wêjeya Kurdî. Lê mixabin ku her dem pêşî lê hatiye girtin. Wek mînak îro jî bi milyonan Kurd li ser axa welatê xwe ji mafê perwedeya bi zimanê xwe hatine mehrûm kirin. Bi tevî vê pêşîlêgirtinê jî lêkolîner û zanyarên Kurdan her dema ku derfet dîtine bi awayekî xwebexşiyane xizmeta ziman û wêjeya Kurdî kirine. Ez ê di vê nivîsa xwe de pirtûka Îbrahim Seydo Aydoğan ya bi navê "GUMAN 2 Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî" binirxînim.

Berî ku ez dest bi nirxandina pirtûkê bikim dixwazim balê bikişînim ser pêşkêşa Îbrahim Seydo Aydoğan ya bi navê "Romana Kurdî û Rexne û Ziman" ku di 23ê Adara 2013an da, li Kulûba Xwendinê ya Diyarbekirê kiribû û di hejmara sêyem a kovara Wêje û Rexneyê da hatibû weşandin. Ev pêşkêş jî dikare wek kurteya pirtûka Guman 1 û 2yê bê nirxandin.

Pirtûka GUMAN 2 Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî ji lêkolînên nivîskarên ku li ser wêjeya Kurdî û romana Kurdî hatine kirin pêk tê. Di nava Weşanên Rûpelê de, di sala 2014an da derketiye. Di pêşgotina pirtûkê de li ser girîngiya rexneya zanistî bi palpiştiya gelek pisporên romanê, hatiye sekinîn. (Aydogan. 2014:11) Her kesek li gorî xwe cureyên rexneya edebî diyar dike. Wek mînak di pêşgotina Guman 2 de hatiye nivîsîn ku akademîsyenê Fransî, pisporê romanê, rexne li ser sê beşan dabeş kiriye: Yek danasîna pirtûkên wêjeyî di kovar û rojnameyan da, du rexne û nivîsên nivîskaran ên li ser berhemên hev, a sêyemîn ku wek bîra wêjeyê jî bi nav kiriye, rexne an lêkolînên zanistî ne. Di dawiya pêşgotinê de nivîskar balê dikişîne ser rexnegiriya Kurdî û bi awayekî ku gelek kes ji bo wî dibêjin, gotinê tîne ser quretiya rexnegir û bi xwe dibêje ku em çiqas nefspiçûk bin jî rexne bi xwe dê fortan li nivîskaran û berhemên wan bike. (Aydoğan. 2014: 21)

Nivîskar gotarên xwe yên ku di demên cuda de nivîsine li ser du beşan dabeş dike: Beşa yekê bi navê wêjeya Kurdî ye ku tê de heft gotar: 1-Wêjeya Kurdî û Bîr, 2-Roman û Vegotin, 3-Ziman û wêje di ber çapemeniya Kurdî re, 4-Pexşan û roman di wêjeya Kurdî de, 5- Celadet Bedirxan, çavkaniyên hawarê û Kurdaniya bîrewer, 6-Di metbexa ziman û wêjeya Kurdî de jina Kurd, 7-Di wêjeya Kurdî de lehengên jin di romanên mêran de, cih digirin. Bi min her du gotarên dawîn ên bi navê "Di metbexa ziman û wêjeya Kurdî de jina Kurd" û "Di wêjeya Kurdî de lehengên jin di romanên mêran de" girîng in. Di naveroka pirtûkê de jî ev du gotar ji aliyê nivîskar ve hatine binxêzkirin. Wek me berê jî nivîsî ji xwe mafê perwerdeya bi zimanê xwe yê Kurdan hatiye bin pê kirin. Mafê jina Kurd ê perwedeyê tev bi riya te'asuba dînî, ji aliyê civata Kurd ve jî kêmtir bûye. Lewma mirov dikare bibêje ku ev du gotar di vê mijarê da çavkaniyên giranbiha ne.

Beşa duyem bêtir ji gotarên rexneya romanên Kurdî pêk tên. Gotara pêşîn sernivîs bi navê "Romanên Mehmed Uzun" e. Jêrnivîs jî bi navê "Avakirina lehengan û tevna vegotinê" ye. Nivîskar bi nîşeyan diyar kiriye ku ev nivîs di gelek kovarên Başûr (Nûbûn) û Bakurê (Çirûsk) Kurdistanê de, di demên cuda de hatiye rewîzekirin û weşandin. Wek tê zanîn dema ku Mehmed Uzun dijiyî rexne hîn tûndtir in ji rewîzeya piştî mirina wî. Ev nivîs jî bi yanzdeh fotografan hatiye dabeşkirin ku du jê jî wek destpêk û encama nivîsê li Mehmed Uzun e. Gotara duyem a beşa duyem bi sernavê "Stockholm Dibêje Bê Çi Dîtiye", romana Bavê Nazê ya bi navê Stockholmê te çi dîtiye bêje, ye. Gotara sêyem jî li ser romana Hesenê Metê ya bi navê "Labîrenta Cinan" e. Gotara çaremîn jî bi sernavê "Sorê Gulê û Romaneke Nîvcomayî" ye. Di vê gotarê de romanên Silêman Demîr tên nirxandin. Di gotara pêncan de bi sernivîsa "Fîlozof û Romannivîsiya Lokman Polat" rexneyên tund li romannivîsiya Lokman Polat tên kirin. Di gotara şeşan da jî bi sernivîsa "Sobarto û Romannivîsiya Helîm Yûsif" romannivîsiya Helîm Yûsif tê nirxandin. Di gotara heftan de bi sernavê "Romaneke Marjînal: Jar Lê Sermest û Lokman Ayebe" mijara balkêş a romana Lokman Ayebey tê nirxandin. Gotara heştan bi sernavê "Firat Ceweri Çawa Xwe kuşt?" e. Di vê gotarê de li ser romana Firat Cewerî ya bi navê Ez ê yekî bikujim û romannivîsiya wî tê rawestan. Li derveyî berhemê hinek helwestên Cewerî jî têne nirxandin. Di gotara nehan da bi sernavê "Şevbihêrkên Şevên Xalî ya Enwer Karahan" li ser çîrokên Enwer Karahan tê rawestan. Di gotara dehan da bi sernivîsa "Heyama Nû" û jêrnivîsa "Mexzena Xwînê an jî koleksiyonên binhişîna nifşên nû" li ser helbestên nûjen ên Rênas Jiyan radiweste. Di gotara dawîn a yazdehan de, bi sernavê "Bandor û Entertekstualîte" li ser bandora piraliya nivîskaran li ser hev û têkiliya di navbera tekstan da radiweste. Bi min ev gotar hêjayî pesindayînê ye ku hinek pîvanên rexnegiriyê zelal kiriye.

Wek encam em dikarin bibêjin ku Îbrahim Seydo Aydoğan mamosteyekî hêja yê Ziman û Wêjeya Kurdî ye. Bi weşandina gotarên xwe yên ku di dersên Kurdî de bêjing kiriye, di panel, semîner û konferansên navnetewî de pêşkêş kiriye, wek pirtûk xizmetek giranbiha kiriye.

*Nivîskar



# Rêkeftina Etomî di bin gefa dorpêçên aborî de ye



ESKENDER CEIFERÎ

Havîna 2015an bû ku Îran û girûpa 5+1 karîn di derbarê çalakiyên etomî yên 'Komara Îslamî' de lihev bikin û Rêkeftina Etomî îmzekirin. Çîn, Fransa, Rûsya, Brîtanya, Amerîka û Almanya ew welat bûn ku bi Îranê re lihev hatin. Wê demê Barak Obama Serokê DYA (Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê) bû û ragihandibû ku ew ê beşeke zêde ji dorpêçên aborî li ser Îranê rakin. Lê Îran dibêje ku weke pêwîst, dorpêç nehatine rakirin û hin saziyan, dorpêçên nû jî bi ser berpirsên bilind yên 'Komara Îslamî' de sepandine.

Êdî DYA hem pişta xwe bi zanyariyên ku ji hevparên xwe distîne germ dike û hem jî çalakiyên Îranê yên etomî bi rengekî nerasterast çavdêrî dike. Donald Tramp her 90 rojan carekê, çawaniya bicîkirina sozan ji aliyê 'Komara Îslamî' ve dike raport. Raporta vê carê jî ku di roja dawiyê ya derfeta 90 rojî de hate îmzekirin, radestî Kongreyê hatiye kirin ji bo ku bê nirxandin. Ji niha ve dîsa 'Komara Îslamî', 90 rojan derfet heye da ku careke din nîşan bide ku çalakiyên wê yên etomî, ji bo mijarên aştiyane bûne û xalên rêkeftina han jî nehatine binpêkirin.

Mark Fîtzpattîk berpirsekî Enîstîtûya Navdewletî ya Lêkolînên Stratejîk di wê baweriyê de ye ku diviyabû Donald Tramp, demildest wê raportê îmze bike ji ber ku Ajansa Navdewletî ya Etomê ew raport îmze kiribû. Ew nîşanên baş ji derengxistina îmzeyê nabîne û dibêje ne xuya ye ka gelo wê 90 rojên din çi biqewime. Dibe ku Tramp xwe ji bo biryareke nû di 90 rojên bê de amade bike ku reng û bêhna aramiyê bi xwe re nayîne.

**"Îranê xalên Rêkeftina Etomî binpê kirine"**



'Komara Îslamî', di van du salan de xalên Rêkeftina Etomî binpê kirine û kesên ku ji biryara 90 rojên bê ditirsin, bixwe jî dizanin ku Îranê ew rêkeftin binpê kiriye. Ew teqezê jî dike ku ne xuya ye ka gelo wê DYA çi biryarekê bide, lê pêwîstiya wan bi planeke xurt heye.

Nediyarbûna biryara Tramp, bûye sedem ku hin siyasetvan wan 90 rojan weke heyama çarenivîssaz ji bo pêwendiyên di navbera her du aliyan de binav bikin. Davîd Aberît Berpirsê Enîstîtûya Zanist û Ewlehiya Navnetewî ku di derbarê çalakiyên etomî yên Îranê de gelek raport belav kirine, di wê baweriyê de ye ku 'Komara Îslamî', di van du salan de xalên Rêkeftina Etomî binpê kirine û kesên ku ji biryara 90 rojên bê ditirsin, bixwe jî dizanin ku Îranê ew rêkeftin binpê kiriye. Ew teqezê jî dike ku ne xuya ye ka gelo wê DYA çi biryarekê bide, lê pêwîstiya wan bi planeke xurt heye.

Rojekê piştî ku Serokê DYAyê ew raport îmze kir, her du wezaretên derve û xezanedariya DYAyê ragihandin ku 18 kesayetî û kompanî li ser lîsteya dorpêçên aborî zêde kirine ku li gora wan du wezaretan, çalakiyên wan 18 kes û kompaniyan xalên rêkeftinê binpê kirine û di planên moşekî yên Îranê û Hizbullaya Lubnanê de hatine bikaranîn.

Wan dorpêçên nû, demlidest karvedana berpirsên 'Komara Îslamî' li pey xwe ve anîn û Mihemed Cewad Zerîf Wezîrê Derve, ragihand ku dorpêç ti encamekê li pey xwe ve nayînin lê 'Komara Îslamî', wan dorpêçan qebûl nake. Wî ti zanyariyeke zêdeyir li ser karvedana Îranê li hemberî vê biryarê neda lê Hesen Rûhanî Serokkomarê Îranê da xuyakirin ku ev kiryar, binpêkariyek e ku ji aliyê DYA ve hatiye encamdan û divê bersiva wan bê dayîn lê teqez kir ku Îran xalên rêkeftina han binpê nake.

**"Trump li pey planeke din digere"**

Berpirsên saziya Nehêlana Çekên Etomî jî dibêjin her qasî ku Îranê bi hemû wan welatan re lihev kiriye, lê çavên Ewropiyan li DYAyê ne. Her biryarekê ku Washington distîne, ji wan re dibe bandor. Brîtanya hewl dide DYA razî bike ku wan raportan demlidest îmze bike lê Tramp li pey planeke din digere û Borîs Johnson wezîrê Derve yê Brîtanyayê jî bandorê nake ser wî ku piştgiriyê dide rêkeftinê.

Gotara Wezareta Derve ya DYAyê hemû wan pirsyaran bersiv nade ku çima Amerîka di îmzekirina raportan de dudil e û sedem çi ne. Lê li gor gotinên Serokkomarê Îranê dorpêçên aborî yên nû gefê li rêkeftinê dikin.

### "Rêkeftina etomî ne di berjewendiya DYAyê de ye"

DYA naxwaze wan raportan îmze bike lê bi pejirandina wan, peyameke girîng dide raya giştî ku ew jî amadekirina planeke weke plana B yan jî alternatîva Rêkeftina Etomî ye. Davîd Aberît dide xuyakirin ku mirov nikare bombeyekê bavêje hundirê odê û li cihekî ewle bigire yan jî li bendê be ku rewş baştir bibe. Rast e ku gelek ji berpirsên Amerîkî, li dijî rêkeftinê ne û wê weke parêzvana berjewendiyên dewleta xwe nabînin, lê li pey stratejî û planekê digerin ku di dema nemana rêkeftinê de bicî bikin.

# Tirsa Îranê ji dewletbûna Kurdan

Take dewleta ku bi rengekî eşkere dijminatiya serxwebûna Kurdan dike, Îran e. Mela Bextiyar berpirsiyarê Desteya Kargêriya Polîtburoya Yekîtiya Nîştimanî ya Kurdistanê got ku Îranê referandûm di serdana şandame de ji bo Tehranê red kir lê me weke YNK piştgirî da referandûmê.

Îran ne tenê ji vê ditirse ku dijberên wê weke Îsraîlê bi rengekî cidî piştgiriyê bidin dewletbûna Kurdan, belkî tirsa vê jî heye ku hevpeymanên xwe ji dest bide ji ber ku Wezîrê Karên Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov ragihandiye ku divê Kurd mafên xwe yên rewa, wek yên gelên din di çarçoveya zagona navdewletî de bi kar bînin.

Serokwezîrê Iraqê Heyder Ebadî ku nêzîkî Nûrî Malikî serokwezîrê berê û nêzîkî Komara Îslamî ye, dide xuyakirin ku referandûma serxwebûna Kurdan ne yasayî û ne rewa ye û ew weke hikûmeta Iraqê qet danûstandinê pê re nakin.

Komara Îslamî, her tim teqez kiriye ku ew rê nadin Îsraîleke din li rex wan ava bibe. Mihemed salih Qadirî berpirsiyarê pêwendiyên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê li Hewlêrê dibêje ev du sal in ku Komara Îslamî ji bo çekdarkirina xelkên sivîl, qonaxeke nû daye destpêkirin û hemû hewlên wan li dijî Herêma Kurdistanê ne û di pêvajoya referanduma serxwebûnê de tev digerin.

Di navbera Pêşmergeyên ku li sînorê di navbera Başûr û Rojhilatê Kurdistanê de xwe bi cih kirine û cihên Sipaya Pasdaran de kêmtirî 3 kîlometran hene. Îran ku destûr nade xebateke siyasî bi rê ve biçe û her roj bi hincetên bêbingeh Kurdan dar ve dike, hêzên Pêşmerge tometbar dike ku ji Erebistana Siûdî û Îsraîlê, alîkariyan distînin û ji bo parastina Başûrê Kurdistanê û têkdana rewşa Îranê kar dikin lê ew partiyên Kurdistana Rojhilat





wan tometan red dikin û diyar dikin ku ew bi tenê bi hêza xwe û ji bo miletê xwe tevdigerin. Li ser sînor, carna alozî derdikevin.

**"Goran serxwebûna Kurdistanê weke mafekî pîroz dibîne"**

Tevî ku Tevgera Goran li Başûrê Kurdistanê yek ji wan hêzên siyasî bû ku weke dijberên serxwebûnê dihatin naskirin, lê li bendê ye ku Goran jî dengê erê bide serxwebûnê. Edhem Barzanî serokê Encûmena Serkirdatiya Partiya Demokrata Kurdistanê li Parêzgeha Silêmaniyê û Helebce bi Umer Seyîd Elî organîzatorê nû yê Tevgera Goran re civiya û ragihand ku pêşveçûn hene û organîzatorê nû yê Goranê, serxwebûna Kurdistanê weke mafekî pîroz binav dike.

Komara Îslamî û dewleta Tirkiyê, du hêzên mezin yên navçeyê ne ku dikarin li ser hevkêşeyan jî bi bandor bin. Lê heke Kurd bixwe biryara serxwebûnê bidin, dibe ku gelek ji planên wan jî rastî astengiyan bên. Bi taybetî Îran ku êdî ne dikare bi hêsanî heyva şîe ava bike û ne jî Tirkiye, Îran û Sûriye dikarin hebûna Kurdan di sînorên xwe de red bikin lê li derdorê îtirafê pê bikin.

**"Em dixwazin têkiliyên baş bi cîranan re ava bikin"**

Tevî ku Komara Îslamî, dewletbûna Kurdan weke têkdana rewşa navçeyê binav dike, lê Herêma Kurdistanê dibêje ev mafê me ye û em naxwazin ti cihekî nearam bikin. Hêmin Hewramî Berpirsê Nivîsgeha Pêwendiyên Siyasî yê Serokê Herêma Kurdistanê, destnîşan kir ku referandûm ne ji bo givaşa ser rêveberîya federalî ya Bexdayê ye. Belkî ev pêvajo, ji bo serxwebûna Kurdistanê ye û ew dixwazin piştî referandûmê jî pêwendiyên baş bi cîranên xwe yên weke Tirkiye û Îranê re berdewam bikin.

# Heftiyek mafên mirovan li Rojhilatê Kurdistanê

Piştî ku mehekê çarenivîsa mamosteyekî olî bi navê mele Ebdulkerîm Azerîn li bajarê Pîranşarê nediyar bû, di rojên derbasbûyî de di pêwendiyeke telefûnî de ji malbata xwe re ragihand ku ew li cem saziyeke ewlehî girtî ye. Heya niha sedemên girtina wî û cihê ragirtinê nediyar in.

Daxwaza Rustem Erkiya girtiyê siyasî yê Kurd ji bo veguhestina wî ji girtîgeha Yezdê ji bo girtîgeha Derya hate redkirin. Rustem Erkiya xelkê bajarê Makûyê ye ku beriya neh salan bi tometa endametî di partiyeke Kurdî de li Tehranê ji aliyê çekdarên Sipaya Pasdaran ve hate girtin û piştî sê mehan lêpirsîn û îşkenceyê bi 20 salan girtin û sirgunkirinê hate cezakirin.

Bêhnam Îbrahîmzade çalakvanê Kurd yê xelkê Şinoyê piştî beşdarbûn di rêwresmekê de ku ji bo helbestvanekî li Tehranê bi rê ve diçû, bi du çalakvanên Fars re ji aliyê hêzên ewlehî ve hate girtin. Bêhnam beriya niha bi heft salan di girtîgehê de bû û çend mehan beriya niha serbest hatibû berdan.

Berî mehekê, sê endamên malbata Husênpenahî li Sine bi navên Ehmed, Zubêr û Kêywan hatin berdan û sê kesên din bi navên Ebas, Efşîn û Ramîn Husênpenahî hîn girtî ne. Girtina wan di derbarê pêwendiya wan ligel partiyeke Kurdî de bû.

Sipaya Pasdaran li gundê Dêrikê yê Selmasê pênc gundiyên Kurd bi navên Cewad Badikan, Ferşad Badikan, Ehmed Mamedî, Husên Lacanî û Esed Ebdullazade bi tometên siyasî vexwandin û lêpirsîn bi wan re hate kirin.

Riza Melazade piştî şeş salan di girtîgeha Bûşêhrê de ji mafê serdana malbatê bi danîna kefaletê bêpar e. Riza Melazade şeş salan beriya niha li bajarê Pawe ji aliyê hêzên Sipaya Pasdaran ve hate girtin û piştî salekê bi hepsa hertimî û sirgunkirin ji bo girtîgeha Bûşêhrê hate mehkûmkirin. Tometa wî endamtiya di partiyeke Kurdî de bû.

Li Seqizê heşt welatiyên Kurd bi navên Sulêman Ebdî, seyîd Elî Husênî, Mihemed Abidî, Dilniya Abidî, mele Hesen Mehmûdî, Luqman Qurêyşî, Hesen Selîmî Azad û Xalid Rehîmî ji bo lêpirsînê bi tometên siyasî ji aliyê dadgehê ve hatin gazîkirin.

**6 kes hatin darvekirin**

Li girtîgeha Zencanê girtiyekî xelkê Kûhdeştê bi tometa kirîn û firotina madeyên hişber hate darvekirin.





Mêhdî Sakî bi tometa kirîn û firotina madeyên hişber li girtîgeha Miyandoawê hate darvekirin.

Du birayên Kurd bi navên Fetah Emînî û Xalid Emînî bi tometa kuştina kesekî li girtîgeha Mehabadê hatin darvekirin.

Ferhad Mûsazade û Dawûd Maldar bi tometa kirîn û firotina madeyên hişber li girtîgeha Urmiyê hatin darvekirin.

Di encama teqîna mayîneke serdema şerê di navbera Îran û Iraqê de li navçeya Seqizê du kes birîndar bûn ku navê yek ji wan Emîn Xulamî ye.

Kesekî 55 salî bi navê Elî Taqebargîr li Seqizê ji ber hejariyê, dawî li jiyana xwe anî.

Keçeke 16 salî li Seqizê bi navê Şadî Mikarî ji ber sedemeke nediyar dawî li jiyana xwe anî.

Xortekî Kurd li Urmiyê bi navê Areş Hatemî ji aliyê bavê xwe ve ji ber sedemeke nediyar hate kuştin.

Li Pîranşar û Serdeştê nêzîkî 70 hespên kolberan bi teqeya hêzên sersînor mirin.

Li Xoyê kolberekî Kurd bi navê Emîr Xakidî hate kuştin û sê kes jî birîndar bûn.

Kolberek bi navê Eynulla Sîdarîfer li Urmiyê ji aliyê hêzên Sipaya Pasdaran ve hate birîndarkirin.

Li Serdeştê kolberek bi navê Emîn Ebdullazade ji aliyê çekdarên Îranê ve hate kuştin.

Li girtîgeha Zencanê girtiyekî xelkê Kûhdeştê bi tometa kirîn û firotina madeyên hişber hate darvekirin. Mêhdî Sakî bi tometa kirîn û firotina madeyên hişber li girtîgeha Miyandoawê hate darvekirin.

# Girêka di navbera Îsraîl–Filîstînê de: Mescîdî Aksa



DERYA KILIÇ

Kêşeya di navbera Îsraîl û Filîstînê de kêşeyeke ku ev sed sal e didome ye. Tevî gelek hewldanên çareseriyê jî ev mesele bûye kêşeyeke herêmî û nehatiye çareserkirin. Di van heyamên dawîn de jî aloziyên li herêmê zede bûne û di navenda van alozî û gengeşiyên dawîn de ku kuştî jî çêbûn de Mescîdî Aksa heye.

Li nêzîkî Mescîdî Aksaya li Qudsê di 14ê Tirmehê de êrîş li polîsan hatibû kirin û 2 polîs miribûn yek jî birîndar bûbû. Piştî vê bûyerê Îsraîlê Mescîdî Aksa girt. Di 21ê Tirmehê de destûra yekem nimêja înê hat dayîn û li mescîdê di navbera Filîstîniyan û polîsên Îsraîlê de pevçûn derket. Ji bo yekem nimêja înê li Mescîdî Aksayê polîsan tenê destûr da yên temenê wan di ser 50yan re û beriya têketina mescîdê bi dedektoran lêgerîn hat kirin. Ev yek jî bû sedema pevçûnan. Wezareta Tendûrîstiyê ya Filîstînê ragihand ku ciwanekî 17 salî ji serê xwe gule xwariye û jiyana xwe ji dest daye.

Tirkiye û Fransayê Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî (KENY) bi lez vexwand civînê. Li aliyê din jî Îsraîl û Filîstînê hevûdu sûcdar kirin û daxûyaniyên tund dan.

Wezîrê Îsraîlê yê Hevkariya Herêmî Tzachî Hanegbi di daxûyaniya xwe de wiha axivî, "Ew kesên ji vê yekê aciz dibin bila nekevin mizgeftê." Hanegbi ku yek ji payebilindê partiya Likud e ku li Îsraîlê partiya desthilatdar e, dibêje: "Qatil nikarin ji me re çawaniya lêgerîna qatilan bibêjin. Eger Filîstînî ji vê aciz bin bila nekevin mizgeftê."

Beriya Hanegbi, Binyamin Netenyahu jî ragihandibû ku ew ê ji bo ewlekariyê rêyên baştir û nermtir biceribînin. Li gor biryara kabîneya Ewlekariyê ku heftiya din roja Sêşemê standibû dê tedbîrên nermtir bên girtin.

**"Îsraîl sûdê ji pevçûnên di navbera misilmanan de digire"**

Ji Zanîngeha Yıldırım Beyazıt Akademîsyen Prof. Dr. Mustafa Eravcı di derbarê Mescîdî Aksayê û kêşeya Îsraîl – Filîstînê ji Heftenameya Basê re axivî. Eravcı dibêje: "Qudsa ku em bi navên Beyta Miqeddes ango Bajarê Miqeddes bilêv dikin ji bo Misilman û Îslamê pir girîng e. Xwedî girîngiyeke cuda ye. Bûyerên li Mescîdî Aksayê rû dane vê yekê nîşanî me didin ku Îsraîlê teşşebûsa bi lîstina sembola olî ya civata Îslamê kir. Ji bo têgihiştina sedemên vê yekê divê mirov çaralî li mijarê binêre. Ne tenê di çarçoveya bicihkirina cîhazan an jî qedexekirina xwendina bangê li Mescîdî Aksayê rûdanan binirxîne, divê mirov bi fikir li nêzîkî mijarê bibe."

Serokê Filîstînê Mahmûd Abbas jî piştî bûyerê ragihand ku heta tedbîrên ewlekariyê li Mescîdî Aksayê bi tevahî ranebin ew ê danûstandinên fermî ligel Îsraîlê nekin. Abbas ragihand: "Armanca van tedbîrên ewlekariyê bidestxistina Mizgefta El Aksayê ye."

**"Îsraîl di qada navdewletî de xebatên xurt ên dîasporayê dike"**

Eravcı, di berdewamiya axaftina xwe de dibêje, "Îsraîl dixwaze ji qeyrana Sûriyeyê û rûdanên din ên li Rojhilata Navîn û civata Îslamê ku di nava xwe de pirsgirêkan û şikestinan dijî fêde bibîne û dibîne jî." Eravcı wiha pê de diçe: "Civata Îslamî ji ber van sedeman jiyaneke kaotîk dijî û bi van kêşeyan ve mijûl dimîne, Îsraîl jî dixwaze van rûdanan minîmîze bike, bixe bin kontrola xwe û bikişîne qada navdewletî. Lê vê stratejiyê ne girt. Bû sedem ku li civata Îslamî rejimên totalîter derkevin holê. KENY û saziyên navnetewî li hember kiryarên Îsraîlê li Filîstîn û Sûriyeyê dê bêdeng bimînin. Ji ber ku Îsraîl di qada navnetewî de xebatên xurt ên dîasporayê dike. Di fînansmaniya cîhanê de xwedî roleke mezin e. Em bêdengiya li civîna dawî ya KENYê û dewletên Rojava di vê mijara dawî de dibînin. Kêşeya Îsraîl – Filîstînê ne kêşeyeke ku îro an jî sibê dê bê çareserekirin e. Xwedî gelek aktoran e. Dîrokî û kûr e. Ne hêsan e ku ev kêşe wisa bi hêsanî bê çareserkirin. Polîtîkayên Îsraîlê di qada navnetewî de ku Filîstînê nas nake, bi dewletê terorîzmê dike, înkara rastiya Filîstînê vê kêşeyê ji çareseriyê dûr dike. Bi taybetî jî Misir û Erebistana Sîûdî ku aktorên sereke yên vê herêmê ne, li hember vê yekê bêdeng man. Di krîza Qatarê de gelek bi dil û can bûn. Nêrîna mijara Beytûl Miqeddesê weke mijareke derve û bêdengiya wan ji aliyê raya giştî a van welatan ve tê rexnekirin."



Binyamin Netenyahu ragihandibû ku ew ê ji bo ewlekariyê rêyên baştir û nermtir biceribînin. Li gor biryara kabîneya Ewlekariyê ku heftiya din roja Sêşemê standibû dê tedbîrên nermtir bên girtin.

Welatê Slavan

# Rêwîtiya referandûm û serxwebûnê ya Slovenyayê

SARA PÎRANIJ

Di qedera Komara Federal a Sosyalîst a Yugoslavyayê de ku piştî herba duyemîn a cîhanê hat damezirandin de, cihê Josîp Broz Tîto yê Hirvat pir girîng e ku serokê Yugoslavyayê bû. Di sala 1980an de mirina Tîto, rê li pêşiya perçebûn û dabeşbûna Yugoslavyayê vekir. Têkçûna Bloka Rojhilatê jî ev dabeşbûn û perçebûn bilez kir. Beriya 37 salan Yugoslavyaya ku belavbûna wê dest pê kir ji Sirbistan, Montenegro, Bosna-Hersek, Hirvatistan, Slovenya û Makedonyayê pêk dihat. Kosowa û Voyvodîna jî herêmên xweser bûn. Îlankirina serxwebûnê ji aliyê Slovenya û Hirvatistanê ve di 25ê Hezîrana 1991an de ji bo Yugoslavyayê dabeşbûneke bixwîn da dest pê kirin. Serxwebûna van her du welatan bû mîlada perçebûn û belavbûna Yugoslavyayê.



Yekem welatê ku ji Yugoslavyaya Sosyalîst veqetiya Komara Slovenya bû. Tevgera demokrasî û serxwebûnê di 7ê Adara 1990î de bi serket. Bi dengdayîna li parlementoya Slovenyayê navê welêt bi Komara Slovenyayê hat guhertin.

**Dîrok û rabordiya siyasî ya Slovenyayê**

Dîroka Slovenyayê li axa ku îro lê ava bûye, digihîje Serdema Navîn. Di salên 550î de ji herêma Moravyayê ku îro dikeve sînorê Çekyayê, hatine Slovenyayê û Mîrîtiya Karatanyayê ava kirine. Di sala 745an de ev Mîrîtî ket bin kontrola Împaratoriya Karolenjê ku ew jî di bin hikmê Almanan da bû. Di sala 843an de ev Împaratorî belav bû û Mîrîtî ji neviyê Şarlmanê Karatanyayê Alman Ludwig re ma.

Hişmendiya netewî ya Slovenan di dema êrîşên Macaran de -ku ji ber herêma ku li ser dikarîn xwe biparêzin û van êrîşan tesîreke zêde lê nekir- pêş ket. Piştî 975an axa Slovenyayê ket bin kontrola Mîrîtiyên Karintiya, Karniola, Stiriye ku girêdayî Împaratoriya Roma Germen a Pîroz bûn. Slovenya di sedsala 13. de ket bin kontrola Hanedaniya Habsburgê ku Qraltiya Împaratoriya Roma Germen a Pîroz dikir.

Di sedsala 15.de Slovenya ji ber êrîşên Osmanî û serhildanên gundiyan di warê aborî û nifûsê de heyamake dijwar derbas kir. Protestanî ku di sedsala 16.de li Ewropa rû dabû, tesîr li Slovenyayê jî kir. Pirtûkên di derheqê Protestaniyê de bi Slovenî jî hatin çapkirin. Lê tevger di sedsala 17.de ji aliyê Habsburgan ve hat rawestandin; û di vê demê de reformên hatin kirin li ber serhildanên gundiyan jî bûn bend. Di sala 1765an de bi derxistin û bicihkirina reforman li Slovenyayê burjuva derket holê, reforma dêrê û neçarkirina perwerdehiya bi Slovenî rê vekir ku rihê netewî vejê. Di navbera salên 1809–1813an, dema Şerên Napolyon de paytext Ljubljana jî di nav de, beşek ji Slovenyayê, bo demeke kin weke 'herêma xweser' ket bin serweriya Fransayê. Piştî serweriya Fransayê, Slovenya vê carê jî ket bin serweriya Împaratoriya Awusturyayê ku piştî belavbûna Împaratoriya Roma Germen a Pîroz derketibû holê.

Netewperweriya ku li seranserê Ewropayê rû dabû, di sala 1840an de tesîrê li welatên ku di bin serweriya Împaratoriya Awusturya de ne jî kiribû. Slovenan jî ji tevgera neteweperweriyê tesîr girt û bernameyeke bi navê 'Slovenyaya Yekbûyî' weşandin. Lêbelê ev bernameya ku dixwest hemû derên bi Slovenî diaxivin di bin serweriya Qraliyeta Slovenyayê de bigihîne hev jî bi ser neket. Lê di geşedanên siyasî de tesîreke erênî li gelê Slovenyayê kiriye.

**Avakirina Qraliyeta Slovenya, Sirp û Hirvatan**

Di destpêka Şerê Cîhanê yê Yekemîn de Slovenan biryara cudabûnê ji Împaratoriya Awusturya-Macaristanê dan. Piştî şer di 1ê Berfenbara 1918an de ku bi navê Qraliyeta Yugoslavyayê tê zanîn ji aliyê Sloven, Sirp û Hirvatan ve hat avakirin.

**Wêrankariya Şerê Cîhanê yê Duyemîn û Yugoslavya**

Yugoslavya di destpêka Şerê Cîhanê yê Duyemîn di sala 1941an de ji aliyê Almanyaya Nazî ve hat dagirkirin û di demeke kin de teslîm bû. Vê radestbûnê dabeşbûn jî bi xwe re anî. Yugoslavya di navbera Alman, Îtalyan û Macaran de hat parve kirin. Piraniya Slovenya û tevahiya Banatê ket bin serweriya Almanyayê. Îtalya, Dalmaçya û hinek axa ku berê jî doza wê dikir xist bin serweriya xwe. Almanan, Sloven birin Saksonyayê ku çendîn kampên şer li wir hatibûn ava kirin. Di navbera salên 1941–1945an de ji aliyê Almanyayê ve di fabrîka û çewlîgên karsazên Almanan de hatin xebitandin. Di dema Şerê Cîhanê yê Duyemîn de nêzîkî %8ê Slovenan mirin. Qralê dawî yê Yugoslavyayê Peterê II. reviya, xwe spart Brîtanyayê.

**Belavbûna Yugoslavya û ragihandina serxwebûna Slovenyayê**

Yugoslavya di destpêka avakirinê de bû navenda şerên netewî. Bi rastî jî di tu deman de di nav netewên ku Yugoslavyayê damezirandine de pevçûn ranewastiyan. Ciyawaziya di navbera netewan de, tedbîrên tund ên hikûmeta navendî û ceribandina normên sosyalîst ên tund, Yugoslavya ber bi şer ve bir. Li Slovenya, Makedonya, Hirvatistan û Bosna–Hersekê daxwazên serxwebûnê derketin holê. Bi taybetî jî şerê di navbera Sirbistan-Hirvatistan û Slovenyayê de, di dawiya sala 1989an de li Rojhilatê Ewropayê bû sedema guherînên tund bo rejîman. Di dawiya salên 1980î de bi pêşengiya Sirbistana ku serokatiya wê Slobodon Miloseviç dikir, li komarên din jî netewperwerî bihêz bû. Di wê demê de li Yugoslavyayê hêzên ku daxwaza cudabûnê dikirin ( Slovenya – Hirvatistan), Îrredantist a Sirban avakirina "Sirbistana Mezin", (Daxwaza Arnavûtên Kosovayî li gel Arnavûtên Makedonî yekbûyîna bi Arlbaniyayê re) Yekbûyîna netew û olên cuda (Boşnak) di nav hev de rû didan.

Destpêka salên 90î bi qrîz û daxwaza veqetandinan rû dan. Slovenya ji ber tirsa Serokê netewperest Slobodon Miloseviç ku dixwast pergala herêmî bixe nav Yugoslavyayê, di Destûra Bingehîn de 'Guherîna diyarkirina qedera Slovenyayê tenê bi destê parlementoyê û eger hewce bike dê ji federasyonê veqete' dirûst kir. Ev guherîn bu sedem ku li Sirbistanê bertekên tund bên nîşandan û hikûmeta Sirbistanê têkiliyên xwe li gel Slovenyayê rawestîne.

Hilweşandina Bloka Rojhilat piştî Şerê Sar tesîr li Yugoslavyayê jî kir. Yekem welatê ku ji Yugoslavyaya Sosyalîst veqetiya Komara Slovenyayê bû. Tevgera demokrasî û serxwebûnê di 7ê Adara 1990î de bi ser ket. Bi dengdayîna li parlementoya Slovenyayê navê welêt bi Komara Slovenyayê hat guhertin. Di Nîsana heman salê de jî yekem hilbijartinên demokratîk pêk hatin. Di referandûma serxwebûnê de jî ku di Çileya Paşîn a 1990î de pêk hat ji %88 gel got 'Erê'. Slovenya di 25ê Hezîrana 1991an de bi fermî serxwebûna xwe ragihand.

## Taybetmendiyên giştî yên Slovenyayê

Slovenya ango bi navê fermî Komara Slovenyayê dikeve başûrê navenda Ewropayê. Li rojavayê Slovenyayê Îtalya, başûrê rojhilata Slovenyayê Behra Adriyatîk, li başûr û rojhilata Slovenyayê jî Hirvatistan (Crotia), li bakurê rojhilata wê Macaristan, li bakurê wê jî Awusturya heye. Paytext Ljubljana ye. Slovenya bi Slavî di wateya "Welatên Slavan" de ye. Ligel zimanê fermî Slovenî be jî Îtalyanî û Macarî jî tên nasîn. Slovenya ji 210 şaredariyan û ji 11 bajaran pêk tê. Bajarên wê yên girîng; paytext Ljubljana, Marîbor, Kranj û Koper in. Bi pergala demokrasiya parlamenter tê îdarekirin û Destûra Bingehîn di 23ê Çileya Pêşîn a 1991an de bi destxistina serxwebûnê re hat pejirandin. Çavkaniyên xwezayî yên Slovenyayê linyit, çinko û civa ne. Pîşesazî gelekî pêşketî ye. Mobilya, hesin û pola, lênûs, tekstîl, û kimya beşên sereke yên pîşesaziyê ne. Tekane lîmana vî welatî li bajarê Koperê ye. Di 1ê Gulana 2004an de tevlî Yekîtiya Ewropa bû. Slovenya yekem welat e ku ji Yugoslavyaya belavbûyî, beşdarî Yekîtiya Ewropayê bûye.

# Polîtîkaya 'Yek Zarok': Drameke 50 salî

Çîna ku bi milyarek û 351 milyon serjimara xwe di cîhanê de welatê herî qelebalix e, polîtîkaya xwe ya 'yek zarok' ku ji 1970an ve birêve dibir, nerm kir. Li gorî vê yekê ji hevseran yek, eger ji malbateke yek zarokî hatibe, destûr tê dayîn ku bibin xwediyê zarokekî din jî.

Berpirsê Komîteya Tenduristî û Plansaziya Malbatê Yang Vıncuang di daxuyaniya xwe ya destpêka 2017an de eşkere kiribû ku piştî destûr ji malbtan re hat dayîn ku bibin xwediyê du zarokan, rêjeya zayînê 7.9 zêdetir bû. Cîgirê Komîsyona Plansaziya Malbatê û Tenduristiya Netewî (NHFPC) Wang Peian, ragihand ku di 6 mehên ewilî yên 2017an de ji 7 milyonan zêdetir zarok çêbûne û ji van jî ji sedî 57,7 zarokên duyem in. Herwiha got ev rêje li gorî sala derbasbûyî 8,5 zêde ye.

**Rêjeya ciwan û zarokên keç kêm bû**

Sedemên vê biryara Çînê ya nermkirina polîtîkaya zarokan jî weke hejmara zêde ya mêr, kal û kêmbûna ciwanan tê nîşan dan. Di encama polîtîkaya berê de rêjeya ciwan û zarokên keç kêm bû û rêjeya kal û pîran zêde bû. Armancake din ya vê polîtîkayê jî pêşxistina aboriyê bû. Lêbelê encamên vê li pey xwe kurtaj û dram hiştin. Ji ber ku zarokên kur di kar û barên cotkariyê de wê alikariya malbatê bikin û wê bibin mîratgirê fermî wekî welatên din ên Asyayê, li Çînê jî kur tên xwastin. Her çiqas tevdirên cidî bên girtin jî malbat hê dema ku zarok di zîkê diya xwe de bin, zayenda wan hîn dibin û ger ku keç be serî li rêya kurtajê didin.

**Zedetirî 13 milyon kurtaj**

Tê îdiakirin ku heta niha bi vî awayî 100 mîlyon zarokên keç hatine kurtajkirin. Li Çînê salane 10 mîlyon hebên ku zarok pê bikevin tên firotin û kurtaja ku bi fermî tê zanîn jî 13 mîlyon e. Rêjeya kurtajên ku bêqeyîd têne kirin jî ne diyar e. Jiber zexta politikaya 'yek zarok' dê û bav zarokên ku naxwazin diterikînin. Gelek zarok di sêwîxaneyên dewletê de dijîn û ev zarok li cem hin malbatên din tên bicihkirin û ji bo nava welêt û derveyî welêt tên şandin. Piştî 1980an malbatan zarokên xwe yên keç li nufûsê qeyd nekirin. Zarokên keç bi rêyên fermî an ne fermî ji bo cem hin malbatên din dihatin şandin.

Di encama polîtîkaya berê de rêjeya ciwan û zarokên keç kêm; rêjeya kal û pîran zêde bû. Armancake din ya vê polîtîkayê jî pêşxistina aboriyê bû. Lêbelê encamên vê li pey xwe kurtaj û dram hiştin.



Serokê Enstîtûya Kurdî ya Parîsê Kendal Nezan:

# Ziman bingeha nasnameya Kurdî ye



NÛJÎN ONEN

Ferhenga Kurdî-Fransî ku ji aliyê rewşenbîr û nivîskarê Kurd, Mîr Kamûran Bedirxan piştî 39 salan ji aliyê Enstîtûya Kurdî ya Parîsê ve hat çapkirin. Di vê ferhengê de 85.000 peyv, ji hemû zarava û devokên zimanê Kurdî hatiye berhevkirin. Ev ferhenga navborî bi amadekariya Mîr Kamûran Bedirxan dest pê kiriye û wî bi xwe 25.000 peyv berhev kirine û wergerandine Fransî.

Kendal Nezan wiha behsa destpêka ferhenga Kurdî-Fransî û daxwaza Mîr Kamûran dike: "Çîroka ferhengê dûr û dirêj e. Bi xebata Mîr Kamûran Bedirxan dest pê dike. Mîr dixwest ferhengeke Kurdî-Fransizî ya berfireh amade bike ku tê de peyvên hemû devok û zaravayên Kurdî hebin. Di dema destpêka xebata wî de ferhengên Kurdî û zimanên ewropî kêm bûn, ferhenga dewlementir Dictionnaire kürde-français ya Alexandre Jaba bû ku di sala 1879an de li bajarê Sankt Petersbûrg, paytexta Rûsyayê derketibû. Ew ferheng ji 15.000 peyvên Kurmancî pêk dihat û êdî peyda nedibû. Di salên 1960an de A Kurdish - English Dictionary ya C. J. Edmond û Tawfiq Wahby li Oxford University Press, ku bi granî peyvên zaravayê Soranî civandibû û li Sovyetistanê jî Ferhenga kurdî-rûsî ya Qanatê Kurdo ya 34.000 peyvan hatin weşandin.

**"Ferhengeke bê mînak ji zimanê nivîskî an devkî wekî laşekî bê goşt, xwerû îskelet e"**

Serokê Enstîtûya Kurdî ya Parîsê Kendal Nezan di derbarê destpêkirina xebata ferhengê de wiha axivî:

Di salên 1950-1970î de, Mîr Kamûran li Zanîngeha Parîsê profesorê Ziman û Edebiyata Kurdî bû. Di ber gelek karên xwe yên perwerdeyî, siyasî û dîplomasî de xebata xwe ya ferhengê pêş ve dibir. Hevjîna wî, xatûn Nathalie d'Ossovetzky, ku aristokrateke polonî bû û bi gelek zimanan dizanî alîkariya wî dikir.

Gava ku Mîr di sala 1978an de wefat kir bi qasî 25.000 peyv berhev kiribûn û wergerandibûn Fransî. Lê ew di wê baweriyê de bû ku ev xebat hê nîvco ye, ji çapê re ne amade ye.

Destnivîsa ferhengê sipartin min. Me xwast ku wê bi peyvên di ferhengên Kurdî yên ku heta wê demê derketibûn temam bikin û çap bikin.

Lê piştî demekê me dît ku piraniya ferhengên heyî lîstên peyvan in, mînakên bikaranîna peyvan, wateyên wan ên cihê nadin. Ferhengeke bê mînak ji zimanê nivîskî an devkî wekî laşekî bê goşt, xwerû îskelet e. Me biryar da ku nelezînin, ji xebat û zanîna Kurdînasên ji hemû navçeyên Kurdistanê sûd wergirin û ferhengeke referans a li gor pîvanên zanistî yên Ewropî amade bikin.

Di dema xwe de zanayê Fransiz Roger Lescot bi qasî 20 salan li ser destnivîsa Mîr Celadet Bedirxan xebitî û Gramera kurdî nivîsî ku hêjî weke referans ji bo Kurmancî tê bi kar anîn. Me xwest ji bo ferhengê jî xebateke wisa bingehîn pêk bînin.

## Cûdahiya vê ferhengê

Di salên dawîn de ferhengnasiya Kurdî pêşketiye. Ferhengên kurdî-kurdî yên Gîw Mukriyanî û Hejar Mukriyanî, Shanrezor's Kurdish-English Dictionary ya Shafiq Qezaz, A Kurdish-English Dictionary ya Michael Chyet, Ferhenga kurdî-tirkî û tirkî-kurdî yên Zana Farqînî berhemên gelek hêja ne û bi kêrî xebatên me hatin.

Cudahiya ferhenga me ya sereke ew e ku ji bo cara yekem peyvên hemû zarava û devokan, dimilkî û feylî jî tê de, dicivîne û wan bi zimanekî Ewropî yê kulturê werdigerîne. Bi hezaran mînakên bikaranînên wan ên edebî, rojane û zargotinî rê didin ku him xwendevan ziravî û hûrgiliyên Kurdî başir têbigihêje him jî Kurdên navçeyekê an zaravayekê çêtir têbigihêjin peyvên devok û zaravayên din ên Kurdistanê.



"Kurdî di warê jiyana rojane ya gundîtiyê de, di peyvên erdnasî, xwedîkirina pez û dewaran û berhemên wan, di peywendiyên merivatiyê de gelek dewlemend e. Ji ber vê dewlemendiyê, zimannasê Fransiz ê navdar Alain Rey ku ferhenga Fransizî ya mezin Robert nû dike û ji çapê re amade dike, di pêşgotina xwe ya ferhenga me de dibêje Kurdî beşeke girîng a kelepûra (mîrata) zimanî ya mirovahiyê ye."

**"Kurdî beşeke girîng a kelepûra (mîrata) zimanî ya mirovahiyê ye"**

Kendal Nezan wiha behsa naveroka ferhengê û kesên di vê xebatê de cîh girtiye dike:

Di salên pêşîn ên vê xebatê de du xwendekarên Mîr Kamûran Josefa Bertolino û Caroline Delassus, hevjîna Roger Lescot, Marlise Lescot, zimannasê Kurd ê Rojhilatî Xosrow Ebdullahî bi awayekî domdar û hejmareke Kurdên din ên ku li Parîsê dijîn jî car bi car li gel min heftiyê carekê diciviyan.

Piştî vebûna Enstîtuyê, di sala 1983yan de, di çarçoveya bernameya me ya bûrsên xwendina bilind de, xwendekar ji hemû navçeyên Kurdistanê hatin Fransa û Parîsê. Xêra wan jî gihîşt dewlemendkirina ferhengê. Dû re, di sala 1987an de civînên Koma Kurmancî dest pê kirin; piştî demekê jî yên Koma Vatê ya Kirdkî-Dimilkî bi beşdariya nivîskar, zimannas û rojnamevanên van zaravayan. Di nav salan de bêtirî 150 kes beşdarî van civînan bûn û peyvnasiya Kurdî dewlemendtir kirin. Ferhenga me ji encamên xebatên komên Kurmancî û Vatê, ji gêncîneyên Edebiyata Kurdî ya nivîskî û yên zargotinî bi berfirehî îstifade kir.

Di dawiyê de me ji hemû zarava û devokên Kurdî bi qasî 85.000 peyv civandin. Dora 15.000 peyv heta pêleyekê dubare ne, guharteyên hin peyvan li gor bilêvkirina cihê yên devokan in.

Ji bo agahdarî; nivîsa Îbranî ya Peymana Kevn, ku pirtûka pîroz a cihû û mesîhiyan e, li dora 5.800 peyvan bi kar tîne, William Shakespear berhemên xwe bi qasî 15.000 peyv nivîsîne.

Kurdî di warê jiyana rojane ya gundîtiyê de, di peyvên erdnasî, perwerdekirina pez û dewaran û berhemên wan, di peywendiyên merivatiyê de gelek dewlemend e.

Ji ber vê dewlemendiyê, zimannasê Fransiz ê navdar Alain Rey ku ferhenga Fransizî ya mezin Robert nû dike û ji çapê re amade dike, di pêşgotina xwe ya ferhenga me de dibêje Kurdî beşeke girîng a kelepûra (mîrata) zimanî ya mirovahiyê ye.

# Wardozê 'bi folklora Kurdan' dest bi weşanê kir



GÖNÜL GÜN



Her çendî ji bo Kurdan û Kurdî niha rojên zor û zehmet bin jî ji aliyekî ve ji bo ziman û çanda Kurdan xebatên bi qîmet tên kirin. Yek ji wan jî Weşanxaneya Wardozê ye. Wardoz li Amedê hat avakirin û weşanxaneyê ji bo destpêkê niha yek li ser ziman, 10 li ser folklora Kurdan bi tevahî 11 pirtûk çap kirine. Wardoz dixwaze berê xwe bide folklora Kurdan. Em wek Heftenameya Basê li ser navê Weşanxaneya Wardozê bi edîtor Bahoz Baranî re axivîn.

**"Kurdiya bê folklor, Kurdiya bê pişt e"**

Navê weşanxaneya nû 'Wardoz' bala me dikişîne û li ser pirsa me edîtor Baran wiha qala wate û sedemên bijartina vî navî dike, "Wardoz, peyveke koçeran e. Maneya kesê ku li warekî digere dide. Koçer, wextê xwe li zozanan digirin û çêreya wan diqede yekî dikin wardoz ku here ji wan re warekî nû bibîne. Ji ber du sedeman me xwe li peyva wardozê girt; Yek jê em Kurd li warê xwe digerin, bê war in em. Bi her awayî, peyva Kurdî, gotina Kurdî, hebûna Kurdî li warekî digere ku bikaribe li wirê "he" bibe, ber bi xwe, berê xwe bide asoyên dîtir. Berê xwe fireh bike. Ji xeynî Kurdî û Kurdayetiyê, însan bixwe jî li vê dinyayê ji xwe re li warekî digere. Wardoz e. Tebatî nayê însan jî. Carinan ev war dibe dozîne, carinan dibe xeyal, carinan dibe edebîyat, carinan dibe şano, carinan dibe muzîk. Logoya me pezkovî ye, ew jî li cihên asê û bilind dihewe, pezkovî jî her wardoz e û ji xwe re li warekî digere. Helbet mirov dikare berê wardozê firehtir bike. Peyva wardozê bixwe jî li warekî digeriya, hat û li me û li folklorê fesilî. Bi qasî ku me lê kola, Cegerxwîn di helbesteke xwe de bi vê peyvê emel kiriye û gotiye, "Wardozî digerin li waran."

Baran destnîşan dike ku xebatkarên Wardozê, ev çend sal in karê berhevkariya folklorê dikin û wiha pê de diçe, "Zemîna gotina Kurdî, folklor e. Kurdiya bê folklor, Kurdiya bê pişt e, ji bo em pişta xwe xurt bikin, ji bo em bikaribin ji gotina xwe nemînin, divê em bêndera folklora xwe li ba bikin. Celadet Elî Bedirxan di Kovara Hawarê da behsa dewlemendiya folklora Kurdî dike û dibêje, 'folklora me bi têre xwe dewlemend e.' Her warê Kurdî divê ji folklorê dermale bibe, ji edebiyatê bigirin, heta sînemayê, heta şano û muzîkê. Di kîjan warî de dibe bila bibe, folklor tune be, peyv qels e, gotin dikule û mirov nema tehmê ji xwe û ji tiştên hilberendî digire. Helbet heta niha karê berhevkirina keresteyên folklorê hatiye kirin, lê em dixwazin li ser teoriya vî karî jî rawestin û bi pisporî lê herin. Me gelek tişt berhev kirin. Îcar divê ew tiştên ku me dane ser hev û tesnîf kirine, derketibûna meydanê û li ber çavan bihatibûna raxistin. Rêya vê yekê jî avakirina weşanxaneyekê bû."

Baran dibêje xebatkarên Wardozê tev xemxurê folklora Kurdan in û axaftina xwe wiha didomîne, "Vê xemê, em anîn cem hev. Her pirtûkeke me herî kêm sê çar salên me lê çûne. Li ser meselê, komkirina nifir û mamik û zûgotinokan gelekî dijwar e zêdetir wext lê diçe. Di nava vê kedê de, deşîfrasyona keresteyan jî heye, her tiştê qeydkirî lazim e derbasî nivîsê bibe. Wextê ev kar jî tê kirin divê mirov baldar be û çi çawa hatibe gotin wiha binivîse, ne kêm ne zêde. Ji bo vê yekê jî sebir û wext lazim e. "

**Pirtûkên ewil yên Wardozê amade ne**

Edîtorê Wardozê Baran tîne ziman ku 8 nivîskar û berhevkarên Wardozê 11 pirtûk amade kirine û wiha behsa wan pirtûkan dike, "Pirtûkeke me navê wê, "Mamikên Botanê" ye û mamikên Cizîr û derdora wê dihewîne, Rênas Xendekî û Dildar Botî piştî xebateke pênc salan ev pirtûk amade kirine. Pirtûkeke me ya din navê wê "Ebando" ye û qala çîrokên navnûçikên însanan dike, Mem Mukrîyanî sê salan li ser xebitiye. Ayhan Meretowar ku xemxurekî folklorê ye, pirtûkên bi navê "Lorî" û "Huseynê Farê" amade kiriye. Sadiq Ûskan, piştî xebateke çar salan li ser salnameya Kurmancî pirtûka bi navê "Payîzxêr Li Ser Salnameya Kurmancî Xebateka Folklorîk" amade kiriye, pirtûk berê xwe dide cotkarî û şivantiyê. Mehpûs Serhedî, berê xwe daye Qerecdaxê û xebroşkên Meta Şemsê û çîrokên gundiyan di bin navê "Kêço" û "Sînosêwî" da civandiye. Her wiha Mihemedê Kurdo jî "Zûgotinok" civandine. Min jî meselokên li nav gelî berhev kirine û li gorî mijaran tesnîf kiriye û navê pirtûka xwe kiriye, "Motik". Asmîn Ûyanikê jî nifir û dua berhev û tesnîf kirine û navê pirtûka wê jî "Nifir û Dua" ye. Berî niha jî me pirtûkeke bi navê "Ferhenga Bişaftinê" çap kir. Ew pirtûk jî li ser meseleya, a rast, li ser birîna ziman e."

**"Kesên pirtûkên me dixwînin şewqa folklora Kurdan dibînin"**

Baran li ser pirsa 'Her çiqas Wardoz nû vebûbe jî gelo bertêkên çawa ji rêya giştî ya Kurdan digire? wiha dibêje, "Folklora Kurdan weke gencîneyekê belawela û bêxwedî ye. Kesên ku pirtûkên me dixwînin, kesên ku bala xwe didin wan, şewqa wê gencîneyê li rûyê wan dixe. Pir kêfa wan tê. Hinek xwe nagirin şewq didin û dibêjin, 'Ev tişt li mala me jî gelek in.' Hinek dibêjin, 'Hûn pîra min bibînin çi gotinên ecêb li balê hene, em gotinên wê jî qeyd nekin?' Wextê em van gotinan dibihîzin em kêfxweş dibin, ji xwe em jî dixwazin her Kurdek qîmeta vê gencîneyê bizane û em tev bi hev re xwedîtiyê li mîrasa xwe bikin, wan gotinan li ser pelan raxin û berçav bikin."

## Pirtûkên ewil yên Wardozê amade ne

Edîtorê Wardozê Baran tîne ziman ku 8 nivîskar û berhevkarên Wardozê 11 pirtûk amade kirine û wiha behsa wan pirtûkan dike, "Pirtûkeke me navê wê, "Mamikên Botanê" ye û mamikên Cizîr û derdora wê dihewîne, Rênas Xendekî û Dildar Botî piştî xebateke pênc salan ev pirtûk amade kirine. Pirtûkeke me ya din navê wê "Ebando" ye û qala çîrokên navnûçikên însanan dike, Mem Mukrîyanî sê salan li ser xebitiye. Ayhan Meretowar ku xemxurekî folklorê ye, pirtûkên bi navê "Lorî" û "Huseynê Farê" amade kirine. Sadiq Ûskan, piştî xebateka çar salan li ser salnameya Kurmancî pirtûka bi navê "Payîzxêr Li Ser Salnameya Kurmancî Xebateka Folklorîk" amade kiriye, pirtûk berê xwe dide cotkarî û şivantiyê. Mehpûs Serhedî, berê xwe daye Qerecdaxê û xebroşkên Meta Şemsê û çîrokên gundiyan di bin navê "Kêço" û "Sînosêwî" da civandiye. Her wiha Mihemedê Kurdo jî "Zûgotinok" civandine. Min jî meselokên li nav gelî berhev kirine û li gorî mijaran tesnîf kiriye û navê pirtûka xwe kiriye, "Motik". Asmîn Ûyanikê jî nifir û dua berhev û tesnîf kirine û navê pirtûka wê jî "Nifir û Dua" ye. Berî niha jî me pirtûkeke bi navê "Ferhenga Bişaftinê" çap kir. Ew pirtûk jî li ser meseleya, a rast, li ser birîna ziman e."



JAN DOST

## Ez û Mijabad

Romana min î yekem Mijabad e. Romaneke tarîxî ye ku behsa Komara Kurdistanê yî li Mehabadê ku sala 1946an hatibû damezrandin dike. Ji bo nivîsandina wê min gelek lêkolîn kirin, ez heta Mehabadê jî çûm û min baş li mekanê romana xwe temaşe kir, bi xelkê re da û stend, li stranan guhdarî kir, li bajêr, li baxçe û çiyayên wê geriyam û dawiya dawî roman di serê min de kemilî.

Min di wê romanê de xwest lehengekî nêzîkî xwe bixuliqînim, lehengekî ku mîna min helbestvan be, şikestî be, têkçûyî be û mîna min bêhêvî bûbe û êdî nema baweriyê bi gelek tiştan bîne.

Min dixwest ez Qadî Mihemed ku serokê wê komarê bû, bikim karekterê sereke, lê gelek caran karekter rolê yan rolan ji hev didizin. Di Mijabadê de jî wisa li min hat. Min carekê dît ku Qadî Mihemed ketiye rêza dawî di nav karekteran de û rê ji Badînê Amîdî re vebûye ku ew serkêşiya bûyerên romanê bike.

Badînê Amîdî, xortekî ji Amîdiyê ye. Ew xortekî Behdînî ye, ji malbateke xizan e, bavê wî Ûnis ku di şerê Sarikamişê de beşdar bûbû û paşê «firar» kiribû û hatibû li Amedê xwe veşartibû heta ku di gel jina xwe ya ermenî Hamêst derbasî wî aliyê sînor bûbû û hatibû bajarê xwe. Ji wir jî berê xwe dabû Silêmaniyê û li gel Şêx Mehmûdê Berzencî şerê îngilîzan kiribû û şehîd ketibû.

Min got ku divabû lehengê romanê yekî nêzîkî min ba, ji ber ku ez jî şair bûm min hişt ku Badîn jî helbestvan / şair be. Helbestvaniya Badîn ji pêwistiyên romanê ye. Eger ew ne helbestvan bûya wê newalek kûr di navbera wî û zimanê wî de heba. Ez bi xwe jî helbestvan im û min nikaribû roman bi zimanekî ku dûrî min e û dûrî lehengê min e binivîsanda. Badîn ne tenê bi ramanên xwe nêzîkî min e, belê bi zimanê xwe yê helbestî jî. Min di rêya Badînê helbestvan re, ku ew ez im, xwest ku ez romana xwe bi zimanekî pak î herikbar binivîsim û ji monotoniya zimanê dîrokê birevim, zimanê dîrokî zuha ye, hişk e, min xwest zimanê kurdî û enerjiya ku têde ye geş bikim û sihra wî ya ciwan keşif bikim. Zimanê kurdî şêrîn û nazik e û berî her tiştî nêzîkî giyanan e, lê ew bi hacetî noqbûneke kûr e di binê deryayê wî de da ku dur û gewherên di sedefên girtî de derkevin.

Ez û lehengê xwe di gelek xalan de digihîjin hev, ne tenê di helbestvaniyê de, di têkçûnên evîndariyê de, di şewitandina li ber agirê dil de, di bêhêvîbûnê de, di reşbîniyê de û di gelek waran de. Ez Badînê Amêdî me. Ez ew im bi hemû şikestinên wî û şingirêdana wî û awarebûna wî, ez ew im bi hemû bêhêvîbûn û têkçûn û bendewariya mirinê û tirsa jê, ez ew im bi hemû hestên wî yên geş û vêketî, bi wê leza ku pê dikeve ber pêlên evînê. Ez Badînê xwediyê giyanê aware û dilê koçer im. Erê, dema ew tev li şoreşa Barzanî bû û hate Mehabadê, ji ber têkçûna evînê bû, dema ew di destpêkê de ji Amêdiyê derket jî ji ber têkçûna evîna wî bû û cara dawî jî di têkçûna xwe ya sêyem de ku li gel têkçûna komarê bû jî, wî pişta xwe da Mehabadê. Ev rewş di realiteyê û jiyana rojane de jî heye, ma bi hezaran tev li şoreşan nabin ji ber têkçûnên xwe yên evînî! Ew rewşeke psîkolojîk e; kesê têkçûyî, yê şikestî li fersendek serkeftinê digere, tevlî şoreşekê dibe da ku berî her tiştî zora xwe bibe û baweriya xwe ya bi xwe vegerîne. Xaleke din ez dixwazim behsa wê bikim; ew jî kilîşeya şoreşgerê pak û pîroz e! Pir kes hene şoreşgeriyê rengek ji rengên tesewufê, terkedunyatî û dawpakiyê dibînin! Bi baweriya wan be kesê şoreşger hemû xerîzeyên xwe (xerîze: instinct. Içgüdü) kuştine ji bo xêra welatê xwe. Min xwest di vê romanê de karekterekî ciyawaz ava bikim, şoreşgerekî ku naşibihe şoreşgerên di xeyalê xelkê de! Kesê şoreşger, çi rewşenbîr û çi bêsewad be, berî her tiştî mirov e, dikare di nava çîrokeke xwe yî evînî de be jî û di eynî demê de di ber welatê xwe de bimre, ew dikare têkiliyeke cinsî li cihê ku bavê wî têde şehîd bûye bi yara xwe re bike! Min li gor van pîvanan karekterê Badîn ava kir. Ew, dema ku dibe evîndar mirov e ne şoreşgerekî ku mêjiyê wî hatibe şûştin. Evînek şoreşgerî nîne. Evîn stûxwariye, zillet e. Me wisa evîn naskiriye û em wisa bi evînê re jiyane û helbestvan û aşiqên mezin mîna Ibnul Farid, Melayê Cizîrî, Xanî, Şîrazî û xeyrî wan evîn wisa dane nasandin. Min nexwest lehengê min derewan li xwe bike, min rê dayê ku bi kûranî bikeve evînê, li ser zimanê wî di romanê de wisa hatiye ku ew tevlî şoreşê bûye da ku birînên dilê xwe derman bike. Dawiyê jî ku hildikişe ser çiyayê Xwezyî, tenê dengê şikestina dilê xwe dibihîze.

# Çi Heyf!

ELÎDA ZERRÎ

Ez wazena ewro biney ziwan ser o vindera. Çimkî ziwan estbîyayişê yew şarî yo. Şêx Seîd zî wina vano. Vano ke; “Estbîyayîşe yew şarî bi ziwanê ey qayîm o.”

Yew ban senî pay de vindeno? Bi sayeye estunan pay de vindeno. Şar zî bi sayeyê ziwane xo pay de vindeno. Eke dîrega bawerî secde ya, dîrega estbîyayişe yew şarî zî ziwan o.

Ziwan tarîx û kulturê yew şarî ma rê mojneno. Eke ziwanê ê şarî vîndî bibo o şar zî vîndî beno.

Tarîx de ma vînenê şarê ke estbîyayîşê înan vîndî bîyo, muheqaq verê ziwane ê şarî helîyayo û mîyan ra wedarîyayo. Xora dişmenê yew şarî verê her çî ziwanê ey xo rê hedef gênê. Seke Goethe zî vano “Vera yew miletî, bi ziwanê ey kaykerdiş ra pîlêr suîkast nêbeno” Ziwan hende muhîm o. Labelê ez vînena ke şarê ma, çi kurmanc çi kirmanc kurdî ziwanê xo rê wayîr nêvejîyenê. Bi ziwanê xo qisey nêkenê. Hetta tayê merdimê ma ziwanê xo ra şerm kenê. Çi heyf!

Verê cû domanê ma ziwanê xo zanayêne. Teber de, keye de bi ziwanê xo qal kerdêne û bî ey kay kerdêne. Labelê nika domanê ma teber de, keye de tirki qal kenê. Zafêrê şarê ma ziwanê xo nêmusneno domananê xo. No şerm o û şermê ma hemîne yo. Na kêmaneyê ma ya. Yew cinî eke yew domanî/e ana dinya, gureyê aye yo verên a ganî verê verkan ziwanê dayîka xo bimusno domanê/a xo. Bi keye de bi ey/aye ziwanê xo qisey bikero. Ma hemîne re hem wezîfe yo hem zî mesuliyet o. Ganî ma domananê xo reyde hertim bi kirmanckî/zazakî qisey bikerê. Estunê yew ziwanî dayîk a. Dayîkî yan zî ma û pîyî eke keye de bi ziwanê xo qal nêkerê o wext prosesê mergê ziwanî hêdî- hêdî aver şino û o ziwan tewr peynî de mireno. Eke ziwanê yew şarî merd, estena şarî zî hêdî-hêdî mirena. Aye ra mesulîyeto giran keweno milanê ma û pîyan ser.

Maya mi û pîye mi keye de qet bi ziwane xo qisê nêkerdêne. Mi zî her wext bi tirkî qiey kerdêne; hem keye de hem teber de. No gune, gunayê ma û pîyanê ma yo.


Ez bîya pîl û kirmanckî/zazakî xo bî xo musaya. Mi kîtabî wendî, ez şîya Merdîn, mi warê zazakî de lîsanso berz qedena. Hîna zî kêmaneyê mi zaf ê. Çimkî binge zaf muhîm o. Eke ziwan bê bingeyî bero zanayene, normalş o ke kêmaneyê merdimî estbê. Ez tirki de fikirîyena labelê bi zazakî nusena. Ez tirki de fikirîyena labelê zazakî qisey kena. Çi heyf!

Baş o ke ez nusena, qisey kena, no zî hol o. Yanî ez ziwanê xo rê wayîr vejîyena. Zafaneyê ciwananê ma qisey zî nêkenê, mi va ya; ziwane xo ra şer kenê. Temam, raşt o ma û pîyanê înan ziwanê ma nêmusnayo înan labelê ê zî qet nêwazenê ke ziwanê xo bimusê, ser o bixebitîyê. Eslê xo de xo rê mal nêwkenê, ci rê wayîr nêvejîyenê. Vanê mesela komunîkasyon nîyo? Ma rê tirkî bes o, zazakî ra vanê ziwanêko xirab û qels o. Çi heyf!

Nêzanê ke tarîxê lehçeya zazakî çiqas kehen a, çiqas xorîn a û çiqas dewlemend a! Na dewlemendî û fîrazîye ra şerm kenê, xovîrrabîyayîş û vîndîbîyayîşê ey de rol kay kenê. Çimê mi de ziwan namûs o. Eke namûse yew merdimî/e esto, ganî verê cû ziwane xo rê wayîr bivejîyo.

Heta ke destê mi ra bero ez bi ziwanê xo xebitnena, bi ey nusena û qisey kena. No seba mi deynê mino namûsî yo. Çunke ez weş zana eke ziwanê mi vîndî bibo esl û kokê mi zî vîndî beno. Eke ziwan bimiro ez zî mirena, ma pêro mirenê.

> Heta ke destê mi ra bero ez ziwanê xo xebitnena, bi ey nusena û qisey kena. No seba mi deynê mino namûsî yo. Çunke ez weş zana eke ziwanê mi vîndî bibo esl û kokê mi zî vîndî beno. Eke ziwan bimiro ez zî mirena, ma pêro mirenê.



> Tarîx de ma vînenê şarê ke estbîyayîşê înan vîndî bîyo, muheqaq verê ziwane ê şarî helîyayo û mîyan ra wedarîyayo. Xora dişmenê yew şarî verê her çî ziwanê ey xo rê hedef gênê. Seke Goethe zî vano “Vera yew miletî, bi ziwanê ey kaykerdiş ra pîlêr suîkast nêbeno” Ziwan hende muhîm o.

UNESCO 2011 de vatbî ke; “ Eke wina dewam biko, zazakî nêzdî de mirena.” Heyf ke çi heyf !

Helbet no verê sucê dewleta asîmîlasyonîst o dima zî yê ma yo.

Ma ganî ziwanê xo ser o bixebîtîyê. Bi ziwanê xo bimuse, biwanê û binusê. Labelê verê cû domananê xo rê bimusnê. Domanê ma estunê ameyeyê ma yê. Yanî bextê ma destê domananê ma de yo. Ma ganî keyeyanê xo de hertim bi zazakî qal bikêrê.

Ez bi xo keyeyê xo de hertim bi zazakî qal kena. Yanî domana xo rê zazakî musnena. Kênaya mi nika yew serreyî ya. Ziwanê maya xo fehm kena. Ez zaf berxudar a. Zaf weşê mişino ke a ziwanê xo musena. Yew doman/e ziwane xo tenya maya xo ra museno/a. Eke mi ra nêbo yanî eke ez qal mekerî Holîne zî ziwane xo nêmusena. Nika kêneyê ê mayanê ke tirkî nêzanayêne û qisey nêkerdêne bi ziwanê tirkî domanan kenê pîl. Çi heyf!

Ez şima ra rica kena; bextê şima de bo keyeyanê xo de bi ziwanê dayîka xo qise bikerê. Çunke seke mamostayê ma yo namdarî vato “Ziwanê ma, mîrasê pîyan bawkalan o” Muhefezekerdişê nê mîrasî seba ma hemîne deynê namûsî yo. Ma bi yew vetayê Celadet Elî bedirxanî biqeqnê:

“Ey kurdêne, keyexirabeyêne. şerm o, şerm o, şerm o. şima yan mevajê ma kurd ê yan zî bi ziwanê xo qisey bikê”

LEWEND PALÎYIJ

## Raskolnîkovê Ma

Eke mi ra pers bikerî û vajî, hîrê romanan ke ti tewr zaf tira hes kenî bihûmare, bêşik ez do nînan bihumarî: Suc û Ceza, Anna Karenina, Şer û Aşitî. Coka ez vana qey ey ke romanê Dostoyevskî yo namdar Suc û Ceza nêwendo, çin o. La ez do nê quncikê qîtalekî de qala romanî ney, qala qehremanê romanî bika: Rodion Romanovîç Raskolnîkov. Raskolnîkov, keyeyêko feqîr de yeno dinya, mîyanê bêîmkanîye de beno pîl û seba wendişê huquqî yeno Petersburg. La seba ke şertê xo xirab î, mektebê xo nême de caverdeno. Cayêko yewçime de kîra de û tena ciwîyeno; seba ke pereyê xo qedîyayî, eşyayanê xo dano tefecîyêk û vera tefecîye ra pere geno. Cinêka tefecîya extîyare û pîse ke seba komelî tu feydeyê xo çin o û heto bîn ra seba komelî tena yew giranî ya, cuyêka bextewar ciwîyena û wayîrê pereyan a; labelê Raskolnîkovo ke eşkeno seba komelê xo gelek çîyanê feydeyinan bikero, bêpere yo û her çîyê xo yo qîmetinî dano na ciniye. Raskolnîkov mudeyêk ra pey binê tesîrê nê fikranê xo de maneno. Xo bi xo vano “Tarîx de heme qehremanan pay nayo yê bînan ser û bi no hewa paynikî yew bi yew xo pey de verdayî. Wexto vejîyayê tîtik zî hinî kesî ey sucdar qebul nêkerdî; bîlakîs sey yew qehremanî qebul kerdî. Coka, eke ez zî seba xizmetê komelê xo, seba karanê başan na cinêka xirab a tefecîye bikişî û pereyanê aye bidiznî, no çîyêko xirab nêbeno. Qey kam Napolyonî sey yew qetilkarî vîneno ke...” Raskolnîkov mudeyêk vera nê fikranê xo micadele keno, nata dano weta dano; axîr peynî de bi hewayêko bêqusir cinêka tefecîye kişeno. Yanî peynî de tu delîl nêverdeno. Labelê her çend bieşko na rastîye her kesî ra binimno zî nêeşkeno wîjdanê xo ra binimno. Axîr peynî de teslîmê wîjdanê xo beno û sucê xo îtîraf keno.

Ma nika zî bê Raskolnîkovê ma ser. La metersîn, Raskolnîkovê ma kesî nêkişeno. Heta ez bawer a nêeşkeno heywanêkê rebenî zî sere bibirno. Heta xwezila ey ra bi seyan kesî bibîyêne û xizmetê ziwanê ma bikerdêne. Belkî her kesî ra hîna zaf xebetîyeno. Ma kilm debirne, yê ma tena mantixê xo sey yê Raskolnîkovî yo. Yanî Raskolnîkovî xo bi xo nabi ro û xo bi xo girewtbi ya, yê ma zî wina yo. Xo bi xo nano ro, xo bi xo geno. Raskolnîkov peynî de teslîmê wîjdanê xo beno û sucê xo îtîraf keno; la ez bawer nêkena yê ma sucê xo îtîraf bikero, çimkî yê ma wîjdanê xo zî rehet o. Sey vateyê Çewlîgijan yê ma biney wazûn o û rik o. Yewê xo ra war nîno. Şaşîya xo qebul nêkeno. Weş qise keno, tene-tene qise keno, çimleyêk ra paragraf vejeno, hîkayeyêk ra roman vejeno, wexto qise keno ti vanê qey tornê pêxemberan o; la ancîna zî yewê xo ra war nîno. La ancîna zî ez vana, xwezila Raskolnîkovê ma ra bi seyan estbîyêne.

Vano: “Wina her kes nêeşkeno mudaxaleyê ziwanî bikero, her kes nêeşkeno xo bi xo qaliban bikar bîyaro, xo bi xo çekuyan bivirazo. Ganî merdim verê verkan bixebitîyo, binuso, pispor bo. Eke resa na sewîya, xora o wext hinî eşkeno mudaxaleyê ziwanî zî bikero, qalibanê neweyan zî bivirazo.” Yanî rastîya xo de eke ma hema wina ser ra biewne mesela ra heqdar o. Ziwan bi nuştoxanê xo aver keweno. Nuştoxê yew ziwanî, bi hewayêko tebîî mudaxaleyê ziwanî kenî, qalibanê newîyan danê ziwanî û bi no hewa ziwan dewlemend beno. Labelê ez bawer nêkena ke nuştoxanê ziwananê bînan bi nê mantixî mudaxaleyê ziwanê xo kerdo yan zî qalibê neweyî viraştî. Mantixo şaş ke ez qala ci kena no yo, Raskolnîkovê ma xo bi xo nano ro, yanî sewîyayêk dîyar keno û peyco xo bi xo geno, yanî payeya pisporîye dano xo.

Ez medyaya sosyalî ra zaf hes nêkena. Wina rey-rey, hewteyêk de yew-di dolimî dekewena hesabanê xo û hema wina çim erzena ci. La ez dîqet kena, ganî her roje dekewa keyepelanê kirdkî. Zazaki.net, Kirdki.com û Dersiminfo.com, xora nînan ra teber zaf çin ê; ey ke estî ey zî qedexe yê. Ge-ge ez rastê nuşteyê Raskolnîkovê ma zî yena. Ez a rast vajî, ez wendişê ey ra zewq gena. Ziwanê xo şenik o, asan o; zaf çîyê ke mi xo vîr ra kerdî ez sayeyê ey de newe ra bander bîya. La ti hêf ewnîyenî çi biewnî; çîyêko newe ceribnayo, xo bi xo qaîdeyêk viraşto û ha goreyê ê qaîdeyî nuseno. Mavaje se! Eke rojêk her kes bibo yew Raskolnîkov û xo gore qaîdeyan bivirazo û qaîdeyanê xo gore hereket bikero, eynî sey verê awanbîyayîşê Grûba Xebate ya Vateyî, yan zî her kes agêro fekê dewa xo ser û yewê xo ra war nêro, belkî o wext wîjdanê Raskolnîkovê ma ey nerehet bikero û na şaşîya xo bivîno û teslîm bibo.

# Heqanê Heywanan Ser o

DÎLEK AKDEMÎR

Kam zano naye ra çend se hezar serrî raver, baw û kalanê merdiman daran ra ameyî war û linganê xo ser o vindertî. Dewranê zaf verênan de cuya (heyatê) bawûkalanê ma û yê heywanan de zaf cîyayîye çin bîya. Înan eynî xoza de pîya ciwîyayêne. Zeman ameyênê înan heyvanî neçîr kerdêne, zeman ameyêne ê bi bîyenê nêçîrê heywanan ra bîyene neçîr. Ma ewro henî texmîn kenîme ke înan mabênê xo û heywanan hîç ferq nêdîyêne. Ê dewran de merdiman henî fikir kerdêne ke kokê însanan û yê heywanan yew o.

Gore tayê dînan û bawerîyanê kanan heyvan zaf muhîm bîyê. Hetta tayê heywanî hetê însanan ra sey Heqî/ Homayî ameyê dîyayayêne. Ci rê zaf hurmete kerdêne. Ancîya nê dîn û bawerîyan de neçîr kî zey karêko heja ameyo dîyayêne. Wexto ke neçîrvanan yew heywanî kiştêne, şar perô-pîya hurmet û şukranê xo musnayênê ê heywanî. Tayê dînan û bawerîyanê kehenan yê bînan de bawer bîyene ke eke yew însan bimiro, ancîya sifetê yew însan yan kî yê yew heywanî de yeno dînya. (reenkarnasyon)

Seke zeman vurîyo dîn û bawerî kî vurîyayê. Însan qedr û qiymetê xo kerdo berz. Haq/Homayê însanan ê neweyî vato ke qedrê însanan pêroyê xeliqîyayeyan ra berzêr o. Goreyê naye Heq însanî sifetê xo ra peyda kerdê. Însanî, serdestê masîyanê deryayan, milçîkanê asmênî, moran û milavênan, mal û naxiran ê. Hukumdarê xoza (tebîet) yê.

Însanî wextê modernî de resayê muradê xo. Xoza ra dûrî kewtê û bîyê hukumdarê xoza. Endî cuya însanan heywanan ra zaf cîya ya. Însan berz o, qatê Haqî de ro, bihêz o. Heywan pîs e. Heywanî nêeşkenê zey însanan bifikirîye, hîs bikerê. Haqî heywanî seba xeliqnayê. Wa înan rê bibê werd, mal û koleyî.

Bi averşîyayîşê zanistî qederê heywanan kî pedê-pedê bivurîyo. Tabî manaya pozîtîf de. Darwînî ancîya ardo ma vîr ke ma însanî û heywanî yew koke ra enîme. Nê zanyarê girdî, xeylê lêkolînan ra tepîya vato ke: Însan qureyî keno û sey yew esero ke layiqê mudaxaleyê Heqî vîneno. Merdim bifikirîyo ke kokê ey heywanan ra yeno, goreyê mi no fikir hîna mutewazî û rast beno.

Wext ame zanyaran DNA keşf kerd. DNAyî ma rê musnenê ke danê ma însanî heywanan ra honedbiferq nîme. Heywanî, mordemê însanan ê. Naye re tepîya tayê însanî heqê heywanan ser o fikirîyayî. Tayê dewletetan derheqê heqanê heywanan qanûnê neweyî vetê. Mesela dewleta Hindîstanî delfînî (yunus balığı) sey yew ferd qebul kena. Dewleta Zelendaya Newîye heywanan sey însanan gandarê hîsinan qebul kena.

Helbet nê gamî warê heqanê heywanan de gamê zaf qij ê. Her serre bi mîlyonan heywanî seba werdene yenê kiştenê. Dewleta Tirkîya heqê neçirkedişê tayê heywanan bi pere roşena dewlemendan. Ancîya bi hezaran heywanî seba îmalkerdişê mamulanê kozmetîkan labaratuaran îşkence vînenê. Ma gerê xo vîr ra nêkerîme ke mucadeleyo ke vera nijadperestî û cinsîyetçitînî ameyo kerdene bi seyan serrî yo ke dewam keno. Rojê yena ke heqê heywanan kî yenê naskerdiş. Çitur ke ma nika qaytê tarîxî kenê û nijadperestî û kolecitîye ra şermayenîme, wext yeno ke xirabîya ke înan rê kerda ver heywanan ra bişermayîmê û nêeşkîmê ke rîyê xo hard ra berz bikîme.



Êyê ke vane ma dest ra teba nêno, gerê her çîyî ra ver domananê xo xoza ra dûrî nêgîrê. Ma çiqas heywanan de pîya biciwîmê înan dahîna rind nas kenîme. Peynî de vînenîme ke ê ma ra honde kî dûrî nîyê. Merdim eke yewî nas kerd, xirabîya ê kesî nêwazeno, heqanê ey kî mudafa keno.

Ma heywanan çiqas nas bikîme hende vînenîme ke ê gandar ê ke heskerdiş û zerrîveşnîya ma vejenê teber. Heywanî saf û mesum ê. Ê tebîetî ra îhtîyacê xo ra zêdeyêr çî nêgênê. Kîndar nîyê. Sediq û semîmî yê. Eke ma nê hetanê înan bîyarîme çimanê xo ver qebul kenîme ke çîyê ke ma înan ra bigîrîme zaf ê.

# Mesajê Referandumê Xoserîye-II



Ez referandumî rê se vana? Helbet ke “Heya” vana. Xora şik esto ke netîce de HEYA nêvejîyo? Ma hondê nêzdîyê nê îmkanê tarîxî bîmî ke gerê ma pêro cîyayîyan, egoyan û hesabanê xo terk bikîme û bi îradeyê xoyê ortaxî vajîme “HEYA”. Ez wazena ke no referandum seba şarê kurdî bibo wesîleyê meşteyanê rindan. Pêroyê şarê ma û wendoxanê şima rê selamî.

Nîlufer Akbal
(Hunermende)

# Şêx Ubeydûllahê Nehrî

■ PÊŞAR BEXTEWER

Şêx Ubeydûlahê Nehrîyo ke sey ronayoxê fikrê miletperwerîya kurdan yeno qebulkerdiş 1826 de Şemzînan de maya xo ra bî. Lajê Seyîd Tahayî û pîyê Seyîd Abdulqadîrî bî. Ma ke ewnenê tarîxê mucadeleyanê raxelisîyayîşê kurdan ra vînenê ke "Kurdîstano Xoser" tewr verî amancê ey bîyo û seba nê amancî dest bi xoverdayîşî kerdo. Semedo ke lîderê ey o bîyo, serewedaritişê kurdan yê 1880î bi nameyê ey name beno û tarîx de winî ca girewto.

Şêx Ubeydûllah nêmeyê dîyin yê seserra 19. de sermîyanê terîqetê Nakşîbendîye bî û kurdan mîyan de otorîteya ey bîye. Ey xo rê kerdbî hedef ke Kurdîstano Xoser rono, wextê şerê rûsan û tirkan de (1877-1878) kerdêne ke otorîteya xo heme cayanê ke kurdî tede ciwayêne de tesîs biko. Şêx Ubeydullahî waştêne ke vera Tirkîya serewedaritiş organize biko. Şerî ra pey seba nê hedefe xo bi hawayo aktîf dest bi amadekarîye kerd. General Zelenîyî (generalo rûs) yew raporê xo de derheqê fikranê Şêx Ubeydûlahî de wina nuşto: "O zeîfîya ke dewleta Osmanîyan tede ya ano çimanê xo ver û vano na dewlete rijîna. O wazeno ke kurdî Osmanîyan ra cîya bibê û biresê xoserîya xo"

Ubeydûllah hetê sîyasî ra Îngîlîstanî ra vêşêr nêzdîyê Rûsya de bî. Nê tavrê xo wina îzah kerdêne: "Merdim hetanî ke hetê luye de beno, hetê şêrî de bibo hîna baş o" Ey waştêne ke armenî, ereb û asurî ke sey kurdan binê bandora Îran û Osmanîyan de mendbîy pîya hereket bikê û eynî wext de serewedarê. Şêx Ubeydûlahî vatêne ke "Tu heqê Tirkîya (Osmanîyan) û Îranî çin o ke kurdan îdare bikê. Gama ke semedê serewedaritîşî venga mîr û beganê kurdan dayêne vatêne ke "Ez emîn a. Eke heme lîderê kurdan desteg bidê ma, ma eşkenê serkewte bibê."

**Karekter û Prensîbê Şêx Ubeydûllahî**

Şêx merdimêko zaf mutewazî bî. Mesela eke kesêk semedê yew problemi ra muracatê ey bikerdêne, bêke biewnîyo statuye ey ê sosyalî ra yan bizzat bi xo şîyenê vernîya ey yan zî lajê xo erşawitêne. Goreyê konsolosê umûmî yê Îngîlîstanî Abbotî, Ubeydûllah rojêk de çend sey merdimî qebulê xuzurê xo kerdêne. Abbotî raporê xo yê 08.07. 1880 tarîxinî de wina dewam kerdêne: "Tarzê ey uslûbo ke ma îdarekeranê tirkan û farisan ra vînêne ra zaf cîya yo.

Şêx kesêko mutewazî bî û bi goreyê tebaya xo bi goreyê heqanîyetî îdare kerdêne. Aye ra nufuso ke binê hukmê ey de ciwîyayêne rûmet dayêne ey. Tu rey wer (ruşwed) nêgirewtêne û destûr nêdayenê ke merdimê ey zî bigîrê. Eke kesêk eksê naye hereket bikerdêne cezaya mergî dayene ey. Her kes nameyê "Baba" ey ra panaybî, gama ke cayêk de qalê nameyê ey bîyêne sey îşaretê heskerdiş û hürmete ameyêne weriştiş. Şêx, kesêko wende bî û kerdêne ke fikir û terzê ciwîyayîşê komelanê medenîyan bimuso.

Armenîyo ke dewrê ey de ciwîyayo, derheqê ey de nê nuştê: "O, kesêko namdar, jêhat, feal, kibar û basîretin bî. Sey yew pîyî ewnîyayêne sêwiran û vîyayan ra. Semedo ke derd û problemanê xo ci ra vajê, meselayanê dîn û wijdanî ser o qiseyanê ey bigoşdarê, tembîhanê ey bigîrê, nesîhetanê qebul bikê her hetî ra kurdî ameyêne ey het..."

**Têkilîya ey bi Xirîstîyan û Armenîyan**

Îtîbarê Şêx Ubeydûlahî xirîstîyanan mîyan de zî zêde bî. Çunke înan rê bi hawayê dostanîye muamele kerdêne. Goreyê vatişanê S. G. Wîlsonî Ubeydûlahî tim vatêne ke xirîstîyanê ke binê îdareyê ey de bîyê ê do zî qasê heqanê muslumananan bibê wayîrê heqan.

Şêx Ubeydûlahî winî bawer kerdêne ke ganî kurdî mucadeleyê raxelîsîyayîşê xo de armenîyan reyde hereket bikerê. Ey wina nuştbî: "Îtîmadê mi faris û tirkan ra vêşêr armenîyan rê esto. Ma herinda ke bi farisan û tirkan de îtifaq bikê armenîyan reyde bikê hîna baş o. Şêx yew rey rayîr ra bibîy mêmanê Manastirê Azîz Varfolomeyî (Wan) û uca qiseykerdişêk kerd û wina va: "Ez semedê mêmanperwerîya şima zaf zerrîzîz bîya. Ma başî û durustîya armenîyan zaf verê cû ra zanenê, baw û kalanê ma wextanê zaf verênan ra nata pîya atmosferê dostî û birayî mîyan de ciwîyayê. Çîyo ke ma wazenê no yo ke ganî no tu wext nêro xovîrrakerdiş. Ez şima temîn kena ke armenîyî do ameye de şarê mi ra zerar nêvînê"


**Goreyê Şêx Ubeydûllahî Kurdîstan hewce kerdêne**

Aşma temmuze 1880î de Şemzînan de kombîyayîşê lîderanê kurdan dest pêkerdbî. No kombîyayîş, hetê hîrayîya temsîlîyetî ra kombîyayîşo tewr gird yê seserra 19. ya tarîxê kurdan bî. Amancê bingeyîn yê kombîyayîşî hetê Şêx Ubeydûlahî ra ameybî dîyarkerdiş: Eşîranê kurdan mîyan de yewîye tesîs kerdene û seba serewedaritişî amadekarî kerdene. Nehrî, kombîyayîşê tewr peyênî de hewceyîyê Kurdîstanê xoserî ser o vindert û waşt ke kesê ke Kurdîstanî binê bandora xo de gênê vera înan xoverdayîş bero kerdene.

Nê ma nê nuşteyî de nêwaşt ke rasterast serewedaritişê ey ra behs bikê la eşkênê nînan vajê: Heyf ke hereketê ey zî ser nêkewt. La şêx hedefê xo ra fek veraneda. Ey tu rey tawîz nêdayanê. Na mana de yew nimûne zî na ya: 1882 de Kamîl Bego ke sekereterê hîreyin yê Sultanê Osmanîyan bî, semedo ke Şêx Ubeydûlahî îqna biko ke o do şoro yewê bajaranê pîrozan yê Erebîstanî ke o dem binê bandora Osmanîyan de bîy ameybî Wan. Sultanî ey rê 150 lîra meaşê teqawutîye û sewbîn îmtîyazî teklîf kerdî la Şêxî nê teklîfî qebul nêkerd û Qelaya Oramarî de ca bî û bi hawayo lezkanî amadekarî kerd ke vera artêşa tirkan xoverdayîş biko...

Tirkan tewr peynî de Şêx Ubeydûlah û lajê ey Seyîd Abdulqadirî tepiştî û surgunê Mûsilî kerdî, wextêkê kilmî dima zî ê surgunê Mekke kerdî. Şêx Ubeydûlah 1903 de Mekke de; surgun de wefat kerd. Seyîd Evdilqadir, meşrutîyetê yewinî ra pey ame efûkerdiş û agêra Îstanbul. Dima tayînê meclîsê ayan yê Osmanîyan bî. Seke ma zanê Seyîd Evdilqadir ronayoxanê Kürt Teali Cemiyetî (KTC) ra yew o û ey serekîya nê cemîyetî kerd. Peynîya yew dafika/dama rejîmê Kemalîstî de tewqîf bî. Ame îdîakerdiş ke eleqeyê ey bi serewedaritişê Şêx Seîdî esto û 27 gulane 1926 de Dîyarbekir de ame dardekerdiş

> Şêx Ubeydûlahî vatêne ke "Tu heqê Tirkîya (Osmanîyan) û Îranî çin o ke kurdan îdare bikê. Gama ke semedê serewedaritîşî venga mîr û beganê kurdan dayêne vatêne ke "Ez emîn a. Eke heme lîderê kurdan desteg bidê ma, ma eşkenê serkewte bibê."



Orte de mîsyonero amerîkayij Dr. Joseph P. Cochran û Şêx Ubeydûlah (Foto serranê 1800î de ancîyayo )

## Şex Ubeydûllah vano:

Şarê kurdo ke 500. 000 hêzarî ra zêdeyêr keyeyî ra yeno pê şarêko cîya yo. Dînê înan, edet û qanûnê înan (ê bînan ra) cîya yo...Wa tabîyê tirkan yan farisan bibê ferq nêkeno pêro reîs û îdarekeran yê eşîranê Kurdîstanî, kesê ke Kurdîstan de ronişenê bîyê yew û hemfikir ê ke probleme înan do bi destê her di hukmatan (Osmanîyan û farisan) nêrê çareserkerdiş û ganî çîyê bero kerdene. No semed ra ganî hukmatanê Ewropa ke înan problemê fam kerdo rewşa ma ser o cigêrayîş bikê. Ma eynî wext de miletêkê cîya yê. Ma wazenê meselayanê xo bi xo hal bikerê.

(mesajo ke ey erşawito serkonsolosê Îngilîstanî yê Tebrîzî, muhtewaya ey ra)

"Ma nêeşkenê tirkanê bêîmanan rê hîna zêde tehamul bikê, hende binê bandora înan de mendişê ma êdî bes o! Ganî ma raxelîsyê." Ey dişmenanê kurdan mîyan de hukmatê tirkan ra teber yê Îranî zî nîşan dayene û vatêne ke "Nê her di hukmatî tizrûgê ke (sülük) engelê averşîyayîşê ma yê."

Hey felek, zalim felek çi ancena ez destanê to ra?
Ez se bikera eza û cefayê to ra?
To keyeyê mi vayî da ez se bikera na hesrete ra.
Zerrî de hesreta welatî Ya Rebbî ez se bikera?
Xurbete de taqetê mi çin o ya padîşah ez se bikera?
Ez ke ewladê Huseynî ya nê musîbetî ra şerm nêbeno.
Ez şina xurbetîye la taqetê qeçekan çin o.
Baxçeyê pêrdê xo ra hîcret muşkîl nîyo ez sekera.
Baxçeyê Şêx Salihî ra abirîyayîş, ez senîn bikera?
Şarê Şemzînanî hetê wefakarîye ra sey şarê Kufe yo.
Ez cefayan rê sebir kena, hesbunallah we kefa.(Ellah mi rê bes û kafî yo)
Ez Yusuf a, Yakubê mi çin o ke ez vaja esefa
Kabetullah bî Misirê ma, şerefê ci zêdekero Ellah.
Ey merdim o ke sey Ubeydullah bîyo namdar, sebirke!
Her tim ayeta lâ taknutû bîyarî vîrê xo zerrîyê!
Şarê Nehrî heme sey sêwiran bi xem û bi keder ê.
Wa her tim payîdar bo textê Sultanê Cîhanî Ebdulhemîdî!
Tirkî ra çarnayox: Miraz Babij

Şêx Ubeydûllahî wexto ke seba surgunî erşawîyayo Mekke na şîîre nuşta.

Not: Ma seba nê nuşteyî yew kitabê Prof. Celîle Celîlî ke nameyê ey cêr ra vîyareno ra îsîfade kerd.
Celîle Celîl, 1880 Kürt Ayaklanması Şeyh Ubeydullah Nehri, Avesta Yayınları, İkinci Baskı, İstanbul, 2014

# Tuwerzîn û Kurdî*

Kurdî tuwerzînanê (balteyanê) xo rê zaf bimeraq bîy. Kurdî, dewanê xo yê Kurdîstanî de bîlê tuwerzînanê xo, hetê xo ra kêmî nêkerdêne û gama ke şîyêne xurbete senî ke dayîkanê ispartayijî qalxan dayêne domananê xo dest dayîkanê înan zî tuwerzînan dayêne destê înan. Gama ke xortêko kurd ameyêne 14-15 serreyîya xo û heyecanê ciwanîye hîs kerdêne vilan (çîçegan) nêgirewtêne xo dest, tuwerzînê xo eştêne doşa xo ser û qîrayênê: "derde mi esto, derde mi esto!" . Bi no hewa taxan ra gêrayêne û pencerayanê qefesinan ra ewnîyayêne. Kêneka ke qebul kerdêne derdê ey rê bibo derman pencara xo kerdêne ya û ci ra vatenê "ez bena qurbanê derde to" Naye ser o xortî zî vatêne: "ez zî tuwerzînê tîya de dana piro" û tuwerzînê xo dayene berê keyeyê kêneke ra. Dima ra şîyêne keye, seba ke tuwerzînî peyser bîyaro maya xo erşawitêne û bi nê firsendî maya ey kêneke dîyêne. Çimê kurdan de mana û qiymetê tuwerzînî zaf pîl bî. Tuwerzînê kurdan rê laf pirodayene pêxamberê înan rê laf pirodayene ra xirabêr bî.

*No sernuşte ma pana metnî ra. Romanê Loksandra yê Marîa Yordanîdu ra neqlkerdox: Rohat Alakom.

Çime: Rohat Alakom, Eski İstanbul Kürtleri, Avesta yayınları, Genişletilmiş 2. Baskı, İstanbul, 2012, r. 70-71



# Yew Vîrardiş: Heykelê Seyîd Rizayî

Heykelê Seyîd Rizayî çarçewaya festîvala Munzurî ya 10. de, 29. 07. 2010 de Dêrsim de ronîya. Bi no qaydê welatê ma de reya verêne yew heykelê lîderêkê kurdan ame ronayene. Seke yeno zanayîş festîvala Munzurî 2007î ra nat organîze bena û emser do reya 15. mabênê 28-30 temmuze de bera viraştene. O wext ronîyayîşê heykelê Seyîd Rizayî Festîvalê Munzurî ya 10. rê manayêka îstîsnaî da qezenckerdiş. Ma bîyarîn şima vîr ke roja ke no heykel ronîya walîyê Dêrsimî derheqê ronîyayîşê heykelî de dawa akerde. Heykelê Seyîd Rizayî roja ronîyayîşê ey ra hetanî ewro hetê bi hezaran merdimî ra ame ziyaret kerdene.



# Foklorê Erxenîyî ra yew Mesela: Qertal û Lû

Yew roje kartel şîno serî yew kerrî ya, vindeno uja, ewneno binê ra yew lû vejîno. Lû vano:

Qertal qardaş ti sê kenî nuja?

Qertal vano:

Ez nija, xo ra vindêrto, ez kêfilya ya ênca boya xo gên.

Lu jî vano:

Willey, ez ji xêfilyaya bîne nê kêrra de rakûn, bê ma embaze pê bi.

Qertal vano :

Tamam..

Epêy gêrenî. Rojê lû ti ra vano:

Qertal kardaş, ti rojê bê misafire mi bi.

Qertal vano:

Temam. Ti çû waxt vaj se ez yên.

Lû haber dano ci û Qertal şino. Lu ardan ra şorbe pêwjena. Dêkena yew kerra ser ra.Qertal nûkuna xo dana pûro.Nûkula xo vana rak rak.Êwneno nûkula xo şikîyêna nêşena şorbe bûro. Dima lû vano:

Qertal kardaş, kanî to nêverd..Qertal vano:

Hent mi vêrd, pîze mi dêjeno. Ez zav werd. Dima ra Qertal wêrzeno û şino.

Yew roje, Qertal lû ra vano:

Roje bê misafire biraye xo bi. Lû vano:

Tamam.

Qertal şino xellle gireneno (xabik) pewjeno. Beno keno, tellî gewen sero kêno mîyan. Lû ra vano:

Bo tasa ma naya, nana ma nayo.Lû fekê xo bena ti ra vano: wax, wax..

Lû vano :

Birayê mi ti ano dayo mi, ez nêşen bûre..Têlî şino fêke mi ra. Qertal jî vano:

Birayê mi ti wexto ke veyd da mi. To şorba kerd sêre kerra, ez jî nêşaya bûro, nûkûla mi şîkîya. Mi senî a roje nêwerd, ez vêyşan menda, ti jî nika ênî wena...





**FIRAT CEWERÎ**

## Tu bi ciwanî çûyî, bi ciwanî di bîra me de mayî

Ehmed, birakê min ê delal, hevalê min ê zaroktiyê, niha, heke tu sax bûyayî, tu ê di temenê min de bûyayî. Gelek tiştên ku min kirin, tu jê mayî. Tu nezewicî, tu nebûyî bav, kesî ji te re negot bavo. Ji xwe tenê xortaniya te tê bîra min, tu bi wê xortaniyê çûyî. Tu xortekî çeleng bûyî. Bejna te zirav û dirêj bû. Rûyê te bi ken, gotinên te nerm bûn. Te kes nediêşand, kes ji te nediêşiyan. Dê û bavê te ji ber te serbilind bûn, merivên te ji ber te serbilind… Em hê di salên xwe ên zarotiyê ji hev bi dûr ketibûn, mîna noka ku li tehtê bikeve, her yek ji me bi derekê de belav bûbûn. Lê gava em herdu bûbûn xortik ez û tu rojekê li gund pêrgî hev hatibûn, em herdu jî bêhawe kêfxweş bûbûn. Em herdu jî ji bo eynî armancê çûbûn gund. Sala 1977 an jî 78 bû. Em bi hevdu ecêb hatibûn. Em bi guhertinên hev keniyabûn, me qerf û henek kiribûn. Tu bi çend tayên riha min keniyabûyî. Te fêhm kiribû ku min xwestibû ez xwe bişibînim Che Guevara. Me li kar û mijûliyên hev pirsî bûn. Te yek bi yek li endamên malbatê pirsî bû. Nexweşiya bavê min tu xemgîn kiribû. Lê me tavilê mijar guhertibû û em dageriyabûn ser siyasetê. Ji ber ku em bi armanceke siyasî li gundê zaroktiya xwe vegeriyabûn. Em du heval bûn, lê riyên me ji hev veqetiyabûn. Em ketibûn rêxistinên cihê, me bi berçavkên cihê li dinyayê dinêrî. Lê zimanê me ê siyasî ne kurdî bû, tirkî bû. Gava em dageriyabûn ser siyasetê û me bi tirkî reqandibûyî, me gotinên qelew kiribûn. Me pêşî analîza dinyayê kiribû û em bi dirêjahî li ser feodalîzm û kapîtalîzmê peyivîbûn. Em li ser sosyo-ekonomiya Kurdistanê ji hev cihê difikirîn. Te civaka Kapîtalîzmê civakeke nexweş û kirêt didît. Di vî warî de fikrên min jî ne zêde dûrî ên te bûn. Em li ser diyalektîkê, li ser felsefeyên idealist û materialist pir peyivîbûn. Me herduyan jî bêyî navbir ji gotinên alim û fîlosofan nimûne dabûn. Me xwe dispart lîterature Marksîzmê. Ji bo em esehiya gotinên xwe bi hev bidin qebûlkirin, me navên kitêban û hejmarên rûpelên wan jî didan. Herçiqas em ji hev cihê difikirîn jî, em dîsa bi dîtina hev û nêrînên hev kêfxweş dibûn. Heke ne em herdu heval, lê du hevalên me ên din hatibûna hemberî hev, wan ê tiştên nemayî bianîna serên hev. Dibe ku ew bi kulm û pehînan jî rabûna hev. Ew dem welê bû, Carina gotinê têr nedikir, gir û nefretê xwe dida der. Lê ez û tu bi gotinê rabûna hev jî, me hêrsa xwe dadiqurtand. Heta, piştî minaqeşeya me, te kitêbeke Dîmîtrov jî diyariyî min kiribû. Lê min ew kitêb li gund jibîr kir. Belkî jî melekên qenciyê ew bi min da jibîrkirin da ku bi rê de ez nekevim destên eskerên zalim. Gava me xatir ji hev xwest û ez bi hevalên xwe re ber bi bajêr vegeriyam, eskeran riya me birîn û serê otomobîla me anî binê wê. Baş bû ku tiştek nedîtin û hiştin em bi riya xwe de herin. Jê û pê ve min û te nema hevdu dît. Di hundirê du-sê salan de tevger xurt bûn. Em bi wê xurtahiyê kişiyan ber hev û ketin pêxîla hev. Êdî hevalên me bi çek û sîlehan rabûn hev. Qaşo me haziriya şoreşê dikir. Bi taybetî jî te. Te çek diparast û te her behsa şerê çekdarî dikir. Di wê navê de ewrekî reş bi ser welêt de girt û ter û hişk da ber xwe. Ez jî terkedinya bûbûm, ji welêt derketibûm, çûbûm. Tu di nav pencên wan de mabûyî. Tu ji welêt derneketî, te derketina ji welêt bi bazdana ji tekoşînê ve girêdida. Min kuştina birayê te yê mezin Mehmûd piştî bi demekê bihîstibû. Min mêrxasiya wî jî bihîstibû. Bi saloxan, gava li çiyê birîndar dibe, berî ku ruh bide, bi xwîna xwe hersê herfên partiya xwe li ser tehtekî dinivîse. Nûçeya kuştina birayê te ez ji dil xemgîn kiribûm. Ji bo sersaxiyê min xwestibû ez telefonî te bikin, lê tu wenda bûyî. Tu geh li vî gundî, geh li wî gundî, geh li vî çiyayî, geh li wî çiyayî bûyî. Tu seyar bûyî, cih û warên te ne diyar bûn. Digotin Ehmed bi çek û rextan pêçayî ye, bûye komutan. Tu digel hevalên xwe ên bi sîleh şevekê hatibûyî gundê me jî. Diya min ji min re behs kir. Got te rih berdabû, bi gotina wê, ji rih û simbêlan devê te nexuyabû. Tu û hevalên xwe bi diya min heybet hatibûn, lê tu li hemberî wê milahîm tev geriyabûyî. Te li min pirsîbû, ji ber nivîsandina min ya bi kurdî te kêfa xwe anîbû. Piştî tu ji gund veqetiyabûyî, te dîsa berê xwe dabû çiyan. Lê tu rojekê ketibûyî xefikê, bi çend gulan gindêr bûbûyî. Tu hê nebûbûyî sih salî. Tu îro sax bûyayî, tu ê bi ser pêncî û pêncan ketibûyayî. Tu bi ciwanî çûyî, bi ciwanî di bîra me de mayî…

Engin Kaya

# Portreya xwendevan wek Kurdekî



Engin Kaya her hefte gava dihat Medya Kitabeviyê du tişt miheqeq dikirin: Çaya tarî vedixwar û bi kêmanî du kîtab dikirîn. Di mêjûya Medya Kitabeviyê a texma 1100 hefteyî de, ti hefteyekê bêyî kirîna kîtaban, destvala, ji wir derneketibû. Bi kîtabên ku di vê maweyê de ji vir kirîbûn kîtabxaneyeke dewlemend li mala xwe ava kiribû.



CIWANMERD KULEK

Bihara 1996an, rojeke yekşemê gava Engin Kaya wek her tim çû Pasaja Aznavurê a li Stenbolê bo ku serdana Med-Komê, saziyeke kulturî, bike, kîtabfiroşekî ku li kêleka vê saziyê vebûbû bala wî kişand. Ket hundir û li kîtaban nerî. Şaş ma gava di refan de ewqas kîtabên kurdî û ên li ser Kurdan li bal hev dîtin. Di dilê xwe de got ku ew ciyekî tam li gora wî ye û kêfxweş bû. Çend kîtab stendin û vegeriya malê. Kîtabfiroşê ku li Pasaja Aznavurê dikana xwe nû vekiribû zêde bala xwe nedayê gava hefteyeke din dîsa ew zilam hat dikana wî, wek cara dî li nav kîtaban geriya, çend heb stendin û derket çû. Hefteya sisêyan, roja yekşemê, gava cardî hat dikanê, kîtabfiroş vê carê tê derxist ku heman kes e û di hefteya çaran de fahm kir ku xerîdarekî wî yê dilsoz, midawim û bi meraq çêbûye.

Engin ji zarotiya xwe de aşiqê kîtaban bû. Dema li gund, Qimirlî, bûn carina ji berîka bavê xwe yê dikandar pere didizîn û dema ji gund diçû bajêr li wir kîtabên ku peyda dikirin dikirîn: Köroğlu, Kerem ve Aslı, Ferhat ile Şirin, Dede Korkut û hwd... Li gundekî ku şeş mehan di bin berfê de dima û salê duwazdeh mehan sobe ji malan nedihatin derxistin, gundekî ji 21 gundên Xoçvanê, çêbûbû. Li vê herêmê mezin bûbû ku Kurmanc, Ezerî, Terekeme û Maleganên ku carekê ji ber Ûris reviyabûn hatibûn wir û paşê ji ber Romê reviyabûn û vegeriyabûn Ûrisetê, lê vehewiyabûn; hîn ji destpêkê de xweziya xwe bi dengbêj û çîrokbêjên ku dihatin wir û dibûn mêhvanên malan û dîwanan dianî, dilê xwe dibijand xwendinê û meyla xwe dida ser muzîkê. Rojekê, dema pazdeh salî bû, mala xwe ji vê herêma sar û asê a li Erdexanê rakirin û anîn Stenbolê.

### Li Stenbolê kîtabên dîtir hene

Dema di 1975an de hatin Stenbolê, li vê derê xwest xwendina xwe bidomîne û çû lîseyekê. Lê li dibistanê zûka ji nerîna bi sivikayetî a Tirkan aciz bû, neqedand ji ber henek û qeşmeriyên ku wan bi axaftina wî, bi Tirkiya wî, dikirin. Di wî temenê xwe de ketibû ber karekî giran, li fabrîqeyeke çêkirina kilîtan dişixulî di ber xwendina dibistanê re. Piştre fahm kir ku nikaribû êdî xwendina dibistanê dewam bike û di sala duyemîn de dev jê berda. Lê tiştên ku ji zarotiya wî de meraqa wî li ser bû pey wî bernedidan. Tembûrek kirî û dest pê kir xwe bi xwe fêrî jenandina wê bibe. Çiqas fêr bû êdî dest pê kir wan stranên ku di zarotiya xwe de ji ber xwe ve digotin jî bike meqam û awaz, xwe bi xwe stran bestin. Li kê derê çalakiyeke kulturî a kurdan hebûya xwe li wir digirt. Di 1976an de, rojekê gava çû Yûrda Diyarbekiriyan a li Yenikapıyê, tiştekî ku li wir dît ji xewnên şevan bêhtir ew kelecanî kir. Cara yekê bû kîtabeke bi kurdî didît: Memê Alan. Wî ev çîrok berê li gund jî gelekî bihîstibû, lê wexta ew kîtab xist destê xwe, pelên wê qulipandin û Bozê Rewan û salixdanên dî ên bi kurdî tê de dîtin sersam bû. Bi şev ew kîtab dixist bin serê xwe û radiza. Kîtabeke ku wan çîrok û destanên zimanê wî, zarotiya wî, paşeroja wî dihundirandin, eger ne xezîneyek bûya, ma çi bû?! Dû re rastî gewherên dî ên ji xezîneyên wiha hatin. Di salên 1976-77an de xortên Kurdan li Taksimê stand vedikirin û wî li wir jî hin berhemên Kurdan dîtin: Ereb Şemo (Kürt Çoban, wer. G. Bozarslan), Cegerxwîn (Lenin Şafağı, wer. G. Bozarslan), helbestên Celal Aladağ (bernavkê Kemal Burkay), Kovara Tîrêj... Çi bidîta distend û dianî malê, diket ser wan û dixwend. Hrant Dinkê xwediyê kîtabfiroşiya Beyaz Evê a li Bakırköyê jî êdî vî xwendevanê jidil ê ku misêwa dihat dikana wî nas dikir. Rexmî hemû karên zehmet ên ku ji bo debara jiyana xwe dikirin, lêgerî û peyrewiya Engin ya li kîtaban ranediwestiya, bi şewq û eşqeke gurr dewam dikir. Çiqas di ber kar û jiyanê de bibetiliyana, carina tevî kîtaba ku dixwend li ser rûyê wî di xew re biçûna jî, gava tembûra xwe datanî ser dawa xwe hemû bar û derdê jiyanê ji bîr dikir.

### Yekşem dibe şemî

Kîtabfiroşê li pasaja Aznavurê ê ku Engin êdî her yekşem ji malê lêdixist û dihat wir Medya Kitabevi bû. Dema Medya Kitabevi berev salên 2000an ji wir bar kir û hat ket pasaja Elhamrayê pirsgirêkeke nû derket ji bo wî. Pasaja Elhamrayê rojên yekşeman girtî bû. Engin Kaya bi birayê xwe re karê şuştina xaliyan û paqijkirina camên dikan û mixazeyan dikir û rojên şemiyan jî dixebitîn. Lê çi jî bibûya diviya hefteyê rojekê bihata vê kîtabxaneyê û di nav bêhna kîtaban de, di nav dengên kurdî de wext derbas bikiraya. Rojên şemiyan gava karê wî hebûya jî hincetek çêdikir û karê xwe li cî dihişt, ji perrekî Stenbolê lêdixist dihat Medya Kitabeviyê. Li derdora wî zêde mirovên xwende tine bûn, vê eşqa wî ya kîtaban û her hefte serdana kîtabxaneyekê tiştekî seyr û neasayî bû ji bo gelekan; lê vê çûn û hatina wî ya bi dilsozî û berdewamî, dilgermî û canfedayiya wî ya ku pê li vê riyê dikudand dikaribû kevir jî nerm bikiraya. Êdî her kesî vê helwesta wî qebûl dikir û rêz lê digirt.

Di 21 salên ku vê dikana kîtaban, Medya Kitabevi, vebûbû de tenê du sê hefteyan nehat serdana wê. Sebeba nehatina xwe jî hîn ji berê de ji xwediyê dikanê, Selahattin Bulut, re diyar kiribû: "Eger carekê ez nehatim, zanibe ku yan cenazeyek heye, yan nexweşiyek yan jî tiştekî pirr pirr giran ku ez nikarim xwe ji ber bidim alî qewimiye." Mirina bavê wî û du sê tiştên dî yên pirr giran yekane sebeb bûn ku nehiştin di van kêm carên awarte de xwe bigihîne Medya Kitabeviyê.

Carina li Stenbolê zivistan bû, pirr sar bû, berf û qeşa li erdê bû, kesî nikaribû ji hundirê xwe derkeve, dema diya wî didît ku wa xwe kar dike ku dîsa derkeve here "wî ciyî", li ber digeriya û digotê ku hema qet nebe vê carê neçe û li mala xwe rûnê, lê ew ji a xwe danediket. Hin caran xwediyê dikanê, Selahattin Bulut, bi xwe telefonî wî dikir û jê dixwest ku wê hefteyê neye ji ber ku dinya ne xweş bû, rê ne xweş bûn, lê dikir nedikir nikaribû wî qanih bike. Engin wek her car ji mal derdiket, li Bahçelievlerê li otobêsê siwar dibû û berê xwe dida Taksimê. Û hema bêje her car ciyê xwe dida yekî/e jipiyan ku rûnê û ew bi xwe li ser piyan dima heta wê riya dirêj diqedand. Ev jî exlaqekî wî yê dî bû ku nikaribû biguheranda; hema ku yekî salekê ji xwe mezintir jî bidîtaya gerek rabûya û ciyê xwe bidayayê. Gava wî karê giran ê birin û anîna xaliyên giran di avahiyên bilind de ew ji hal de dixist jî, carekê nedigot hema wê carê, wê seferê heta dawî ji xwe re li ciyê xwe rûnê.

### Kîtabxaneya li malê

Çûna berdewam a bi salan hişt ku Engin Kaya ciyê her kîtaba li nav refên Medya Kitabeviyê jixweber zanibe. Hin caran kîtabên ku Selahattin Bulut ciyê wan ji bîr dikir jî didîtin. Lê vê pêşbaziya dîtina ciyê kîtaban ne yekalî bû: Hin caran jî, dema Engin radibû kîtabeke ku xerîdarekî dixwest derxe wî ew nedidît. Tu nabêjî gava Selahattin Bulut ew paqij dikirin ciyê wan guhertibûn!

Engin Kaya bi deh salan her hefte gava dihat Medya Kitabeviyê du tişt miheqeq dikirin: Çaya tarî vedixwar û bi kêmanî du kîtab dikirîn. Di mêjûya Medya Kitabeviyê a texma 1100 hefteyî de, ti hefteyekê bêyî kirîna kîtaban, destvala, ji wir derneketibû. Bi kîtabên ku di vê maweyê de ji vir kirîbûn kîtabxaneyeke dewlemend li mala xwe ava kiribû.

Dema her hefte kîtabinî nû ku bikire peyda nekiraya, vê carê jî kîtabên ku berê kirîbûn cardî dikirîn, ew dikirin diyarî û dida hin kesan. Diyarîkirina kîtaban kêfxweşiyeke bêpayan dida wî û dixwest mirovên dora wî giştan kîtab bixwendana. Pirr li ber diket û dilgiran dibû dema didît ku mirovên li dora wî, ên ku wî kîtab dabûn wan, ew nexwendibûn. Lê kêm heban jî bûya, li dora wî hin mirov derdiketin ku meraqa wan a xwendinê çêdibû. Van mirovên wek wî karker û xebatkar û li taxên dûrî navendê dijîn, dema Engin roja şemiyê berê xwe dide nava bajêr û diçe Medya Kitabeviyê, siparişên xwe didinê û jê dixwazin ku wan kîtaban ji wan re bîne. Piştî ku Engin ziyareta xwe ya wê hefteyê a li Medya Kitabeviyê diqedîne û berê xwe dide malê, li devê riya xwe ji otobêsê peya dibe, diçe wan kîtaban digihîne xwediyên wan, vedigere tê li otobêseke dî siwar dibe û ji wir diçe malê.

Di 1976an de, rojekê gava çû Yûrda Diyarbekiriyan a li Yenikapıyê, tiştekî ku li wir dît ji xewnên şevan bêhtir ew kelecanî kir. Cara yekê bû kîtabeke bi kurdî didît: Memê Alan.




Di berxaneya Engin Kaya a ku bi dirêjahiya temenekî ew dagirt û dewlemend kir de ne tenê kîtab û kovar, kaset, CD û sêlik jî hene. Mirovên ku di nava salan re li Medya Kitabeviyê nas kirin, ên ku lêkolînek bikira yan li ser tiştekî bixebitiya, dema tiştek li ciyekî peyda nekira teqez li ba wî peyda dikir.

### Nivîs diçe xwendin dimîne

Di berxaneya Engin Kaya a ku bi dirêjahiya temenekî wî ew dagirt û dewlemend kir de ne tenê kîtab û kovar, kaset, CD û sêlik jî hene. Mirovên ku di nava salan re li Medya Kitabeviyê nas kirin, ên ku lêkolînek bikira yan li ser tiştekî bixebitiya, dema tiştek li ciyekî peyda nekira teqez li ba wî peyda dikir. Dema hin nivîskar yan rewşenbîrên ji derveyî welêt dihatin û li vê derê di kovarekê yan rojnameyekê de nûçeyek li ser wan yan hevpeyvîneke bi wan re derketaya, Engin illeh diçû ew kovar yan rojname peyda dikir û bi postê ji wan re dişand welatê ku lê dijiyan. Ew dilxwazî û bextewariya wî ya dema ku ev tişt dikirin qet kêm nebû.

Engin Kaya xwediyê du zarokan e; yek jê keç, yek jî kurr e. Bi zarokên xwe re bi kurdî diaxive û hewl dide ew jî wek wî ji xwendinê hez bikin. Engin rojekê xanima xwe û zarokên xwe jî anîn Medya Kitabeviyê, ji bo ku vî ciyê ku jê re bûbû wek miqnetîsekê û li kû bûya jî ew dikişand bibînin. Di 21 salên Medya Kitabeviyê de her hefte çû serdana wê û di 42 salên xwe yên li Stenbolê de tenê du caran çû gundê xwe yê li Xoçvanê. Çend stranbêjan stranên ku wî çêkirin gotin, lê wek xwendevan asta ku gihaştê ji vê jî bilindtir bû: Di romaneke ku xwediyê kîtabfiroşiya ku wî her hefte wek hecekê ziyareta wê dikir ew nivîsandibû de can û ruh da qehremanekî girîng ê çîrokê. Êdî di serdemekê de dijî ku qehreman dibin xwendevan, xwendevan dibin qehreman.

Cotkarê Kurd İmam Kılıç:

# Li Rihayê her ku diçe cotkariya fistiqan zêdetir tê kirin

BENGÎ BAWEŞAN



Li Rihayê cotkariya fistiqan tê kirin û gelek malbat debara xwe ji vî karî dikin. Cotkar dibêjin di fistiqan de qezenceke baş heye, lêbelê ji ber ku cotkar nikarin rasterast bifiroşin, fistiq gelek bi erzanî ji destên wan derdikevin.

Hin mexsûl di şert û mercên germ de digihêjin. Yek ji van mehsûlan jî fistiq e ku gelek ji germê hez dike. Li bajarê Rihayê, cotkariya fistiqan tê kirin û li her deverê Rihayê darên fistiqan digihêjin û fistiq bi piranî bo welatên wekî Ewropa û Rûsyayê tên îxracatkirin. Cotkarê Kurd İmam Kılıç li ser cotkariya fistiqên Rihayê ji Heftenameya Basê re axivî.

**Darên fistiqan du caran tên daweşandin**

İmam Kılıç di nav malbateke cotkar de hatiye dinê û ew bi xwe jî bi salan e cotkariya fistiqan dike. Kılıç derheq cotkariya fistiqên Rihayê de wiha diaxive, "Bi texminî li Rihayê nêzî 200 sal e cotkariya fistiqan tê kirin. Berê fistiq kêm bûn lê niha her ku diçe cotkariya fistiqan zêdetir dibe. Dareke me heye niha 130 salî ye. Bi qasî ez dizanim li Riha û derdorê wê, darên fistiqê yên 400 salî jî hene." Kılıç dibêje li Rihayê berê darên fistiqan di nava 15 salan de mezin dibûn, lê niha di nava 10 salan de darên fistiqan digihêjin û wiha axaftina xwe didomîne, "Berê li Rihayê darên fistiqên xwemalî ango yên Rihayê dihatin çandin. Lê darên Rihayê dereng mezin dibûn û salekê fistiq digirtin salekê nedigirtin. Lê darên Sêrtê him li gorî yên me zû digihêjin him jî her sal fistiq digirin û baştir in. Lewma cotkarên Rihayê diçin şitilên yek salî ji Sêrtê tînin û li Rihayê diçînin. Piştî ku dar 4 salî dibe em aşiya darên Rihayê lê dixin. Ger dar vê aşiyê bigire êdî aşî nayê kirin lê ger negire careke din dar tê aşî kirin."

**Li Rihayê cotkariya fistiqan bi piranî Kurd dikin**

Kılıç diyar dike ku îsal fistiq li herêmê zêde ne û her wisa cotkar li bendê ne ku bihayê fistiqê hinek din rabe. Fistiqên dev-vekirî li gorî yên devgirtî bihatir in. Cotkaran par fistiqên dev-vekirî bi 22 lîreyan firotin firoşkaran, yên devgirtî û yên ter jî bi 16 lîreyan firotin xwediyê febrîqeyan (Bo çîkolata û beqlewayê. Piştî ku fistiqên ter li febrîqeyan tên hûrkirin kêmî 80 lîreyî nayên firotin) Dîsa par firoşkarên ku bi 40-45 lîreyi fistiq ji cotkaran kiribûn, bi 60 lîreyî firotin kiroxdaran. Kılıç ji bo mijara debara li ser fistiqan jî dibêje, "Yên ku 40-50 donim erdê wî hebe û cotkariya fistiqan bike, dikare bi rehetî debara xwe bike. Dara 10 salî 15 kîlo fistiq dide. Eger baş li darên fistiqan binêrin û digel mezinbûna darê re hilberîneke zêde jê tê girtin"

**Ji bo derveyî welat tên îxrackirin**

Cotkarê Kurd destnîşan dike ku piraniya fistiqên Rihayê ji bo derveyî welêt tên îxracatkirin û di serî de jî ixracî welatên Ewropa û Rûsyayê tên kirin. Kılıç balê dikişîne û dibêje li Rihayê bi piranî Kurd cotkariya fistiqan dikin û her wisa ji bilî Rihayê hin dever û cihên din yên ku lê fistiq hene dîsa cotkariya fistiqan Kurd dikin û bê keda Kurdan di dereke din de, fistiq nagihêje. Kılıç bo cotkariya fistiqan yên li cîhanê jî van agahiyan dide, "Li Hîndîstan û Amerîkayê fistiq hene lê wan ji herêma me girtine. Hin cotkarên dewlemend yên Rihayê meraq kirine û çûne li Teksasa Amerikayê û dîtine ku li wir ji aliyê dewleta Amerîkayê ve cotkariya fistiqan tê kirin û Amerîkayê jî di vê dawiyê de ji me girtine. Her wiha cotkar çûne Îranê û dîtine ku li darên fistiqê yên 700 salî li wir jî hene."

**Fistiqên Rihayê bi rûn in û tama wan xweş e**

Kılıç bo cudahiya fistiqên Riha, Sêrt û Dîlokê jî van agahiyan dide, "Ji ber ku herêma me germ e, fistiqên me bi rûn in û tama wan jî xweş in. Yanî fistiqên Riha û Dîlokê wisa ne, lê herçiqas gir bin jî rûnê fistiqên Sêrtê kêm e. Ji ber wê yekê jî wekî yên me tama wan ne xweş e. Fistiqên Sêrtê wek çerez tên xwarin. Lê fistiqên Riha, Dîlokê ji bo çikolata û beqlewayan tên bikaranîn."

## Salane zêdetirî 30 hezar û 574 ton fistiq tên hilberîn

Cotkar Kılıç destnîşan dike ku jixwe salê carekê dar, fistiq digirin ev jî di meha Adarê de pelê darên fistiqan vedibin û ji çar mehan şûn de jî hûndirê fistiqê tijî dibe û wiha axaftina xwe didomîne, "Fistiq ji ber du sedeman du caran tên daweşandin. Cara yekem; eger fistiq bo çêkirina çikolata û beqlewayê bê bikaranîn, wê demê beriya debrê/hesadê ango berî 20 rojên bi dawîbûna havînê re bi terrî tên berhevkirin. Digel vê, dema ku fistiq hinekî din zû bê berhevkirin ev yek bo darê baş e çimkî dar zêde naweste. Cara duyem jî; ji bo ku fistiq wek çerez bê xwarin, wê demê fistiq li ser darê zêdetir disekine. Li ber tavê sor dibe û bi vî awayî devê vî jî vedibe." Kılıç balê dikişîne û dibêje zehmetiya berhevkirina fistiqan zêde ye û dema ku fistiq tên berhevkirin divê ev yek baş bê kirin. Divê yek bi yek bi tiliya xwe gûşiya fistiqan bixî û berhev bikî. Ger li ser darê fistiq bimîne, ev fistiqên mayî dibe sedem ku kurm li darê peyda bibe û dar birize. Kılıç diyar dike ku li gorî agahiyên fermî, niha li Rihayê salane 30 hezar 574 ton hilberîna fistiqan çêdibe. 15 mîlyon darên ku fistiq digire û 9 mîlyon jî darên ku fistiq nagirin hene."

## Divê cotkar fistiqên xwe rasterast bifiroşe

Kılıç tîne ziman ku li Rihayê cotkar ji ber pîyaseya firotina fistiqan gilî û gazinc in û wiha pê de diçe, "Divê bazirgan (tucar) nekeve navbera cotkar û muşteriyan û cotkar bi xwe rasterast fistiqên xwe bifiroşin febrîqeyan. Eger wisa be ji vir herî kêm wê cotkar 10 lîre kar bike. Dewlet dikare tiştinan bike, weke mînak li vir bi xwe febrîqeyan dikare veke. Ji ber ku dewlet ji vir zêdetir qezenc dike. Tucar ji me fistiqan erzan dikirin û biha difiroşin, li ser keda me dewlemend dibin û qîmeta keda cotkaran tune ye."

# Cotkar rêyên nû diceribînin



DARA PORXELEK

Serê donimê heta 200-250 kîlo dide. Eger tu Biharê bavêjî dê debra wê heta 150-200 kîlo be. Divê piştî çandiniyê hûn gubra dapê bidinê. Kara wê ji ya nîsk û genim zêdetir e.

Pêşketina derfetên teknolojiyê, şiyarbûna cotkaran bi normên cîhanê, cotkariyê jî bi xwe re diguherîne. Li Bakurê welêt jî cotkarên Kurd, dest bi çandina kînoa, reşreşk, gilgil(Garis) û cûreyên din ên çandiniyê kirine. Zeximbûn û qelîteya axa Kurdan bûye baregeh ji welatiyan re. Nêzîkî 12 hezar sal e li Kurdistanê cotkarî tê kirin. Welatê Kurdan di warê çandiniyê de gelekî dewlemend û berhemdar e. Kurd hewl didin ku di warê çandiniyê de di nav rêjeya cîhanê de bikevin rêza herî pêş û welatê xwe bi vê yekê pêş bixin. Reşreşk ji malbata giyaziviran (kulîlka dawetê ) tê hesibandin. Bejna wê bi tîrane li gor cûre 20 – 80 cm bilind dibe û gelek çiq jê diçin. Belgên wê li ber navtengê derdikevin, keskan jî hinekî zerane bi awayekî guherbar derdikevin û dişibin yên sibitê (Tere ). Cotkarên Kurd dest bi çandina vê cûre giyayî jî kirine. Yek ji van cotkaran jî Mehmet Sait Öztürk e ku li Bismila navçeya Diyarbekir çandiniya reşreşkê dike.

**"Reşreşik salê du caran tê çandin"**

Mehmet Sait Öztürk ê hilberînerê giyaya reşreşkê ji Heftenameya Basê re di derbarê çandin, dûzerkirin, berhevkirin, firotin û bazirganiya reşreşkê de diaxive û diyar dike ku ev giya li Bakur giyayekî nû ye. Sait dibêje, "reşreşk salê du caran tê çandin. Cara yekem di meha Cotmehê de tê çandin, cara duyem jî meha Sibatê de. Reşreşk bi xwe baharateke taybet e û feydeyên wê jî gelekî zêde ne. Îro li Bakur çandiniyeke nû ye û xwedî taybetmendiyeke mezin e. Li Batman, Mêrdîn, Diyarbekir û Rihayê dikarî biçînî. Dema payîzê bê çandin debra wê zêde ye. Serê donimê heta 200-250 kîlo dide. Eger tu Biharê bavêjî dê debra wê heta 150-200 kîlo be. Divê piştî çandiniyê hûn gubra dapê bidinê. Li gor genim û nîskê karê wê baştir e. Li herêma me fabrîqayên ku bikirin û dûzerkî bikin tune ne. Em difiroşin fabrîqayên Mersînê. Ev cure giya him bejî tê çandin, him jî avî. Eger hûn avî deynin, serê donimê wê heta 300-350 kîlo jî bide."

**Bazara wê û bikaranîna wê jî gelek dewlemend e**

Sait Öztürk axaftina xwe wiha didomîne, "Em debra xwe berhev dikin û dişînin Mêrsînê û li wir fabrîqa vê giyayê hûr dike, da ku bikarhêner bikaribin bikarbînin. Li ser nan û kek û çorekan tê reşandin. Fêdeyê wê jî gelekî zêde ne. Mixabin li Bakur fabrîqayên ku wê ji bo bikaranînê amade bikin tune ne. Bazirgan ji cotkaran dikirin û dibin Mêrsîna Tirkiyeyê. Îsal min jî dest bi bazirganiya reşreşkê kir. Îro tekane bazirganê vê giyayê li Bakur ez im. Cotkarên ku dixwazin debra xwe bifiroşin dikarin xwe bigihînin min. Fiyata wê jî gelek baş e. Ji ber vê yekê jî bila cotkarên Bakur vê yekê biceribînin. Darikê wê hişk e û zûbizû zirar nabîne. Piyasa wê jî gelekî baş e."



## Ji nîsk û genim çêtir e

Cotkar Öztürk dibêje, "Kar û ajotina wê weke nîskê ye. Rîska têkçûyîna wê li gor nîskan pir kêm e." û wiha pê de diçe: "Barana zêde tade lê nake. Giyayekî xurt û zexim e. Weke nîskan bi bîçerê tê dirîtin. Bi debra xwe jî gelekî ji cureyên din çêtir e. Ji sed donimî re 350-400 kîlo tov tê avêtin, debra wê jî hema bêje weke nîskê ye. Lê firotina wê ya niha bi 7 lîre û nîvan diçe. Par heta 18 lîreyên Tirkiyeyê dihat firotin. Îsal ji ber ku li Sûriyeyê gelek kesan çandiniya vê cûreyê kir, tesîrê li fiyata vir jî kir. Ji ber wê yekê jî a niha kîlo hinek bi erzanî diçe lê bi giştî fiyata wê li ser 8 lîreyan diçe. Ez ji hemû cotkarên Bakur re pêşniyaz dikim ku çandiniya vî giyayî bikin û cotkariyê bi teknolojiyê baştir bikin."

# Birincê Enberbo yê herî baş e

İDRIS EHMED



Li Rojhilatê Kurdistanê dewlemendiya çandiniyê balê dikişîne. Bi sedan cûreyên çandiniyê li gund û bajarên Rojhilatê Kurdistanê tên çandin û firoşkariya wan tê kirin. Birincê Enberbo ku bi taybetmendî û tama xwe deng veda ye jî yek ji van cûreyan e. Navenda birincê Enberbo bajarokê Sîrwanê ye. Bajarokê Sîrwanê li Rojhilatê Kurdistanê û girêdayî Başûrê Îlamê ye. Navenda vî bajarokî Lumar e.

Cotkar û berpirsyarên bajarokê Sîrwanê di derbarê çandiniya birincê de ji Basê re axivîn.

**Îlam di rêza yekem de ye**

Bajarokê Sîrwanê yê girêdayî Îlamê di rêza yekem de ye ku birincê dişîne Rojhilatê Kurdistanê. Her sal bi saya çemê Seymere li Sîrwan û gundên wê birinc tê çandin. Birincê Enberbo yê herî baş e li Sîrwanê. Ev bajarê Kurdî weke bingeha vî cûre birîncî tê zanîn.

**Çandiniya birincê her sal zêdetir dibe**

Gerînendeyê Cotkariyê yê Bajarokê Sîrwanê Hucettula Bexşûde di derbarê birincê de dibêje: "Her sal di demsala xwe de li gund û navenda bajarokê Sîrwanê, bi taybetî jî jinên Kurd bi cotkariya birincê re mijûl dibin û sal bi sal birincê Sîrwanê li bazar û sûkên Îlamê û bajarên Îranê zêde dibe. Li Enberboyê birincê Sîrwanê li bazarên Îranê gelek tê firotin. Jinên Kurd xweştirîn xwarinan bi vî birincî çêdikin. Tenê li Sîrwanê ji 400 donimî zêdetir birinc hatiye çandin û rêjeya îsal li gor sala çûyî ji sedî 10 zêdetir e."

**Jı ber ku avê kêm dixwaze û pir tê tercîhkirin**

Kerem Elayarî ku ew û malbata xwe cotkariya çandiniya birincê dike, wiha dibêje: "Birincê Enberbo cûreyê herî baş ê birincê ye. Ji ber ku avê kêm dixwaze bi giştî her kes wê tercîh dike."

# Hilberînerên serayan bi gilî û gazin in

DILDAR KURDISTANÎ



Li Bakur, cotkar bi dehan cureyan çandiniya cotkariyê dikin. Ji gilgil bigirin ta genim, ji nîskan bigirin ta reşreşkê, ji ceh bigrin ta fêkiyan. Di van salên dawîn de jî dest bi hilberandina sewzeyan di sereyan de kirine. Li Bakur hilberîner û cotkaran di sala 2007an de dest bi avakirina serayan kirine. Yek ji van deverên ku sera lê ne û bi piştgiriya dewletê hatine avakirin jî Bismila Diyarbekirê ye. Li Bismilê di van sereyan de 'xiyar, bacanên sor, îsot û cureyên din ên sewzeyan' tên çandin. Hilberînerê sewzeyên serayan Şîrwan Karabulut di derheqê xebat û bazirganiya serayan de ji Heftenameya Basê re axivî.

**Dewletê piştgiriya xwe vekişand û...**


Hilberîner ji vekişandina alîkariya dewletê bi gilî û gazin in. Bihayê komir û rabûna dovîzê ya li hember pereyê Tirkiyeyê jî di derbarê şewata serayan de dibe pirsgirêk. Dovîz li hember pereyê Tirkiyeyê biha ye û kirîna komirê jî bi dowîzê ye. Hilberîner Şîrwan Karabulut li ser vê rewşê dibêje: "Di destpêkê de dewletê kredî da me û me weke kooperatîfî 17 kesan sera ava kir. Paşê dewletê alîkariya xwe li ser me birî û niha ji wan 17 kesan tenê ez mame ku min sera negirtiye." Karabulut dibêje hemû hilberîner ketin bin deynên mezin û gotinên xwe wiha bi dawî dike, "Ez bi xwe jî, eger ne ji ber van deynan bûya, min ê seraya xwe bigirta û dest ji vî karî bikişanda."

Vê carê me berê xwe da navçeyên Diyarbekirê:

# Farqîn, Pîran, Bismil, Çinar

JÎN MAZÎ

Li seranserê Kurdistanê gelek bajaran di dîrokê de cihekî girîng girtine. Lêbelê ji bilî bajaran hin navçe hene ku bi taybetmendiyên xwe ji bajaran jî girîngtir in. Ji ber vê yekê, vê carê jî me berê xwe da navçeyên Diyarbekirê. Bi giştî 17 navçeyên Diyarbekirê hene û her navçeyek jî xwediyê taybetmendiyên cuda û girîng e. Ev navçe him ji aliyê xwezayê û him jî ji aliyê dîrokê ve girîng in û herwiha ne pêkan e ku di nivîsekê de em van hemû navçeyan rêz bikin, girîngî û dîroka wan vebêjin. Ji ber wê yekê em ê navçeyên Amedê beş bi beş bo we amade bikin. Di vê nivîsê de wê çar navçeyên dîrokî; Farqîn, Pîran, Bismil, Çinar ji we re bên vegotin û wê bê dîtin ku ne tenê Diyarbekir, navçeyên wê jî çiqas xwedî xwezayeke xweş û girîngiyeke dîrokî ne.









**Paytexta Merwaniyan: Farqîn**

Navçeya Diyarbekir a dîrokî, 78 km dûrî bajêr e. Li ser navê wê gelek nivîs hene ku yek jê pirtûka Rojen Barnas ya bi navê ''Sîlvan/Silîvan FARQÎN''e. Di vê pirtûkê de wiha behsa navên navçeyê tê kirin. ''Farqîn: Farqîn kurtkirina Meyafarqîn/Mafarqîn an Mayyafarqîn e ku navê bajarê di nav kelehê de ye. Silvan: Di çaryeka dawîn a 1800 de ku Farqîn bû qeza baregeha qeymeqamiyê, bi Tirkî navê ''Silvan'' lê hate danîn. Silvan dejenerebûyiya navê Silîvan e ku îro tenê Tirk bi kar tînin û di nivîsên Tirkî an fermî bi kar tê.'' Ev navçeya dîrokî ji bo gelek şaristaniyan bûye paytext; Hemdanî, Merwanî, Împaratoriya Mezin ya Selçûkiyan, Artûqî, Eyyubî û gelek şaristaniyên din li vê navçeya qedîm serweriya xwe pêkanîne. Ya herî girîng jî ew e ku Farqîn bûye paytexta xanedana Kurdî ya Merwaniyan. Di dema Merwaniyan de herêm ji aliyê çandî û hunerî ve gelek bi pêş ketibû. Niha jî em ê qala bermayiyên dîrokî bikin ku dema rojekê rêya we bi vê navçeya dîrokî ket, lê bigerin û paytexta 'Merwaniyan' bibînin.

**Pira Mala Badê**

Ev pir di navbera Diyarbekir û Batmanê de ye û 22 km dûrî Farqînê ye. Ev pir bûye sedema nîqaşan jî ji ber ku Farqînî dibêjin ev pir ya me ye û Batmanî jî dibêjin ya me ye. Pir ji aliyê damezrênerê Dewleta Merwaniyan Badê Dostik ve hatiye ava kirin. Di cîhanê de di nav pirên kevirîn de, pira ku kemera wê herî fireh û dirêj e. Li herdu aliyên kembera pirê du ode hatine çêkirin, ev ode ji bo karwan û rêwiyan dema di wir re derbas dibin li wir bimînin û bêhna xwe vedin, hatiye çêkirin. Albert Gabriel ji bo vê pira bêhempa wiha gotiye, ''Digel ku wê demê hesabê statîk û modern tunebûye, çêkirina pireke wiha mezin û berfireh hêjayî pesindayînê ye. Qubeya Ayasofya bi rehetî dikare di bin pirê re derbas bibe, li Tirkiye û Balkanan pireke wiha fireh tuneye. ''

**Şikeftên Hesûnê**

Ev şikeftên ku weke bajarekî li serê girekî hatine ava kirin, 7 km dûrî navçeya Farqînê ne. Li gor lêkolînan di heyama Mezolîtîk de bûye devera cihûwarbûnê. Li Diyarbekirê koma herî mezin a şikeftan e û ji 300 şikeftan pêk tê, hemû şikeft jî bi hevûdu ve girêdayî ne. Di nav şikeftan de cihokên avê, sarinc, embarên avê, dêrincekên kevir, dêr û amfik tiyatro hene.

**Keleha Farqînê**

Dîroka çêkirina Keleha Farqînê li gor dokûmentên nivîskî Piştî Mîladê di sala 532an de ji aliyê yekem Împaratorê Bîzansî Justitiane ve hatiye restorekirin. Di dema Hemdanî û Merwaniyan de birc û sûrên nû jî lê hatine zêde kirin. Keleha Farqînê çargoşe ji kevirê kilsê hatiye çêkirin. 9 deriyên kelehê hene, çar jê li başûr, du li bakûr, du li rojava, yek jî dikeve aliyê rojhilat. Navên wan jî ev in; Deriyê Meyxaneyê, Deriyê Boşatê, Deriyê Qulfayê, Deriyê Jêr, Deriyê Birc û Şahê û Deriyê Diyarbekirê. Heta niha gelek cihên kelehê hatine hilweşandin.

**Mizgefta Silahedînê Eyûbî**

Mizgeft di sala 1031an de, bi kevirên bazîlîka yên bîzansê û ji aliyê Merwaniyan ve hatiye avakirin. Piştre jî Artûqî û Eyûbiyan mizgeft restore kirine û bo îbadetê vekirine.

**Minareya Qot**

Ev minareya li navenda navçeyê bi tena serê xwe maye. Mizgefta wê bi temamî xera bûye. Li gor hin çavkaniyan ev mizgeft di navbera salên 1199-1244an ji aliyê Eyûbiyên Meyafarqînê ve hatiye avakirin. Ev minare pênc qat e û çargoşe ye.

**Keleha Boşatê**

Ev keleh li gundê Boşatê ye û navê xwe jî ji vir digire. Li gor hin rîwayetan keleha Boşatê ji ya Farqînê kevintir e û herwiha keleha Farqînê ji kevirên keleha Boşatê hatiye çêkirin. Li ser kelehê fîgûrên qral û jina wî hene. Li jêrî kelehê gundiyan xanî çêkirine.

**Mîhrîcan û Baweriyên Farqînê**

Li Farqînê baweriyên ji hev cihê jî hene, ger ku hûn bixwazin bikarin di wan demên pîrozbahî û şahiyan de biçin û bibînin. Yek jê Serê Gulanê ye. Li gorî salnameya Kurdî, di 1ê Gulanê de pîrozkirina şahiya serê gulanê, nîşan dide ku ev şahî cejneke herêmî ya Kurdan e. Raboriya vê cejnê digihêje serdema Merwaniyan. Di vê rojê de xwarinên herî xweş tên çêkirin, xelk kincên xweşik li xwe dikin û diçin cihê seyranê.

Serhivdeh jî mîhrîcana herî kevn ya Farqînê ye. Li gundê Emerkaya ku di navbera Farqîn, Sason û Pasûrê de dimîne, li gorî salnameya rûmî her sal di 17ê Adarê de, ji sala 639an ve tê pîrozkirin. Li nêzî vî gundî kon tên vegirtin. Ji her dera welat bi hezaran kes diçin wî gundî ji bo Muaz Bîn Cebel (Gelê deverê jê re dibêjin Şêx Miazê Cembelî) şeva desthineyê çê dikin, li ber erbaneyan zikir dikin, govendê digerînin û dengbêj distrên.

Warê Hûrî û Mîtaniyan: Çinar

Navçeya ku herî nêzî bajêr Çinar e. Navê wê yê berê jî Xana Axparê ye. Navçe weke navend nû ye lê derdora wê xwedî dîrok e. Du hezar sal Beriya Mîladê, Hûrî û Mîtanî hikûmdarên vir bûne û li vir cihûwar bûne. Asûriyan li vir bajarê bi navê Toşhan-Toşhana ava kirine. Cihên dîrokî yên derdora navçeyê yek jê Şikeftên Silêman Axa ye û şopên 2 hezar sal berê lê xuya ne. Li gor rîwayetan kesekî bi navê Silêman Axa li vir jiyaye, ji ber vê ev nav li vê şikeftê kirine. Yek ji cihê dîrokî Qesra Şêx Qasim e, li gundê Altûnxwarê li ser girekî bilind, 8 km dûrî navçeyê ye.

**Keleha Zerzewanê**

Ev keleha ku 13 km dûrî navçeya Çinarê ye û berhema ku ji heyama Romayê maye xwedî dîrokeke hezar û 700 salî ye. Li gor lêkêlînên arkeolojîk ibadetxaneya binerd ya ola Mithrasan hatiye dîtin. Di serdema Împaratoriya Romayê de weke qereqol hatiye bikaranîn. Bermahiyeke ku ji sûran pêk tê bilindahiya wê 15 metre, quleya nêrîngeh û parastinê bilindahiya wê 21 metre, avahiya rêvebirinê, embarên genim û çekan, stargeh, gorên di zinaran de, cihokên avê û 54 sarincên avê hatine dîtin. Ev keleha ku li ser girekî bilindahiya 124 metre hatiye avakirin, weke hêlîna qertelan li benda geştyaran e.

## Warê serhildana Şêx Seîd: Pîran

Dîcle ango Pîran. Navê navçeyê yê berê Pîran e û xelkê li wir dijîn zêdetir navê Pîran bikartînin. Pîran bi zaravayê Kirmanckî tê wateya cihê ''alim û pîran.'' Yên li vir dijîn bêhtir bi zaravayê Kirmanckî diaxivin. 37 gund û 65 mezrayên navçeyê hene. Erdê Pîranê bêhtir kuyistan e ji ber wê çandinî jî li navçeyê kêm e. Dîroka navçeyê digihêje 'Heyama Kevirîn.' Li navçeyê bêhtir sewalan xwedî dikin û cenaniya sewze û fêkiyan tê kirin. Navçe 85 km dûrî Diyarbekirê ye. Yên ku dixwazin bibînin dikarin bi rehetî xwe bigihînin Pîranê.

Kevirê Keça Qral

Ev cih 7 km dûrî Pîranê, li ser rêya Diyarbekirê ye. Ev der ji ber ku cihekî asê ye, mirov nikare xwe bigihîne wir û tenê dikare ji dûr ve lê temaşe bike. Herwiha çîrokeke vir jî heye. Li gor rîwayetekê keçeke qral a ku bi xweşîkbûna xwe bi nav û deng hebûye. Ev keçik bûye evîndarê şivanekî. Ji ber vê jî Qral keça xwe li serê vî girî zindan kiriye. Nobedarên wir bala xwe didin ku du kevok ji zindanê difirin. Dema nobedar diçin li zindanê dinêrin, dibînin ku keçik ne li wir e. Ev der jî hêjayî dîtinê ye.

Navçeya Pîran di dîroka Kurdan de cihekî girîng digire. Girîngiya navçeyê jî ji ber Serhildana Şêx Seîd tê. Serhildana Şêx Seîd yekem car li navçeya Pîranê dest pê dike û li wir bi rêhevalên xwe ve ji aliyê dewletê ve tên girtin. Ji ber vê li gelek cihan navê wî weke ''Şêx Seîdê Pîranî'' derbas dibe.

Paytexta Mîtaniyan: Bismil

Yek ji navçeyên din a Diyarbekirê jî Bismil e û 55 km dûrî bajêr e. Nûtirîn navçeya Diyarbekirê ye û her wiha piştî Erxeniyê navçeya ku nifûsa wê herî zêde ye. Li gor rîwayetan dema Bismil nû ava dibe ji bîst malan pêk dihatiye û tê gotin ku vê navçeyê navê xwe jî ji vir stendiye; 'Bîst- Mal'. Navend nû ye, lê weke hin bajarên din yên Kurdistanê gundê der û dora wê ji aliyê dîrokê ve girîng in. Yek ji van cihên girîng Kerxa Kîka ye ku 12 km dûrî navçeyê ye. Li Qotê Kerxa Kîka di encama lêkolînên ku ji aliyê Muzeya Amedê ve hatine kirin, 19 hezar 800 berhemên dîrokî hatine dîtin. Li gor hin çavkaniyan ev der weke navenda saloxgeriyê ya herêmê hatiye bikaranîn. Her wiha ev der paytexta Mîtaniyan bûye.

Yek ji girîngtirîn cihê navçeyê Kenantepe ye. 12 km dûrî Bismilê, li qerexa çemê Dîcle ye. Li vir jî di encama lêkolînên arkeolojîk ku Dr. J.Bradley û Muzeya Amedê bi hev re kiriye, berhemên dîrokî li vir jî hatine dîtin. Li gor lêkolînan dîroka wê digihêje Beriya Mîladê 4640an. Di lêkolînan de alavên ji heyama Kalkulîtîk mane, kevir, firûn, ocax, dîwarên bi kerpîçan hatine seyandin hatine dîtin. Ji xeynî van, Girê Dimsê, Kurtiktepe, Girê Cano, Tilşahîn, Girê Ziyaretê ji aliyê arkeolojiyê ve cihên girîng in.



